

naverok

dosye

- * **SERGOTAR** / *Editor* - 2
- * **ELİYÊ HERÎRÎ KÎ YE Û JI KÎJAN HERÎRÊ YE?** / *Deham EBDULFETTAH* - 3
- * **WÊJE, DINYAYA WÊJEYÊ Û TAYBETMENDIYÊN WÊJEVAN -I-** / *Azad ZAL* - 6
- * **MAHR** / *Arjen ARÎ* - 10
- * **DI KURMANCÎ DE NAVÊN MEHAN** / *Receb DILDAR* - 12
- * **HEMÛ DEMSAL PAYİZ IN** / *Ayhan MERETOWAR* - 16
- * **DI HER SÎNÎ DE SÎNEMEK ŞÎN E** / *Omer DILSOZ* - 18
- * **PISÎKA LI BER BARANÊ** / *Ernest HEMINGWAY* - 20
- * **ÇEKA MÊRKUJ POLÊ BEXAN** / *Ronald DAHL* - 22
- * **ÊŞ** / *Şevger ÇIYA* - 27
- * **SÊBAREYEKE EVÎNÊ** / *Azad RONAKBAR* - 53
- * **PÎREJIN** / *Memê ŞIVAN* - 54
- * **PIŞTÎ UMREKÎ** / *Omer DILSOZ* - 55
- * **NÊRGİZÊN BI RAZ** / *Îlhamî OZER* - 56
- * **PÊXWAS** / *Fevzî BÎLGE* - 57
- * **GULÎSTANA SÎPAN** / *Sîpan XIZAN* - 58
- * **DU HELBEST** / *Dilxwaz HERDEM* - 59
- * **NEZANÎ** / *Feratê DENGİZÎ* - 60
- * **EVDIREHÎMÊ FÎSÎ** / *Hîlmî AKYOL* - 61
- * **HINEK XWEŞGOTIN** / *Zekî AKDAG* - 64

- * **BINGEHÊN NÛJENIYA WÊJEYA KURDÎ** / *Amadekar: Serwet DENÎZ* - 29
- * **NÛJENIYA ME** / *Jan DOST* - 31
- * **WÊJEYA KURDÎ YA LI SIRGÛNIYÊ RENGEKÎ NOSTALJÎK GIRTİYE** / *Dilawer ZERAQ* - 33
- * **ÇÎROK PÊŞVERÛ YE** / *Ronî WAR* - 35
- * **DESTPÊKA NÛJENIYA KURDÎ EHMEDE XANÎ YE** / *Hevpeyvîn: Serwet DENÎZ* - 38
- * **WÊJEYA K'URDÎ LI SER R'ÊYA XWEGUHAR'TIN Û NÛJENBÛNÊ** / *Ezizê CEWO* - 46
- * **WÊJEYA KURDÎ** / *Behlûl ZELAL* - 52



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ
Kovara Dumejhane
Hejmar - 18
Rêbendan-Reşemî 2008

Xwedî & Berpirsiyariya Nivîsaran:
Semra OZBEY

Editor:
Enise Şirin ÇAGER - Azad ZAL

Sererastkirin:
Semra OZBEY - Serwet DENÎZ

Mizanpaj & Berg
Azad ZAL

Wêneyê Berga Pêşin:
Kerestên Têkel (Serbest OSMAN)

Şewirmendê Hiqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Gün Matbaacılık
Tlf: 0 212 580 63 81

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
DIYARBAKIR

Tlf:
(0412) 237 43 16

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:

Nava Welat, salek: 20 YTL
Welatên Dereke, salek: 60 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê:
Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:
Semra Ozbey - 5426215

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji Edîtor...

Xwendevanên Hêja

Careke din merheba,

Bi şîrînî û xweşikahiya zimanê kurdî em cejna we ya Qurbanê û Sersala we pîroz dikin û hêvîdar in ku xweşî û başî her tim hevalên we bin.

Di vê hejmarê de jî me hewl da ku kovareke têrnaveroke bigihîjin ber destê we. Jixwe di hejmarê berê de me mijara dosyeyê wek “Bingehên Nûjeniya Wêjeya Kurdî” dabû xuyakirin. Me dosyeya xwe amade kir û em pêşkêşî we dikin. Lê bi baweriya me divê ev nîqaş hîn berfirehtir bê kirin. Ev him jî bo xwenasîn û xwezanîna me; hem jî ji bo pêşeroja me girîng e. Divê em bi cîranên xwe re, bi der û dorên xwe re bidin û bistînin. Ev pêdiviyek e û divê pêk were. Lê li aliyê din divê bi tu awayî bi zanebûn, an jî bi nezanî em nekevin bin nîrê hizirîna hinekên din. Her yek bi navekî (hinek çepgir, hinek liberal, hinek oldar û hinek jî qaşo rewşenbîr) dixwazin qenciye(!) bi me bikin. Ev mijar dibe ku rasterast têkildarî wêjeyê xuya neke, lê bi rastî qada ku herî zêde bandorê lê dike wêje ye. Tiştê ku em dixwazin bê fêmkirin ev e. Dibe ku hinek kes wek me ne-fikirin jî. Û xwediyê helwesteke din bin. Lê nîqaş pêdivî ye.

Mijareke din ya ku em dixwazin bînin ziman jî pîrsgirêkên sererastkirinê (redaksiyonê) ne. Bi rastî di serî de me nizanibû ku wê ew qas zorê bide me. Lê bergeha nivîsan û nivîskaran çi qas fireh dibe (ji her perçeyên welat û derveyê welat jî nivîs tên) ev pîrsgirêk jî xwe dide der. Jixwe hûn ê jî vê yekê di nivîsa Ezîzê Cewo de bibînin. Ev bi tenê mînakek e. Tevî ku em dizanin tiştê me kiriye zêde rast nîn e û wê bê rexnekirin jî ji ber ku me soz dabû me dest neda nivîsê. Lê bi tenê ew nîn e. Gelek angaşên ku dibêjin “mafê kovarê tune dest bide nivîsa nivîskar” tên bilêkirin.. Wek me berê jî diyar kiribû em ê li gor pîvanên heyî nivîsan redakte bikin. Di weşanekê de ne mimkun e ku bi çend awayan nivîs bêne weşandin. Di jiyana civakî de em eşîr bi eşîr ji hev perçe bûne, ne hewce ye ku em vê perçebûna xwe di rastnivîsê de jî pêk binin.

Xwendevanên Delal,

Di vê hejmarê de Deham Ebdulfettah bi lêkolîneke derbarê Eliyê Herîrî de, Azad Zal bi “Wêje, Dinyaya Wêjeyê û Taybetmendiyên Wêjevan”; Arjen Arî bi “Mahr”; Receb Dildar bi lêkolîneke li ser navên mehan; Aynan Meretowar bi nirxandina “Hemû Demsal Payiz in” ê; Omer Dilsoz “Di Her Sînî de Sînemek Şîn e”; Pisîka Li Ber Baranê ya Hemingway bi wergera Sîdar Jîr, “Çeka Mêrkuj Polê Berxan” ya Ronald Dahl bi wergera Aydin Rengîn; Şevger Çiya bi çiroka “Êş”; Azad Ronakbar bi “Sêbareyeke Evînê”; Memê Şivan bi “Pîrejîn”ê; Bi nasandina Dengbêj Evdirehîmê Fîsî Hilmî Akyol; bi hinek Xweşgotinên kurdî Zekî Akdag û Omer Dilsoz, Îlhamî Ozer, Fevzî Bilge, Sîpan Xizan, Dilxwaz Herdem, Feratê Dengizî jî bi helbestên xwe cih girtine.

Her wiha, Jan Dost, Ronî War, Ezîzê Cewo û Behlûl Zelal bi nivîsên xwe; Dilawer Zeraq û Arjen Arî jî bi rîya hevpeyvînê beşdarî dosyeyê bûne.

Heta hejmareke din bimînin dixweşiyê de....

Eliyê Herîrî Kî Ye û Ji kîjan Herîrê Ye?

Deham EBDULFETTAH

Ji nav hemû nivîskar û helbestvanên kurd ên kevn û nû nasnameya Eliyê Herîrî tenê, bi vê tevheviya erênayê, bûye kêşeyek aloz û serê gelek lêkoler û diroknivîsên wêjeya kurdî êşandiye.

Gelo Eliyê Herîrî kî ye? Kengî li cîhanê bûye mêvan û kengî xatir jê xwestiye? Gundê 'Herîr' yê ku bûye paşnavê wî li ku ye?

Bersivên van pirsan li nik kurdnasên biyanî û lêkolerên kurd ne wekî hev hatine dayîn. Gelek gotebêj, danûstandin û gotarên têvel derbarî jîyan û jîngeha Eliyê Herîrî de hatine nivîsin.

Tiştê ku li ber guhê me ketiye û tê gotin, Eliyê Herîrî kevntirîn helbestvan e ku helbestên wî bi rêzbend û kêşsazî û bi şêwezarê kurmanciya jorîn gihîştine me. Dîwaneke wî (neçapkiri) heye û gelek helbestên wî di nav gel de belav bûne. Lê nêrînên dîtir jî hene:

1 - Kurdnasê rûsî Aleksander JABA (qunsilê rûsî li Erziromê), di pirtûka xwe de, ya ku bi nave **"Cami'ê Risaleya Hikayetan Bi Zimanê Kurdî"**¹ dibêje:

"Şa'irê berî (pêşîn) Elî Herîrî ye. Dîwançeyê wî ya Şi'ir û qesayid heye. Herîrî ji gundekî ye, cihê wî nahiye ya Sincax î Hekaryan da û Şi'ir û edebiyatê wî jî di nav Kurdistanê qewî zêde meşhûr û me'rûf e. Texmîna ku di tarîxa çarsedê (400) hîcretê peyda bûye û di çarsed û heftê û yekê da (471) merhûm bûye û di nivê Herîrê da medfûn bûye".

2 - Dr . BİLİÇ ŞÊRKO di pirtûka xwe de, ya bi navê "Kêşeya Kurdî"² dibêje : "Herîr gundekî nêzî Hewlêrê ye..." . Ji bilî vê dîtine, ew jî wek JABA dibêje.

3 - Dîroknasê Kurd Mihemed Emîn Zekî di



pirtûka xwe ya navdar de "Puxteya diroka Kurd û Kurdistan"³ de dibêje: "Elî Herîrî xelkê gundê 'Dêr El-herî' e, dikevit liwaya Hewlêrê. Li navbera 400-470'yê mişextî, hevberî 1010-1075'ê zayînî jiyaye. Herîrî hevçaxê Firdewsiyê Tûsî ye (Xwedanê Şahnameyê).

Dîwaneke wî ya navdar heye bi zarekî kurdî. Lê di pirtûka xwe ya dîtir de "Navdarên Kurd û Kurdistan"⁴ de jî wê gotina xwe ya berî nuha vedigere û dibêje: "Herîrî ji hozanvanê kurdê navdar, yê kevin, li welatê Şemdînan e. Li navbera 400-471'ê jiyaye ..."

4- Mîr Celadet Bedirxan di govara HAWAR, hejmar 33 de dibêje: "Herîrî li gundê Herîra Hewlêrê bûye.

Ew bixwe sorî (sorani) ye. Dibêjin dîwaneke wî heye, min neditiye ...". Paşê wekî A. JABA berdeyam dike.

5 – T. ARÎSTOVA di pirtûka bi navê “Kurdên Paş Qefqasê” de dibêje: “Herîrî di navbera salên 1009-1079’ê zayînê de jiyaye”.

6 – Lêkoler ‘Ebdulreqîb YÛSIF di pirtûka bi nave “Dîwana kurmancî”⁵ de dibêje: “Heta nuho kes nizane jiyânî ev şa’irê kurde çon bûye, le kûdê be dayik bûye û le çê cîgeh murdiye û le kûdê xwendîye û jiyânî çawa bûye. Belam şî’irên wî nehatine komkirin li nav dîwanekî da, yan dîwana wî wînda bûye. Û şî’irên wî be lehceya (zarê) Behdînan bûye, Soranî nebûye. Ne dûr e xelkê gundê Herîr – Hewlêr be. Ew çax Behdînanî axifte.

Çunku li ser hedê (sînore) Behdînan û Soran e. Û nuho jî axaftina wan soranî û kurmancî tîkel yek e. Lewra neşên dûr nine (Elî Herîrî) xelkî cihekî dîke bibe hatibe bo Herîr û li wêdê mabe ...”

7 – Sadiq Behadînê Amêdî jî nêrîna xwe derbarî vê kêşeyê, di pirtûka xwe de, “Hozanvanê Kurd”⁶ bi navê her du xalan kurtebir dîke: A) Bêguman, Elî Herîrî xelkê gundê Herîr e. Li Şemzdînan, li cihê Hekariya. B) Elî Herîrî hozan (helbest) bi kurmancî vehandine.

8 – Mamoste Mes’ûd Mihemed nêrîna xwe derbarî nasnameya Elî Herîrî bi vî şeweyî berçav dîke: Ji bilî Elî Herîrî, yê ku ji Hekarê helbestvanekî dîtir bi navê “Elî” li parêzgeha Hewlêrê hebû. Mes’ûd Mihemed bo çespendina gotina xwe, vê malika Hacî Qadirê Koyî di ber çavan re derbas dîke:

*Dû Elî şa’ir in weke “Hessan”⁷
Berdeşan û Herîr e meskenîyan*

Li vê gorê du helbestvan bi navê ‘Elî’ hene:

A – Eliyê Herîrî, yê ku mijara vê gotebêjê ye û ji gundekî bi navê “Herîr” li herêma Hekarê ye.

B – Eliyê Berdeşanî yê ku ji berdeşanê, nêzî Hewlêrê ye.

Bi dîtina M. Mihemed tevheviyek di navbera her du “Eliyan” de peyda bûye û ev danasînên têvel derbarî nasnameya Eliyê Herîrî jî, encama wê tevheviyê ye.

Bi dîtina min rêbaza rast û rewa bo zelalkirina vê kêşeyê ew e, ku em li helbestên her du Eliyan vegehin û li ser bêje û vehandina helbestên wan rawestin. Çiku şewezarên herêmên Kurdistanê ji hev cuda ne. Şewezarê herêma Hewlêrê dûrî yê Hekarê

ye. Vêca ku helbestvanê me “Eliyê Herîrî” ji xelkê Herîra Hewlêrê be gerek helbestên wî bi şewezarê wê herêmê hatibin gotin. Lê ku ji Hekarê be gerek bi kurmanciya Hekarê hatibin gotin.

Çiqasî herêma Hewlêrê nêzî herêma Behdînan be û çiqasî soraniya Hewlêrê jî ketibe bin bandora kurmanciya Behdînan û Hekarê jî, lê herî dimîne şewezarekî soranî û cudahiya di navbera nivîsên bi vî şewezarî û yên bi kurmancî jî, herî berçav û eşkera ye. Li vê gorê mirov bi hêsanî dikare binase, ka helbestên Herîrî bi çî şewezê hatine nivîsîn û berhemên çî jîngehê ne.

Elî Berdeşanî, yê ku Hacî Qadirê Koyî di wê malikê da amaje pê kiriye (qala wî kiriye), helbestvanekî gelêrî ye, ji Berdeşana nêzî Hewlêrê ye. Berdeşanî dibêje:

*Ez im Elî Berdeşanî
Beytê delêm be dîwanî*

Em dizanin ku cînavê “Ez” di soranî de nîne, lê Berdeşanî ew di malika xwe de xebitandîye. Dibe ku ev cînav ji kurmancî derbasî şewezarê herêma Hewlêrê bûbe, yan jî (weke lêkolerên zimanên Îranî dibêjin) ev cînav di zimanê avistayî de hebû û hêj li hin herêman maye.

Digel ku ev cînava kurmancî “Ez” di şewezarê Eliyê Berdeşanî de bikar hatiye jî, lê şewezarê wî, çiqasî vekirî be jî, şewezarekî soranî ye.

Wisana jî helbestên Eliyê Herîrî (yê ku mijar derbarî wî ye) gerek ew jî cih û jîngeha wî zelal bikin. Eliyê Herîrî dibêje:

*“Ji serkeska mekin bawer
di cihlê da dibin kafîr
Dibên, ez şêxê safî me
bi carek qeti çak im ez”⁸*

Berçav e ku peyv û gotinên vê çarîna Herîrî, yên li piraniya herêmên kurmancî bikar tên, nemaze li Hekarê, şewaz û pergala vehandina hevokan jî, li gora rêzimana kurmancî pêk hatine.

Bi kurtî, tu girov û nîşe di helbestên Eliyê Herîrî de nînin ku soraniya wî bi me bide nasîn, yan jî em ji Hewlêriya wî pişterast bibin.

De ka werin em ê bi hev re çend parçeyan ji helbestên Eliyê Herîrî bixwînin û kurmanciya wî di wan de bipelînin:

Eliyê Herîrî dibêje:
Dilê mehzûn kefarete bêt
Le îm şeb taze mihman e
Be mizgînî bişaret bêt
Ku mihman canê canan bêt

Ke mihman canê canan e
Li ser çehvê me mihnan e
Be mala cumle-î xan e
Ke şahî cumle-î xan têt

Were ey şahidê Şîrîn
Ji 'eşqa te dil êxsîrîn
Be can menzilgehî mûrîn
Telebkare ke siltan bêt⁹

* * *

Dîsan ji nû 'eşqa berî
Pir enderûnim ateş e
Zulfa muzeyyen 'enberî
de'ewa digel zulfa reş e!

Xala li dêmê dil reva

Sed ruh û canim bin fida
Sotim gelo çu di min nema
Terkim kirin 'eqî û huşe...!¹⁰

* * *

Bila Saqî meyê bînit
Ji yaran ra binoşim ez!
Ji kerba cumle "Salûsan"¹¹
Derê kûpan rewa kim ez...

Mekin bawer ji serkeska
Eger şaşik ji nûrê bit
Digel kezbe (derewê) dibit kafir
Dibêjin eslî pak im ez...!¹²

Diyar e, ku ev helbest, bi pirs û şêwazê ristina hevokên xwe ve, berkêşanên jîngeheke kurmancî ne û bi tevneke kurmancî hatine vehandin. Ev jî destnîşan dike ku Eliyê Herîrî (wekî ku A. JABA gotiye) helbestvanekî Hekarî ye.

Têbînî

1 - Butrisborg 1860. Rûpel 12.

2 - Misir (El-qahîre) 1930 - Bergê yekê. Rûpel 22.

3 - Wergerandina Mihemed Elî 'Ewnî - Bergê 2'ê. Rûpel 335 - çapa 2'ê

4 - Misir 1971 Rûpel 75.

5 - Dîwana Kurmancî - Bexda 1971.

6 - Bexda 1980. Rûpel 230- 232.

7 - Hessa: Hessa Bin Sabit, helbestvanê Pêxember Muhemed e.

8 - Sadiq Behadinê Amêdî: Hozanvanê Kurd - Bexda 1980.

9 - Ebdulreqîb Yûsif: Dîwana Kurmancî.

10 - S. B. Amêdî: Hozanvanê Kurd.

11 - Salûsan: Her sê regezên pîroz di ola Xirîstiyani de (Bav, Kur û Giyanê pîroz).

12- S. B. Amêdî: Hozanvanê Kurd.

Wêje, Dinyaya Wêjeyê û Taybetmendiyên Wêjevan - I -

Azad ZAL

I- Ji Aliyê Peyvzaniyê (Etymology) ve Wêje

Wêje, *edeb*, *edebiyat* an jî *lîterator*... Ev peyv tev di wateya ‘**wêje**’yê de têne bikaranîn. Ji lewre ji zimanên din peyvên wekî **edeb** (*erebî, farisî*), **edebîyyat** (*erebî, farisî, osmanî*), **lîterator** (*latînî, fransî, îngilîzî*) – bi kar û bare wêjeyî ve pêwendîdar in û di wateya **wêjeyê** de têne bikaranîn, lê yeknesan heman wateyê nadin. Ji ber vê jî divê ku ji aliyê bêjenasiyê ve (etymology) bal bê kişandin ka rayeka peyvê ji ku derê tê û bi vî awayî dê têgihîştinek çêbibe.

Di nava kurdan de ji bo kar û barê wêjeyî peyvên wek **edeb**, **edebiyat**, **lîterator** têne bikaranîn.

Edeb: Hem di erebî de hem jî di farisî de di wateya wêjeyê de tê bikaranîn. Peyveke bi erebî ye. Di bingehe de tê wateya dîlnizmî û zerafetê. Her wiha başiya sincî, terbiyeya rind, dîlrindî û mafnasî jî ji wateya **edebê** têne der. Di têgihîştina îslamî de peyva “**edeb**” ji bêqisûriya wahydayîn û axaftina Sermelek Cebrail bi Hz. Muhammed re tê. Li gorî vê têgihîştinê Cebaril dema ku ayetan ji ba Xwedê tîne û ji Hz. Muhammed re dibêje bêqisûr û bi her awayî temam in. Ev jî “**edeb**” e. Di erebî de bingeha nivîsariyê li ser vê têgihîştinê ye. Her wiha peyva “**edeb**” di zimanê erebî de tekûzî, rastî û bêqisûriya peyvê ye. Di erebî de – bi taybetî di dema îslamê de, pîvana wate û teşeyên kar û barê wêjeyî, peyva **edebê** li ser du çavkaniyan dertê holê. Yek jê Quran e ya din jî helbest e. Li gorî vê bikaranîna zimanê erebî di du çavkaniyan de bêxeta û durist e. Quran ji ber ku kelama Xweda ye, îtiraz li ser tune ye; helbest jî ji ber ku zimanê herî rast û bêqisûr bi kar tê, esas tê girtin.

Berzo Mehmûd di gotareke xwe de li ser peyva “**edeb**”ê wiha dibêje: “Peyva “**edeb**” di zimanê ‘erebî de sê qonax di jiyana xwe ya dîrokî de derbas kiriye. 1- Di dema berî misilmantiyê de bi wateya “**mêvandari**” bi kar hatiye. 2- Di dema misilmantiyê de bi wateya “**rewîşt = tore**” bikar hatiye. 3- Di serdema nû de bi wateya “**fêrkirina baş**” hatiye meydanê. Inca peyva “**edeb**”a erebî wateya xwe di qonaxên dîrokî de drust kiriye, ku eva hanê jî di watesaziyê de tiştêkî girîng e.”¹

Edebiyat: Bingeha xwe ji **edebê** digire. Di erebî de pirjimariya peyva **edebê** ye. Derbirandina hest, raman, xem û xeyal û bûyeran bi awayekî xweş anîna ziman an jî nivîsandin **edebiyat** e.

Lîterator: Ji peyva **Letters** tê der û bingeha xwe ji latînî digire û ji “**letter**” (tîp) tê der. Lê di îngilîziya îroyîn de di wateya wêjeyê de jî tê bikaranîn. **Literature:** “Karê wêjeyê, berhem û aferînekên wêjeyî. Tore, wêje. Hemû berhem û nivîsên ku li ser warekî zanistê hatine nivîsandin. **Litterateur:** hozan, torevan”². Her wiha bingeha vê jî tîpa ku ew jî binyada bêjeyê ye tê der.

Ku em werin ser peyva “Wêje”yê; “**wêje**” têgîneke bi kurdî ye û bingeha xwe ji **zimanê awestayî** digire. Li ser vê rastiyê dema ku mirov li zimanê Awestayî û zaravayên kurdî binihêre û vekole; mirov dibîne û diyar dibe ku tîgîna “**wêje**”yê ji kîjan bingehe tê û bi çi awayî perisiye.

Di kurdî de dengên ku ji pêlekê dertên di peresîna ziman de bi hev diguherin. Dengê “b”, “v”, “w”, “g”; “ç”, “c”, “ş”, “j” dem bi dem bi hev diguherin. Ev rastî ji Awesta ber bi kurdiya îroyîn ve ji peresîna dengên tê der û di tîkiliya navbera zaravayên kurdî de xweş xuya dibe.

Ebas Celiliyan di “*Ferhengî Başûr-Taybet be nawçeyl; Kirmanşan, Îlam, Lûrriştan*” de ji bo peyva “Waç” wiha dibêje; “Wetin ‘**biwaç**’ le Ewista û Sanskrît ‘**waç**’ nusriyas.”³ Di “*Ferhgengi Wajehay Awesta*” de tîgînen ku ji peyva “wêje”yê re dibin bingehe hene. Mirov kare bibêje ku di Awestayî de bingeha peyva “**wêje**”yê ji çend peyvên tê der. **Vaeizi** (zana, têgihîştî, xwedîagahiya baş.) **Vaesa** (agahî, zanîn, zanayî) **Vaeza** (zanîn, agahî) **Vaezena** (zanîn, lihevanîn/a peyvê) **Vaxêzra** (waje, peyv, bêje) **Vaxêzwa** (peyva devkî) **Vaxşa**

(bêjeyek, peyvek)⁴. Di zaravayê kirdkî (zazakî) de *vaciriyayîş, vajiriyayîş, başîyayêne* di wateya “xwe bi xwe peyivîn” de tê bikaranîn. Her wiha peyva “*vate, vaciyaye, vajiyaye*” di wateya “gotî, tiştê ku hatiye gotin” de tê bikaranîn. “*Vatene, vatîş*” di wateya “gotin, peyivîn”ê de tê bikaranîn^{5/6}. Di zaravayê kurmançiya jêrîn (sorani) de peyva “*waçe*” di wateya “bêje, bilê, kelîme, dengê xweş” de tê bikaranîn.⁷

Hejar Mukriyanî di ferhenga xwe de xala “*wêje*”yê wiha rave kiriye; “*Gute, wite, bêje; bile, bêje; pak û xawên, temîz.*”⁸ Gîw Mukriyanî ji bo peyva *wuşe*; wute, wite⁸ ji bo peyva *Wêje* (ke): edeb, bêje, gote, bawîşk¹⁰ gotiye. Ebas Celiliyan jî ji bo peyva *wêj*; wetin, wetuwêj¹¹ gotiye. Her wiha Berzo Mehmûd jî bo peyva “*wêje*”yê wiha dibêje: “*Wêje* jî aliyê zarê kurmançî ve, lê belê zarê soranî zarawayekî dîtir bikar tênin, ku dektor Kamil Hesên Besîr eger ne wî jî danibê, lê gelek dupat kiriye ku peyva “*wêje*” beramberî “*edeb*” bikar were. (.....) peyva “*wêje*” di koka xwe de “*bêje*” ye ya ku hin guhartin di dengsazî de pê de hatiye û bûye “*wêje*”. Eva han jî yasayeke dengsazî ye, di zimanê kurdî de baw e, bi taybetî dengê (b) di hin zarên kurdî de dibe (v) û dîsa di hinên dîtir de dibe (w), ango (bêje, vêje, wêje). Weha jî di zimanê Avêsta de (waçe) û (vaçe) bi wateya axaftin heye.”¹²

Li gorî vê her çiqas peyvên wek “*edeb, edebiyat, lîterator*” bêne bikaranîn jî ji bo qada karên wêjeyî û hunermendiya afirîneriya berhem û aferînekên wêjeyî tîgîna “*wêje*” bê bikaranîn duristtir e û çêtir e. Ji lew re tîgîna “*wêje*” hem ji aliyê çavkaniyê ve ji bingeha zimanê kurdî tê û hem jî wekî nîşane ji aliyê wateyê ve jî derbirandineke kurdewar tîne holê.

II- Wateya Wêjeyê:

Dema ku mirov ji aliyê hest û ramanên xwe ve, bi bîranîn û bîrxistin; bestandin û hûnandina xem û xeyalên xwe; bi modîneya tîgîhiştin û ragihandinên xwe yên di warê dîtbarî û venêrînên xwe de dema ku bi awayekî taybet ziman bi kar tîne wê demê mirov karê wêjeyê dike.

Bi awayekî din ku mirov bibêje; rêzkirina gotin û peyvên xweş û rind ên hunerî û lihev karê wêjeyê ye. Lê ev jî tîr nake. Divê ji aliyê wate û teşeyê ve ahengek hebe û ev aheng di

xwe de bandorkeriyêke taybet bihewîne. Ji ber vê dema em bibêjin “*wêje*” em ê vê wateyê bidinê: *Bi zarê xweş, bi awayê hunerî û bi zimanekî rast û durist honandina bûyeran û derbirandina raman û hestan “wêje” ye.*

Wêje awayekî vegotinê ye. Pênasa wêjeyê ya kin û kurt ev e ku; li ser bûyer û pêkhatinên xwezayî û mirovî bi awayên curbecur pêkanîna zimanê bedenî û peyvî; vegotina mirov ji mirov re ye. Wêje bi wateya xwe ya berteng navê hevpariya hest û ramanan a bi helbestvanî û pexşanê ye. Ji berhemên devkî û nivîskî yên mîna helbest, destan, zargotin, zêmar, stran, çîrok, roman, şano û hwd. yên ku bi mebesta çêjê gewzîn hatibin afirandin re “*aferînekên wêjeyî*” tê gotin. Wêje, şeweya vegotinê ya herî watedar û bedew û çêjdar e. Kesê/a ku vî karî jî dike “*wêjevan*” e.

III- Dinyaya Wêjeyê û Taybetmendiyan Wêjevan

Dinyaya berhemên wêjeyî dinyayeke çêkirî ye. Wêjevan an jî ber xwe ve çê dike, yan jî li ser bûyereke rastîn honakekê (vehan) çêdike û li gorî hest û ramanên xwe dihone.

Di wêjeyê de navgîna herî girîng û yekane ziman e.

Berhemên wêjeyî yên ku di dinyayê de deng dane û her kevn nabin xwedî taybetmendiyan xweser in. Ev taybetmendî li ser rewşa wêjevan dertên holê û bi wêjevan ve yekeyek pêwendîdar in. Di heman demê de taybetmendiya wêjevaniya wêjevan in. Taybetmendiyan wan ango taybetmendiyan karê wêjeyê yê wêjevan gelek in. Ji van taybetmendiyan çendên balkêş ev in:

i- Çandêke dewlemend: Divê ku wêjevan xwedî çandêke giştî ya dewlemend be. Wêjevan hem çanda giştî ya dinyayê hem jî çanda gelêrî ya neteweyî di xwe de dihevine. Ne li ser navê çanda giştî ya dinyayê, ji çanda xwe ya gelêrî dûr e û ne jî di çanda gelêrî de xwe digire, ditengijîne û li wêjeya dinyayê venabe. Divê ku wêjevan aheng û guncaniya navbera çanda neteweyî û ya giştî ya dinayê bikaribe di xwe de ava bike. Kesên ku berhemên bi vî rengî afirandibin ji çandêke gelek kûr û dewlemend xwedî bûne û ev çand bi zanîn û tîgîhiştina xwe ya neteweyî û gerdûnî ramiyane û nivisandine. Firdewsiyê îranî (940 – 1020); William Shakespeareê

Brîtanî (1564 –1616); Melayê Cizîrî yê kurd (1589-1664); Victor Hugoyê frensî (1802-1885); Tolstoyê rûsî (1828 –1910); Gabriel Garcia Márquezê meksîkî (1927-); Mahmûd Derwîşê filistinî (1941 -) û hwd. Bi vî awayî gihîştine asta xwe ya wêjevanîyê.

ii- Dilxweşî û dilgeşîyeke hêzdar: Dilê wêjevan her tim fireh e. Tu caran natengije. Di dema xweşî û dilşadiyê de xwe wenda nake, di dema nexweşî, zorî û mercên zor û zehmetiyan de dilê xwe teng nake. Wêjevan xwedî dilekî berfireh e. Çiqas nexweşî û dilêşî û pîrsgirêkên tund (yên civakî ango kesayetî) li ser wî/wê hebûye û çiqas li der û dora wî/wê hatibe jiyankirin jî wî/wê ji xwe, ji hestiyarî, ramiyarî, têgihîştina xwe kêmkirîye û her li dû armanca xwe ya girse bûye. Bêhêvîtî, bêbawerî jê re nebûye asteng. Gelek wêjevanên girse di dema xwe de gelek perîşanî kişandine. Piştî mirina wan berhem û aferînekên wan di dinyayê de navdar bûne.

iii- Dilnizmî û afirîneriya Xwedanî: Karê ku wêjevan dike, afirînerî ye. Ya jî nû ve ava dike, ya jî tiştê heyî xera dike û li ser bingeha xerabeyan jî nû ve ava dike. Bi her awayî karê wî afiradin e. Di qada hişmendî û ramangeriyê de dinyayan çêdike, lehengan diafirîne, bûyeran li gorî rastiya pêkan li hev tîne; bûyerên pêkhatî yê dîrokî û rojane jî nû ve dihûne, can didê û giyan lê direşîne. Ji ber vê taybetmendiyê karê ku dike di asta xwedaniyê de ye. Kirina karê xwedanî nayê wê wateyê ku wêjevan dibe Xweda. Wêjevan bi vê afirîneriya xwe ya xwedanî xwe mezin nabîne, pozbilindiyên nake. Di karê wêjevanîyê de divêtiya dilnizmî û mutevazîtiyê baş dizane. Lê rûmet û heyîna xwe jî navêje nava lîngan.

iv- Şêweyeke jidil: Wêjevan bi şêweyê xwe deng û rengê xwe dide aferînek û berhemên xwe yê wêjeyî. Divê ku ev şêweya wî ji dil û can be; divê li hember xwendevanên xwe hurmetkar û rêzdar be. Kesê/a ku afirînerî kiriye bi şêweyeke jî dil û can nêzik bûye û rastî, duristî jî dest bernedaye. Ew bi xwe bûye şopînerê raman û hestên xwe yê ku di berhemên xwe de afirandiye. Jose Martí, Christopher Caudwell, Maksîm Gorkî, Jack London, Ehmedê Xanî hwd. bi vî awayî tevgeriyane.

v- Derbirandina hunerî ya bi hêz û aram: Wêjevan derbirandina hunerî bi kar tîne. Ev jî hêz û aramê dixwaze. Bi divêtiya hêza

kesayetî, hêza ramangeriya neteweyî û ya giştî her dizane. Derbirandina ku di aferînekên xwe de bi kar aniye her hunerî ye, aramî tê de bi cih kiriye û ew li raboriyê bi kûrahî, li dema ku tê de jiyayê bi berfirehî, li dahatûyê dûr û kûr nihêriye û bi her awayî xwe di heyîna gelemper de ditiye û afirandiye.

vi- Zimanekî xurt û saxlem: Wêjevan beriya her tiştî û dawîya her tiştî zimanê xwe yê neteweyî û gelêrî rast, durist û bi zanîn bi kar tîne. Hemû wêjevanên dinyayê yê ku bi nav û deng in zimanê xwe yê wêjeyî jî her awayî ve bi duristî bi kar anîne. (Bi taybetî ew ê li ser vê mijarê bê sekinandin.)

vii- Alîgirî û helwesta ramangerî: Wêjevan alîgir e, xwedîhelwest e. Bi zanîn û bi hişmendiya xwe di bûyer û kiryarên civakî de helwesteke zelal nîşan dide. Wêjevan xwedîhelwesteke birûmet e. Rûmeta xwe di parastina rastiyan xwe yê ku jê bawer dike û rastiyan civaka ku ew xwe jî aliyê ramangeriyê ve berpirsiyarê wê dibîne de digire û *'heyîn'*¹³ xwe li ser wê ava dike. Ev di heman demê de mafê heyînê (right of existence) jî dertîne hole. Wêjevanên ku li ser vê rastiyan ne ev mafê heyînê di xwe de bi cî kirine û parastine. Rûmeta wêjevan ev bi xwe ye. Ji bo vê wekî nimûne Emîle Zola û Jean Poul Sartre jî aliyê helwest û alîgiriya rastiyan ve gelek balkêş in.

Emîle Zola, (1840 –1902) li Fransayê pêşewaniya ekola naturalîzmê dike. Bi romanên xwe yê wekî “Nana”, “Germînal” û “Meyxane” navdar e. Emîle Zola bi helwesta xwe ya li hember Doza Dreyfûs alîgirî û helwesta ramangeriyê çî ye datîne holê. Di sala 1897’an de di nava artêşa Fransayê de serbaz Alfred Dreyfûs jî ber ku Cihû ye doza “xiyaneta bi dewletê re” lê tê kirin. Zola li hember vê doze jî serokdewletê Fransayê re wekî nameyeke aşkere daxuyaniyekê dide rojnameyan. Sernavê gotara wî; “Ez Tawanbar Dikim!” bû. Li hember zor û zextên hikûmata Fransayê ya wê demê serî danayne. Doz lê tê kirin û ceza didinê. Ew mecbûr dimîne welat terk dike. Li Londonê bi cih dibe. Lê dev jî vê meseleyê bernade. Li ser hewl û helwesta wî û raya giştî doz jî nû ve tê dîtin û Dreyfûs beraet dibe. Ev helwesta Emîle Zola di dîrokê de cihê xwe digire û dibe nimûne.

Jean-Paul Sartre (1905-1980), bi helwest û alîgiriya xwe ya rastiyan wekî mirovekî

mustesna her tim di bîran de maye. Sartre hem azadî û serxwebûna rewşenbiriye nîşan daye û hem jî tu caran jî rastiya xwe, jî rastîparêziyê tawîz nedaye. Jixwe jî ber vê nêzikahiya wî jê re hatiye gotin; “şahid û wicdanê serdema xwe”. Gotina ku Dostoyevski ku jî bo tevahiya mirovan gotiye; Sartre di xwe de bi cî aniye: “Her însan li hember her kesê/î jî her tiştî berpirsiyar e.”

Ji ber nêzikahî û helwesta xwe xelata Nobelê vegeandiye. Di sala 1964'an de layiqî xelata Nobelê hatiye dîtin. Wî gotiye ku ew ê hem jî bo berhemên wî û hem jî ji bo nêzikahiya politîk ne durist be vê xelatê qebûl nekiriye û vegeandiye.”

Wê Bidome

Têbînî

- ¹ http://pukmedia.com/kurdi/index.php?option=com_content&task=view&id=2203&Itemid=19
- ² English-Kurdish Dictionary - By Salah Saadallah - Avesta/Stenbol-2000
- ³ Ferhengî Başûr-Taybet be nawçeyl; Kirmanşan, Îlam, Lûrîstan /Ebas Celîliyan / Weşanên Aras - Hewlêr
- ⁴ Ferhengî Wajehay Awesta- Cîda 3yem /F. Cuneidi /1369
- ⁵ Ferhengê Dimilki-Tirki Weşanên Deng
- ⁶ Ferhengê Kirdkî, Pehlewî, Kurmanckî/Malmisanij-1997 Weşanên APEC/Swed
- ⁷ Ferheng/Hejar Mukriyani/1381 h./Tahrân
- ⁸ Ferheng / Hejar Mukriyani / 1381 h. / Tahrân
- ⁹ Ferhenga Kurdistan-Gîw Mukriyani / Hewlêr-2004
- ¹⁰ Heman çavkanî.
- ¹¹ Ferhengî Başûr-Taybet be nawçeyl; Kirmanşan, Îlam, Lûrîstan / Ebas Celîliyan / Weşanên Aras - Hewlêr
- ¹² http://pukmedia.com/kurdi/index.php?option=com_content&task=view&id=2203&Itemid=19
- ¹³ Peyva 'heyin'ê di wateya bi giştî hebûnê de ye. Di îngilîzî de “existence” e ku ekola existentialism jî wê tê. Di tirkî de 'varoluş' e, di erebî de 'kewn' e.

Ji Dengbêj Fadilê KUFRAGÎ Destan û Çirokên Kurdî

Ji Dengbêj FADILÊ KUFRAGÎ



Destan û Çirokên Kurdî

Berhevkar: Hogir BERBIR



Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Berhevkarin & Verisandin: Hogir BERBIR
Sererastkirin: Semra Ozbey - Serwet Deniz
Berg & Rûpelsazî: Azad Zal
Wêneyên Bergê: Fadilê KUFRAGÎ & Mala Wî
Çapa Yekemîn: Avrêl 2007
ISBN: 978 975-98532-9-7
Pirtûk 272 rûpel e.

Pivana Pirtûkê: 16 x 23,5 cm ye.

Pirtûka bi navê “Ji Dengbêj FADILÊ KUFRAGÎ Destan û Çirokên Kurdî” jî Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê derket. Ev berhem jî çirok û kilamên Fadilê KUFRAGÎ hatiye pê. Ango jî çirok û kilamên ku ji ber dengê wî hatine nivîsin pêk tê. Çirokên ku di vê pirtûkê de ne, ji aliyê gelek dengbêjan ve hatine gotin û hîna jî tên gotin. Jixwe gava ku hûn pirtûkê bixwînin hûn ê hem rasti taybetiyên herêmê û hem jî rasti yên dengbêj bînin. Destan û Çirokên ji dengbêj hatine guhdarî kirin û hatine deşîfrekirin ji gencîneya Zargotîna Kurdî ne. Ji “Îslîm Xatûna Qereçî û Cefer Efendî” heta “Tahar û Zahar”, “Eşqa Zeroya Fîle û Mehmed Eliyê Girover”, “Xezal û Teyar Axa”, “Şerê Kûrana Bişêriyê”, “Gulîzera Kurda û Elê Melê”, “Xezalê û Husên Axayê Botî” û wekî vanan 18 destan û çirokên ku di Zargotîna Kurdî de cihêrengiya wan heye di pirtûkê de cih girtine. Çavkaniyên ku wî ev berhem jê girtine: Hesenê CÊZWE, Etmanê KUFRAGÎ, Dawidê GIR, Fehmiyê ELÊ (Fehmiyê Borbore), Osmanê QANÊHEVSÊ, Hemîdê Huseynê MAZÎ-DAXÎ, Evdilayê Şêxoyê ZIZNÎ, Ehmedê Sebrîyê SÊWSE...

Mahr

Arjen ARÎ

Felestîn...welatê êş û azarê...

Axa ku hemû kelareşk û teyrên goştur li ser êrîşî cendekê miriyan dikan...

Axa ku xwînê vedixwe venaxwe dêm e, têhniyê xwîna şair e!

Ji vê xaka ku ji dêvla bîna çiçekan a bahrûdê difûre û sîng û berên wê şîrê sor diherîkîne destên hezkiriyên xwe; Mahmûd Derwîş ew çend jê hez dike; di helbesteke xwe de weha dibêje:

Ku tu tişt nemîne bo te bihimînim, diranên min bes in!

Her şairî mahra xwe bi axa xwe re birîye.

Mahreke filehkî ye ev mahr: Piştî ku ji axekê hez kir û mahr birî, ne mimkun e ku telaqê wê têxe dest!

Li ser dijî, li ser digirî, pê re dikene, pê re dibe hevparê şîna wê.

Tu hêz nikare zû be zû destê şair ji yê axê derxe!

Lê... ku hat û dest ji dest bû, dilê xwe di nava destên axê de dihêle û diçe!

Diçe mîna Nazim...

Diçe mîna Tholsky...¹

Li ser axa xwe jî ji axê hez kirine, li koçberiyê jî; zarokên ku mezin nebûn: Cegerxwîn, Sebrî Botanî, Peşew, Barnas, Ronga...

Li dûr, ji dûr ve jî nahtorên sîng û berên xaka xwe ne...

Dilnarîn bin jî, ku nêzî hêlîna evîna wan bibe keftarek, çeçelek an koremarek... dibin eyloyek; her du destên wan dibin du pençe û

bi 'qijîn' xwe tê werkirine!

Li dûr an li ser, ev çend rêzdar in li hember; her kesî vedixwînî rêzgirtinê. Yek ji wan dibêje, 'ku rojekê hin biçin welatê min, nebe nebe bê tacegul biçin.'²

Ev vexwendin ne ji bo biyaniyan bi tenê ye; di kêlikên xeternak de ku bibîne 'mahr' dikeve xetereyê, bêtî ku çi xemê bixwe, bi dilêriyeke pêşmergeyane, berê tivinga peyvê, dide desthelata xwe yî mahr-heremolîker:

Cotek pêlavên reş li min in

Bi pine, erzan, gemarî, sivik û heram

Hezar car ev pî û ew pî bi hev guherîne

Çi cara ez li wan dinêrim

Ne bi destê min e

Serê pêlavê

Pozê hin serokên kurd tîne ber çavên min!³

Cotek
pêlavên reş li
min in

Bi pine, erzan, gemarî,
sivik û heram
Hezar car ev pî û ew pî bi
hev guherîne
Çi cara ez li wan dinêrim
Ne bi destê min e
Serê pêlavê
Pozê hin serokên
kurd tîne ber
çavên min!

Ji ber vê 'bekçitiya namûsê', axa şair; heta heta gelê ku dengê şair wek dengê xwe dibîne, carinan bizava ku di nav de û pê re tevdigere li şair dibin mengine: Mînaka 'kurê şoreşê' Mayokovski'yê peyvgurzi di bîra helbestkariya dinyayê de ye.

Çiqasî layangir be, bo dahatûya 'mahrê'; hinekan, bizavanan, serokinan...ji xwe re bike 'pût û senem' jî, di encamê de mineta Xweda jî weke barekî dibîne:

Ger di heşrê de nebînim ez dilberê

Cenetê pê çî bikim, pê werkim axa ser rê⁴

Şairê ku 'ceneta ala' ji bo dilberê red dike, çavên xwe hew berdide dilber-axa xwe.

Erê ji 'xaçparêzekî' bêtir 'axparêz' e, lê ew çav bernade çengê axa milkê şairekî din. Ji vê çavtêriyê şairê 'zikbirçî' radibe dibêje:

Min ji nav baxê cîhanê bax û bostanim bes e!⁵

Çarenûsa 'birçitiya' şair mîna 'mahra' wî



ya 'filehkî' çarenûseke hevbeş e.

Ev hevbeşî/şîrikayî di roja îroyîn de bi destek û delîve-pêşkeriya desthelatê, -çî li hundir çî li der, wek nimûne navin hene ku serperîstê sazî û dezgehina ne û li vir ez ê navê wan nelêvînim- birçîtiya hinan bike têrî jî; çarenûs ji wextê Xaniyê nemir ê ku gotiye 'dîn çû û bi dest me neket dinar' hê jî çareya bêçare ya şair û nivîskarên kurd ên li 'çar kenar' in.

Ji vê rastiya rasteqîn e, ku serkêşe tevgera Tîrêj hemdemê min Barnas, bi ya xwe re dibe 'mîkurvanê' rewşa heyî: '...şairî û nivîskariya min ya nanjêxwarinê nîn e, ya ji bona kêf û mîraqê ye. Jiyana min a aborî li ser karê min î memûriyeyî ye ku tu tîkiliya wî bi kurdîti û bi nivîskariyê re tune ye.'⁶

Gelo, sedemên berdewamî û mayîndetiya vê 'çarenûsê' çî ne?

Bi qasî ku ev babet dikare bibe mijara nivîseke din, wek destnîşankirin ango 'berstûkvekirinê' bersiva min dê ev be:

Kengî gelê kurd; gelê ku hinek û gelek wî weke gelê xwe dibînin û dixwazin bikin 'alêvê'

mayîndekirina desthelata xwe ya 'pirdest û pîrmil', mîna xelkê Şîlî bibin xwîner û xwendayê berhemên bi zimanê xwe, wê gavê Cegerxwînen îroyîn; Rênas Jîyan, Îrfan Amîda, Kawa Nemir, Lal Laleş, Fatma Savci.... dê karibin qesrên havînî li qeraxa Gola Wanê, yên zivistanî jî li germiyanên Berika Mêrdînê ya ku 'pozê Qerejdaxê bi ser de xûz e', lê bikin...

Çima dê nekin?

Bi qasî ku kurê karkerekî li ser şiva trêne dixebite ye Nerûda, bi hatina/telîfa pirtûkên xwe xwediyê qesrên havînî û zivistanî ye!

Peyveke pêşîyan e, rast an derew, ji wan bi me maye û ez jî li vir neqil dikim: 'Ku axe/mîr bibine ker, li wan siwar bibin, lê lingên xwe li wan mehejinin' gotine.

Çarenûs û aqûbeta Xanemîrên Botan kê mî zêde her kes dizane.

Kêm zêde, her kes pê hesiyaye ku Cegerxwîn taliya emrê xwe berê xwe daye Swêdê.

Û kê mî zêde her kes pê hesiya ye Sebrî Botanî li xerîbiyê çavên xwe dane ser hev...

Êêê baş e...hûn bi Xwedayê min û xwe kin, qewmekî ku nikaribe şairê xwe xwedî bike, meşrûiyeta nivîskar/helbestkar/hunermend di nava lep û lêvên bizavanan de be, ew qewm, ew gel, ew ax...azadiyê heq dike?

08/09/2007/Amed

Têbînî:

1 Birakujî, E. Peşêw, Wş. Avesta

2 Şairê ku ji ber zilma nazîyan revî û li Swêdê mir.

3 Ji helbesteke E. Peşêw

4 Ji E. Xanî

5 Ji Şîreke Cegerxwîn

6 Ji jînenîgariya Rojen Barnas ya ku ji min re bo 'Bakurê Helbestê/Antolojiya Helbesta Bakur' hinartiye.

Di Kurmancî De Navên Mehan

Receb DILDAR

Di zimanê kurmancî de li ser navên demsalan tu pirsgirêk tune ye: Bihar, havîn, payiz û zivistan. Lê di navên mehan de tevliheviyek mezin çêbûye. Di salên piştî 90'î de hinek sazî û weşanên kurdî ji bo mehan navên nû peyda kirin û di vî warî de tevliheviyeke mezin çêbû. Di her kovar, rojname, radyo û televîzyonekê de navekî cuda hat bikaranîn. Ji ber vê yekê ji di mijara navên mehan de aniha rewşa zimanê kurmancî gelek xerab e. Hewcedariyeke girîng pê heye ku di vê mijarê de lihevhatinek çêbibe û navên mehan ji nû ve sererast bibin.

Ez dixwazim ji demsala biharê dest pê bikim û meh bi meh pê de biçim. Ka pêşiyên me van mehan çawa bi nav kirine? Rastiya navên mehan çi ye? Ez ê ji gotinên pêşyan, ji Qewlên Êzdiyatîyê ji folklorê û lîteratura klasîk hinek mînakên bidim ku Qewlên Êzdiyatîyê bi sedan salan berê hatine gotin û ji bo me mînakên gelek girîng in.

Kurd meha bi du awayî bi nav dikin. Ya rasterast navê mehê dibêjin ya jî bi demsalê ve girêdidin. Mînak: Tebax an havîna dawîn, îlon an payiza pêşîn, nîsan an bihara navîn.

Biharê pez, payizê rez, zivistanê ez û ez

Mehên biharê adar, nîsan û gulan in. Di nav xelkê de ev her sê nav pirr zelal û eşkere ne. Îcar meriv nizane çima navê 'nîsan'ê guhertine û kirine 'avrêl', niyet û armanca wan ne diyar e. Dibe ku, ji ber ku tirk jî navê 'nîsan'ê bi kar tînin, gotibin bila navê meha me ji ya wan cudatir be. Eger jihevgrîntinek hebe, me ji tirkan negirtiye, eger girtibin wan navê 'nîsan'ê ji me girtiye. Di metelokeke kurmancî de navê her sê mehên biharê li dû

hev bi vî awayî hatine rêzkirin:

*Sibata tirro virro
Adara bîst û du ro
Nîsan a me ye
Gulan textirme ye*

Îcar tirk kîjan peyva me bigirin û em dev jê berdin malik li me wêran bûye. Ji ber ku tirk 'hafta'yê bi kar tînin, ma em ê dev ji 'hefte'ya xwe berdin? Em ê dev ji 'çarşem' û 'pêncşem'ên xwe berdin?

Adar e, dew li dar e

Di demsala biharê de meha pêşîn adar e. Li ser navê adarê hema bêje gengeşî tune ye. Ji xwe di gotinên pêşyan de navê meha adarê gelek derbas dibe: '*Adar e, dew li dar e.*' '*Adarê, agir xweştir e ji savarê.*' '*Berfa adarê, giha gulyê darê, nema heta êvarê.*'

Di Qewlên Êzdiyatîyê de jî navê meha adarê wisa derbas dibe:

*Adar dibê ez adar im
Kilîla çendî bihar im
Razgela zebûniyê bijar im.*

Di kovarên wek Jîn (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê dîsa wek 'adar' hatiye bikaranîn.

Nîsan bûka salê ye

Nîsan meha navîn ya biharê ye. Di gotinên pêşyan de gelek mînakên meha nîsanê hene: '*Nîsan bûka salê ye.*' '*Nîsan e, çilka wê bi kîsan e.*' '*Nîsan, erd xemilî dîsan.*' '*Taviyê nîsanê, wek zêrê Xûrîstanê.*'

Di Qewlên Êzdiyatîyê de meha nîsanê di çarîneke gelek balkêş de hatiye bikaranîn:

*Çarşema serê nîsanê
Şixadî, Şexalê Şemsa xweste dûwanê
Da qayim bikin dîn û îmanê
Ev e îda Kurdistanê.*

Di kovarên wek Jîn (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê dîsa wek 'nîsan' hatiye bikaranîn. Di van salên dawîn de hinek kovar û rojname navê meha nîsanê wek 'avrêl' bi kar tînin. Gava peyvek ji sedî sed kurmancî hebe û reh û şaxên xwe di nav xelkê de berda be, ma merivê çima bi dû 'avril'a frensî bikeve? Bi ya min ev helwest ne durist e. Divê meriv rojek berê dev jê berde.

Gulan e, şingîna dasan e

Meha Biharê ya paşîn gulan e. Di gotinên

pêşyan de navê meha gulanê wisa derbas dibe: 'Gulan e, şingîna dasan e.' 'Gulan e, ba û baran e.' 'Gulan e, roj bû sal e, zik bû çal e.' 'Gulan e, bext baran e.' 'Gulan e, dew li cem hemûyan e.' 'Gulan rewşa çiyar e.' 'Gulan e, mozelan e.'

Di Qewlên Êzdiyatîyê de meha gulanê wisa dipeyve:

*Gulan dibêje ez gulana bi gul im
Ez a bi şalûl û bilbil im
Ez melhema birînên kul im.*

Li ser navê meha gulanê gengeşî tune ye, her kes vî navî qebûl dike. Di kovarên wek Jîn (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê dîsa wek 'gulan' hatiye bikaranîn.

Kevirê havînê, bavê kadînê

Her sê mehên havînê ev in: Hezîran, tîrmeh (temûz) û tebax.

Navên ku gel bi kar tîne û di lîteratura kurmançî de hatine bikaranîn ev in. Ji bo havîna navîn di folklorê kurdî de, him navê tîrmeh him jî navê temûz gelek hatiye bikaranîn. Divê em ji her du navan yekê derxin pêş. Piştî salên 90'î di çapemeniya kurdî de ji bo hezîranê 'pûşber' û ji bo tebaxê jî navê 'gelawêj' hatine bikaranîn. Lê di nav gel de ev navên nû nehatine pejirandin.

Hezîran e, hizna teyran e

Meha pêşîn a havînê hezîran e. Bav û kalên me ji bo vê mehê gotine: 'Hezîran e, hizna teyran e.' 'Hezîran hezîrî, tu tişt nema bi rengê xwe, ji xêynî keça kezî û mêwa tirî.'

Di Qewlên Êzdiyatîyê de meha hezîranê wisa ba gulanê dike:

*Hezîranê deng dihilîle
Ji mehan navê min havîn e
Ez dibiriqim ser çendî bendê mîskîn e.*

Di kovarên wek Jîn (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê

mehê dîsa wek 'hezîran' hatiye bikaranîn. Di van salên dawî de, hinek weşanên kurdî, ji bo meha hezîranê navê 'pûşber' bi kar anîn, lê di nav gel de cî negirt.

Tîrmeh (temûz)

Meha navîn a havînê tîrmeh (temûz) e. Di gotinek pêşya de navê her du mehên dawî yên havînê wisa derbas dibin: 'Temûz dipêje, tebax dirêje.'

Di Qewlên Êzdiyatîyê de meha tîrmehê wisa ba tebaxê dike:

*Tîrmehê dibê tebaxê,
Te gotineke xweş digote
Û te qanasê buha difrote
Te gelek pezê meskîn
Li deştê ji german disote.*

Di kovarên wek Jîn (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê wek 'tîrmeh' hatiye bikaranîn. Li ser navê meha tîrmehê gengeşî tune ne.

Tebax e, tirî raxe

Meha dawîn a havînê tebax e. Ji bo meha tebaxê çend gotinên pêşyan hene: 'Tebax e, tirî raxe.' 'Tebaxê, agir ket axê.' 'Heyva tebaxê, tirî ket miştaxê.'

Di Qewlên Ezdiyatîyê de wisa behsa meha tebaxê tê kirin:

*Tebax wa deng hiltîne
Ez mehek im nav havîn*

*Çiqas fêkî bikelînim
Hemû di payizê re gehînim.*

Di kovarên wek Jîn (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê dîsa wek 'tebax' hatiye bikaranîn. Di hinek weşanên çapemeniya kurdî de, ji bo meha tebaxê navê 'gelawêj' hat bikaranîn lê ev peyv rûnenişt.

Payiz e, dew ezîz e

Her sê mehên payizê ev in: Îlon, çirriya pêşîn û çirriya paşîn.

Di van salên dawîn de, bi navên mehên demsala payizê gelek hatiye lîstin. Dibe ku ji

ber dirêjbûna navên mehan be, dibe ku ji ber şibandina navan be, ji bo mehên payizê navên nû hatine çêkirin. Van navên nû; dibe ku ji ber tirkî hatibin girtin, dibe ku ji ber sarbûna mehan nav lê hatibin kirin an jî dibe ku ev nav ji soranî hatibin girtin. Lê bi tu awayî gelê kurd van navan nepejirandiye.

Îlon

Meha payizê ya pêşîn Îlon e. Di helbesta Feqiyê Teyran a bi navê 'Dilo rabe' de, navê meha îlonê bi vî awayî derbas dibe.

*Dilo bûrîn ji nîsanê
Hewayê wan mehan kanê?
Bûye eylûl li zozanê
Ne kanûn ma ne cûbare.*

Navê meha Îlonê di Qewlên Êzdiyatîyê de jî bi awayek eşkere derbas dibe:

*Êlûn dibê ez çendiya mehan im
Ez a bi meclîs û reşrihan im
Ez a dayîm ji Şems û Fexrê mîra re eyan im.*

Di kovarên wek Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê dîsa wek 'îlon' hatiye bikaranîn. Di van salên dawî de, di hinek weşanan de navê meha îlonê wek 'rezber' hatiye binavkirin, dibe ku ji ber wextê rezan ev nav hatibe lêkirin. Lê divê meriv zanibe ku navê hezar salan, di nav çend salan de nayên guhertin û di nav heyatê de cîyê xwe nagire.

Çirriya pêşîn

Navê meha payizê ya navîn çirriya pêşîn e. Navê meha çirriya pêşîn an çirriya paşîn di gotinên pêşiyên de wisa derbas dibe: 'Çirri çirristan, payiz cûye maye zivistan.' Ji ber ku her du meh, mehên payizê yên dawîn in, gotina pêşiya navê van her du mehan tesdîq dike.

Di Qewlên Êzdiyatîyê de navê meha çirriya pêşîn pirr zelal derbas dibe.

*Çirri dibê em du meh in, nav bi çirri
Padşayî em xelat dikirî
Li ser me hene naz û namet û tirî.*

Di kovarên wek Jîn (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê dîsa wek 'çirriya pêşîn' hatiye bikaranîn. Di van salên dawîn de ji bo vê mehê du nav hatine dîtin. Hinekan navê 'cotmeh', hinekan jî navê 'kewçêr' bi kar aniye. Navê 'cotmeh'ê dibe ku ji 'ekîm'a tirkî hatibe girtin. Navê 'kewçêr'ê jî di helbeste

Eliyê Herîrî de derbas dibe, dibe ku ji wir hatibe girtin. Her du nav jî li ser kaxizan mane.

Çirriya Paşîn

Navê meha payizê ya paşîn çirriya paşîn e. Melayê Batê di helbesta xwe de wisa behsa çirriya paşîn dike.

*Ji çirriya paşî û pê da
Melayê Batê kanî
Sefer kêşa bi Muksê da
Li ser qewlê zivistanê.*

Eger em dîsa li Qewlên Êzdiyatîyê binihêrin, di heqê mehên çirri de wisa dibêje.

*Çirri du mehên kamil temam
Li ser me xweş bûne çiqas tam*

Payiz mîr e, her donzdeh meh jê re dibine xulam.

Di kovarên wek Jîn (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê dîsa wek 'çirriya paşîn' hatiye bikaranîn. Ji bo navê vê mehê jî du nav hatine çêkirin: 'Mijdar' û 'sermawez'. Dibe ku ev nav çêkirî bin, dibe ku ji soranî hatibin girtin, lê di nav heyatê de cî negirtine.

Zivistan sar e, qerpel yar e

Her sê mehên zivistanê ev in: Kanûnkiz (kanûna pêşîn), kanûnkiş (kanûna paşîn) û sibat.

Di kurmancî de ji çil rojên herî germ ên havînê re dibêjin; 'çilê havînê' û ji bo çil rojên herî sar ên zivistanê re jî dibêjin 'çilê zivistanê'. Dema çilê zivistanê dikeve nav her du mehên kanûnê, ji ber vê jî tevliheviyek çêdibe. Îcar ji ber van çileyên hinekan navên mehan şaş danîne û gotine; 'çileyê pêşîn' û 'çileyê paşîn'. Bêyî vê şaşiyê, hinek navên çêkirî jî li van mehan hatine zêdekirin.

Pêşiyên me li ser navên mehên zivistanê wisa gotine:

*Yanzdeh roj kanûnkiz
Çil roj çile
Yanzdeh roj kanûnkiş
Bîst û heşt roj sibat.*

Wek ku li jor jî xuya ye, rojên mehên kanûnan ên ku ketine nav çile nehatine hesibandin. Wek ku di destpêka çile de kanûnkiz diqede û di qedandina çile de kanûnkiş dest pê dike. Lê eşkere xuya ye ku çile di nav her du mehan de taybetiyek din e, divê wek meh neyê hesibandin. Gava em

rojên kanûnan ên ku ketine nav çile bihesibînin mehên zivistanê sererast dibin.

Kanûnkiz (kanûna pêşîn)

Meha zivistanê ya pêşîn kanûnkiz (kanûna pêşîn) e. Gelo peyva 'kanûn' çi ye? Berê di malan de tifik (kuçik) hebûn, tê de agir dadidan. Îcar li ber tifikê kortikek çêdikirin ku gava agir bive bizot, wî bizotî kaş bikin wê kortikê û xwe li ber germ bikin. Aha navê wê kortika ku însanan xwe li ber germ dikir; 'kanûn' e. Maneya 'kanunkiz' jî ew e ku, serma zêde ye, insan hingî xwe dikutin ber kanûnê dikizirin. Ji xwe li hinek herêman jî kanûnkizê re 'kanûnkut' jî dibêjin.

Di helbesta Feqiyê Teyran a bi navê 'Dilo rabe' de navê meha kanûnê derbas dibe. Nimûneya wê di nav meha îlonê de heye.

Di biwêjeke kurmancî de navê kanûnê wisa derbas dibe: 'Serê kanûnan, selata xiyaran!' Dîsa di gotinek pêşiyar de navê kanûnê wisa derbas dibe:

*Kanûn e ew kanûn e
Berf tê ji ezman e
Qira ebed û insan e.*

Di rojnameya Kurdistan (1898-1902) û kovara Jinê (1918-19), de navê vê mehê dîsa wek 'kanûna pêşîn' hatiye bikaranîn. Di kovarên Hawar û Nûbiharê de wek 'çileya pêşîn' hatiye bikaranîn. Xêncî vî navî di salên dawîn de navê 'berfenbar' jî li van navan hatiye zêdekirin.

Kanûnkiş (Kanûna paşîn)

Meha zivistanê ya navîn kanûnkiş (kanûna paşîn) e. Ji ber ku dinya bi ber xweşbûnê ve diçe û insan xwe jî ber agir dikişînin ev nav lê hatiye kirin. Li ser vê rewşê di gotinên pêşiyar de wisa hatiye gotin: 'Bîst û yekê kanûnan, roj berê xwe dide gul û beybûnan.'

Di Qewlên Êzdiyatîyê de kanûn wisa dibêje:

*Kanûn dibêje,
Em du mehên padşayî, em kirin xelat
Li me dikeve çilê arba ênat*

Ji hedê meha dikeleme sibat.

Di rojnameya Kurdistan (1898-1902) û kovara Jinê (1918-19) de navê vê mehê dîsa wek 'kanûna paşîn' hatiye bikaranîn. Di kovarên Hawar û Nûbiharê de wek 'çileya paşîn' hatiye bikaranîn. Xêncî vî navî di salên dawîn de navê 'rêbendan' jî li van navan zêde bûye.

Sibat jina bî ye, sibê dikene êvarê digirî

Meha zivistanê ya paşîn sibat e. Li ser meha sibatê gelek gotinên pêşiyar hene: 'Sibat jina bî ye, sibê dikene êvarê digirî.' 'Sibatoka dinik e, ge digirî ge dikene.' 'Sibatê, berf û ba tê.' 'Sibatê kûçik xwe davêjin siya latê.' 'Sibat e, malxoyê malê ne kar e ne xebat e, kevanî di nav malê de maye mat e.'

Di Qewlê Êzdiyatîyê de meha sibatê wisa pesnê xwe dide:

*Sibat dibê sibat im, sibat bi nav im
Meheke bi ser û çav im
Geh dibarim geh bi tav im.*

Di kovarên wek Jin (1918-19), Hawar (1932-43) û Nûbiharê (1992-2007) de navê vê mehê dîsa wek 'sibat' hatiye bikaranîn. Di salên dawîn de, di çapemeniya kurdî de jî bo vê mehê navê 'reşemî' hatiye bikaranîn, lê ew jî wek navên din, di nav gel de bêbersiv maye.

Em dikarin li gora salnameya nû navên mehan wisa rêz bikin.

Kanûnkiş
Sibat
Adar
Nîsan
Gulan
Hezîran
Tîrmeh
Tebax
Îlon
Çirriya pêşîn
Çirriya paşîn
Kanûnkiz

Hemû Demsal Payîz in

Ayhan MERETOWAR

Tevî ev qas hêşîrî û evdaliya edebiyata nivîskî ya kurdiya kurmancî, dîsan jî van salan zêdebûna berhevan, dilê mirov xweş dike. Va ye pirtûka Behlûl Zelal jî gihîşt ber destê xwendevanan.

Xwendevanan, Behlûl Zelal bi çend çîrokên wî yên xweş ku di kovara Nûbihar û Weyê de derketibûn nas kir.

Cara pêşîn e ku pirtûka wî li ser zimanê kurdiya kurmancî derdikeve. Temenê Behlûl Zelal çil û dido ye. Ev temen, ji bo edebiyatê girîng e. Bû serê çil û du salan e ku li welatê mîna Kurdistanê dijî. Hema hema nîvsedsalek e. Gava li vî temenê wî difikirim, hema yekser ev tê ber dilê min: Xwedê bi tenê dizane ku aniha çi gêdûk bi ser serê wî de girgirîne. Nexwe wî jî xwe negirtiye; piyê xwe daye erdê, zor daye xwe, xwestiye ku hindik be jî, tîna birînên dilê xwe, bi hin vegotinên edebî bişkêne.

Ev bîst û çar sal in ku Behlûl Zelal, di bin barê giran ê pergala perwerdehiya milî ya Tirkîyeyê de, mielimtiya zarokên sitûxwar dike. Ji çîrokên wî jî diyar e, ew bi xwe jî çendîn di nav xwe de diqilqile.

Mijara her çîrokeke wî, ji ya din balkêştir; bûyera her yekê jî ya din ecêbtir e. Guregura agirê misêwatê ku ketiye dil û hinavê "mirov"ên vî welatî û seraser kezaban daye ber xwe, qijeqij e, ji berêkê ve lê diçe tevî kezaban gurçikan jî bi xwe re dişewitîne, gihîştîye nava nîvê orteya cegera wî jî... Kul ketiye dilê wî; lewra pilepil ketiye pênûsa wî.

Dibe ku xwendevanên ciwan, li ber pêla lehiya êşên wî yên ku heta jê hatiye li koma peyvik û hevokan qelabtiye, neyên pehtin; lê belê xwendevanên ku hay ji

bêsiûdiya cîranên xwe hene, bêguman dê bibin aveke zelal a kaniyeke ber vê lehiyê û tevli wê bibin; bi sermestî pê re biherikin.


* * *

Ev serdema me ya îro, ji serê çendik û çend salan ve ye ku çî ji aliyê olî ve çî ji aliyê siyasî ve çî jî ji hêla civakî, medenî û eskerî ve be, hest, nêzîktêdayîn û kêfxweşiyên jiyânî yên mirovan, dixwe nav tarî û zilûmatê. Mirovên ku xwe oldar nîşan didin, ne li gor rastiya ola xwe dijîn. Riknê siyasî, bûye derew. Aborî her diçe li ser milê xizan û hejaran, dibe kefenê mirinê. Jiyana civakî, berê xwe ji hevhezkirinê badide. Ha, van taybetiyên van rewşan, kiriye ku nivîskarê me jî, hewl bide da ku berê çavê xwendevanên xwe bizivirîne ser van kul û kederan. Heta ku jê hatiye, rûyê reş ê van bêbextiyên ku li nav civaka me, bi destê serdestan tînin qewimandin, bide ber awirên hişk û tijejan ên xîretkêşan.

Ez pê dizanim ku hemû bûyerên di berhema wî de rast in. Di nav wan de bûyera ku ez pir pê êşiyam, çîroka bi navê "Xîret"ê ye.

Gundiyekî reben ku şereşan, di "serxet" û "binxet"an de, tevî gepa nanê xwe û zarokên xwe, ji guleyên kor ên zalimbavên ber tîlên rêsayî, bi deh salan filitiye, bi destpêka şerê mirovîxwaziyê ku li dijî bêmîrî mirovîpelox serî daye, ketiye bin barê giran ê tivinga talankeran û nekariye xwe jê bifilitîne. Lewre tiştê ku pê bûye, zarokên xwe daye ber xwendinê. Xalê Xelefê gundî, kurekî xwe daye xwendin û kiriye mamoste. Lawekî wî yê din jî, li ber qedandina unîversîteyê ye. Ew jî dê bibe mamoste. Çi feyde qeza û

belayeke mezin bi serê wan de hatiye; bavê wan bûye "cerdevan". Îsmet ku li unîversîteyê dixwîne, pê dihişê ku bavê wî jî, toqê naletê ku tivinga birakujiyê ye, daye ser milê xwe. Gava tê gund, gefan li bavê xwe dixwe:



“Heke tu vê tivinga bēnamûs neavêjî, ez ê bibim gerîla û bêm pêşî te bikujim.”

Çendakî bi ser de dibihure û li vî gundî şer dertê. Şer zaf xedar e. Di şeveke ku çav çavan nabîne de, gurmîn û reqîn bi makîneyên jînkujê dikeve. Xelef jî di şer de ye; berê tivinga wî jî li ser mezlûman e. Di sewgura sibeheke xwînî û barûdî de, fermandarê wan bangî Xelef dike û wî dişîne ser cendekên kuştiyan. Ew çî ye, çavê Xelef bi çavê vekirî yê Îsmetê wî yê bēmirad dikeve. Dibe gurmegurma ku nivîskarê birûskên kezebperitînê di dilê wî yê reben de... Diwace, dizare û dinale. Waca wî berî ku wî bibehecîne, radihêje tivinga xwe ya peşkbireş, heta ku tivinga wî dibehce, tevî xwe, çend kesên eniya xwe ya şerî jî dibehcîne.

Nizanim vî camêrî, ev bûyer bi çî awayî, li kê derê, bi dest xistiye; bes gelek bûyerên weha tije hesret û axîn hene li nav vî gelî û mixabin ketine mijê wendabûnê. Xwîna gelek kurebavên esîlzade di ber hebûna xîret û namûsa vî milletî de rîjiyaye; lê belê digel vê egîtiyê jî, ne xema hin bēeslên vî gelî ye. Helwesta bixîret a Behlûl Zelal, qebûl nekiriye ku ev bēxîretî bibe konekî reş û li ser serê wî jî deyne. Daye pey hestên şefqetê, ketiye bin mil û mēxên şikestî yê malbateke esîl û devê “qelem-şûr”ê xwe daye ser sitûyê bēbextiyê; gotiye şelp û serî biriye.

Digel ku nivîskarê me ji hêla Midyadê ye jî,

karibûye bi rihetî xwe bigihîne zimanê şîrîn ê kurmanciya nivîskî ya giştî. Tevî herêmîbûna biwêj û sazkirina hevokên ku xweserî hêla wan e, tehma kurmanciyê xweş bûye.

Hevokên dirêj, giranî dane ser metnê. Zafbûna gihanekan, rewanbûna vegotinê qels kiriye. Jixwe hevok dirêj bûne, îca gihanekên mîna “ku” û “û” jî bûne barê ser baran. Dîsa dikarim gilî û gazine xwe ji wan pêşdaçek û paşdaçekan bikim; lewre wan jî dilê xwe bi herikîna ziman rihet kiriye.

Vegoterê me, gava lehengên bûyerê tevî cî û demê vedibêje, karibûye bi şayesan salix bide. Tehlîlên wî yên ser leheng û kesên din ên bûyeran, tēra mereqa xwendevan nakin. Carcaran hin tiştên girîng ku xwendevan divê pê bizanibe, ji hêla vegoter ve nehatine vegotin. Heke bi awayekî tēr û bes, cî nedaya diyalogên lehengan, bē guman dē vegotin tîsî bimaya.

Bandoreke xurt a bûyerên vê serdemê dixuyê li ser vî vegoterî. Bi ser vî metnî re çiqas dem û dewran bibihurin jî, çî gava ku xwendevan devê vê berhemê veke, teqez dē bē hemdî xwe bikeve bin bandora serdema vegoter. Vegoter çiqas ketiye bin tesîra bûyerên dewra xwe, wî bi şanazî kariye ev tesîr li xwendevên jî bike.

Xweziya metin û nivîskar, di wê kelekela gurûgeşîya hestan de bi hev re bikelijîna.

28.08.2007

Bo Sînemê; Di Her Sînî De Sînemek Şîn e

Omer DILSOZ

*Bila serraxa me gûnî be,
Bila binraxa me postê jûjî be
Lê bila dilê malxirab dil be*
Şakiro

Sînem, şeşbendiyeke bi nav û bang e û di kelepura kurdî de xwedan cihekî gelekî mezin, berkeftî û dagirtî ye. Dibêjin, ji 365 beytan durist dibe ku ev beytên hanê li ser devê dayik û yarê Sînemê hatine vestrandin.

Sînem jî wekî Mominê serhatiyeke ji devera navçiyayî ya Hekariyê ye û ew jî tûşî buxtan û bêbextiyekê dibe, li ser derew û bêbextiya melayî ji aliyê dezgirê xwe ve bi bêbextî tete gorikirin.

Sînem stêr e l'esmanan, wê l'hindava dinyayê

Sînem min dît l'eywanê kezî û gulî badayê

Bisk şor bûne ser rûyî min dît û dil ket tayê

Min xwest ewê biramûsim felekê çerxek dayê

(Bêjine babê Sînemê ez û Sînem (ne)yar in,

Bêjine dayka Sînemê ez û Sînem (hev)yar in)

Li devera Culemêrgê ev destana Sînemê hin bi nav û deng bûye, êdî çu mal û ocax nemane ku Sînemek tê de nebe. Êdî çu gênc û law nemane ku Sînemek di dilê xwe de neçandibe. Sînem, êdî navê hemû keçikên nexirî yên maqûl û pismîr û pisaxayan bûye. Welê bûye ku

êdî li welatê navçiyayî bêrîvan di ber bêre, di ber hejandina landikê re, di ber kiyana meşkê re, şivan li ber guhor û şevînan, li serê çiya û dol û newalan her bi stran û beytên Sînemê, bi eşq û şewqa wê rabûne û rûniştine. Li kîjan stêrkê nihêrtine wek Sînem nav tê dane, jixwe dîlan û govend, şahî û dawet bi Sînemê dest pê kirine û bi wê xemilîne û bi wê bi dûmahîk hatine.

Heçî devê kovanên xwe vekiriye, heçî xwê bi birîna dilê xwe wer kiriye, rabûye peyvek, axînek, gaziye li Sînemê ber dilê xwe kiriye û beytek lê zêde kiriye. Heçî mirazxwazê li ber miraza xwe geriyaye hewara xwe bi Sînemê gehandiye û li ser Sînemê lorandiye.

Sînem bûye sînemnameya nenivîskî ya devera navçiyayî, wekî qewlekî pîroz ji vî dengbêjî veguheziye ber yê ditir, ji vî koç û diwanê çûye ya ditir; dengê dengbêjan ketiye, koç û diwan ji hev belav bûne lê Sînem her zindî û jinde maye di dil û aqlê her kurdekî ji devera navçiyayî de...

Sînem, êdî bûye mabed û perêzgeha dîlan. Heçî bi derdê dîlan ketiye, bi pêlên Sînemekê wer bûye û merem û kesera dilê xwe bi gazî û hewara Sînemê verevandiye. Salê dozdeh mehan Sînem li ser zar û devê gundî û rênçberan, dilxwaz û dildaran bûye. Dayikan bi Sînemê dergûşa xwe nivandiye û ew bi Sînemê hînî axaftin û gotinê kirine.

Sînem, navekî bêbextî û buxtana reş

Sînem, navekî keser û hezkirina bêwext

Sînem, navekî ji sîn(g)ê ber bi sîn(g)ê

Sînem, navekî ji bextî ber bi bextî bûye...

Sînem, stêrek li asmanan...

Sînem, gulek li nav hewdê da...

Sînem, durrek di bin behrê da...

Sînem, êdî dûr û nêzikên her kesî/ê de, di her galegal û xebirdanê de navekî aşîna, evîneke her zindî, çirayeke her pêxistî, tifik û kuçkeke her germ, tenûreke her şariyayî, sêleke her sincirî,

sîneke her vekirî bûye; bijkoşkeke berwext pişkdayî, êş û janneke giran bûye...

Sînem gulek d'hewdê da wê l'dinyayê nav dayî

Sînem min dît l'bêlayê xunavê l'xalê dayî

Kezî û biskêt armûşî wê l'xizemê aliyayî

Min xwest ewê biramûsim felekê çerxek dayî

(Bêjine babê Sînemê ez û Sînem (ne)yar in,

Bêjine dayka Sînemê ez û Sînem (hev)yar in)

Sînem, şerê bi felekê re bûye; felek li dor geriyaye, li felekê aliyaye, bi felekê vemaye, dûv felekê geriyaye... Felek û Sînem bi hev re ne, heçî li devera navçiyayî ketiye ber bayê felekê li Sînama ber dilê xwe vegeriyaye, ji Sînemê re giriyaye, bi sînê sîn Sînem ji ruhê wî dawêşiyaye. Her keçê di dilê xwe de xwe bi Sînemê venihêraye, her kurî di dilê xwe de bo Sînama xwe dax û kovan kêşaye.

Sî-n-em

Sînem, wekî sî û sîberê bûye li devera çiyayî, her berêvarê berî ku roj xwe di pişt giyar û gopikên wan çiyayên bilind û pîroz de veşêre, siya Sînemê xwe nîşanî çavên evîndar, dildar, mirazxwazan dide. Her şev di nav komestêran de dibişire û tê hindava Hekariyê û heta berbangê ji bo ku zarok û sava bi aramî binivîn, nobedariya wan dike. Sînem, her spêdê berî tişka rojê bi rehma xwe ji bo ku dilsax û dilsozên vî bajarî ji xewa reş û tarî hişyar bike û bihemêzîne, li rûyê vî bajarî dikene û ew hiltê berî tavidanê...

Sînem, siya me

Sînem, diya me

Sînem, riya me

Sînem, jiyê me bûye

Sînem, berî sînê me hebûye, di sînê me de çal bûye, tê de çikiliyaye, lê hêwirî ye, tê re daçûye, lê reh daçikandiye; ango, em

sînê xwe bi Sînemê vedikin, çavên me bi Sînemê dibînin vê dinyayê; di mij û morana buxtanê de çirûskeke her ronîdar e Sînem, navê hemû tiştê me yê ku me di dilê xwe de perestiye, vaktîs kiriye, me qirêjiya jiyanê tê de şûştiye, evane hemû, li sînê me, li parzûnga Sînemê parzînine, pak û bijûn bûne û sînê me pê hatiye şûştin, ji sînê xwe me bi Sînemê maliştiye hemû gend û gilêşê jiyanê...

Sînem durrek bin behrê da ez çûmê bi xewazî

Sînem min dîtî l'ser avê sûret sorê qurmizî

Bejin şutila rehanê d'bin lêvan ra digirnişî

Min xwest ewê biramûsim nehêla mela û qazî

(Bêjine babê Sînemê ez û Sînem (ne)yar in,

Bêjine dayka Sînemê ez û Sînem (hev)yar in)

Sînem, Zîneke bê Mem bûye li navçiyayî, Mem kor bûye, Mem dîr bûye, Mem bê hiş û fam bûye, lê çi çar e, tîr ji kevanî verestiye, Sînem bûka axê bûye, Sînem, stêra asimanê winda bûye, pêşemanî çi fayde, Sînem guleke çilmisî, giryan û lavelav ne duhî ne jî sibê dibe derman; dar şikest, Sînem bi xwînê gevizî û çîrokê ji nû ve dest pê kir...

Sînem, dîr e

Sînem, kûr e

Sînem, hûr e

Nehingivê vê birînê, vê carê ez ê di lepî de dilek, di çengî de gulek, di çavî de rondikek, bi rût û tazî, wek uryanek bême ber dergehê te, û, ez ê bibêjim her bibêjim vê stranê; Sînem rabe li te zû ye li min dereng e...

Sînem rabe...

Rabe Sînem...

Sînem li sînê min şîn e,

Şîn e li sînê min Sînem!

2007-10-19 / Diyarbekir

Pisîka Li Ber Baranê

Ernest HEMINGWAY

Li otêlê tenê du amerîkî hebûn. Yên ku gava diçûn odeya xwe û dihatin di pêlikan de pêrgî wan dihatin yek ji nas nedikirin. Odeya wan li qata duduyan, derya li hemberî wan bû. Park û peykerê şer ji didît. Li parkê palmiyeyên kesk û bank hebûn. Di rojên ku hewa xweş bû de bêguman wênesazek li pêş sêpîka xwe bû li wê parkê. Kêfa wênesazan ji dîmenên ku bi palmiye û rûyê otêlan ên rengîn ku li parkan û deryayê dinihêrîn re dihat. Yên îtalî ji riyên dûr dihatin da ku peykerê şer bibînin. Peyker ji mefreqê bû û di binê baranê de dibiriqî. Dîsa baran dibariya. Çipikên baranê ji pelên palmiyeyan dihatin xwarê. Li ser xaçerêkên xîçînî gomên biçûk ên avê çêbûbûn. Derya bi pêlên xurt dihate bi peravê dida û ji bo ku dîsa xwe bi hêz bike paşde vedikişiya. Li qada ku peykerê şer lê bû qet erebe nemabû. Li ber deriyê xwaringeha li wî aliyê garsonêkî li qada vik i vala dinihêrî.

Jinika amerîkî li ber pencereyê li derve temaşe dikir. Tam li hemberî pencereyê di binê maseyeke ku rengeskî bû de pisikekê xwe gevçilandibû mabû. Ji bo ku baran bi ser de neyê ji hema hey xwe dikir gilok.

Jinika amerîkî got; "Ez ê dakevim wê pisîkê bînim."


Mêrê wê ji ser nivînên xwe got, "Tu dixwazî ez herim."

"Na, ez ê bînim. Pisîka reben, ji bo ku şil nebe çawa xwe di binê maseyê de gevçilandiye."

Mêrik li berovajiyê doşeka xwe du balîf dabû ber piştê xwe û pirtûk dixwend, got; "Tu şil nebî ha."

Jinik daket jêr, xwediyê otêlê rabû û silav da wê gava di ber ofîsa wî re derbas bû. Maseya wî li quncîka ofîsê bû. Xwediyê otêlê kalemêrêkî bejindirêj bû.

Jinikê got; "Il piove(1)." Kêfa wê ji xwediyê



otêlê re hatibû.

"Sî sî, Signora, brutto tempo(2). Hewa gelekî nexweş e."

Mêrik li ofîsa korik li paş maseya xwe li piyan sekinîbû. Kêfa jinika yê amerîkî ji wî re hatibû. Guhdariya wî ya li daxwazekê, tevgerên wî yên hurmetkar li xweşa wê diçû. Ji bo ku xizmeta wê bike û pejirandina wî ya otêlvaniya wî li xweşa wê diçû. Di taliyê de, rûyê wî yên pîr û gihiştî û lepên wî yên gird ji li xweşa wê çûbû.

Bi fikirandina li wî re, derî vekir li derve nihêrî. Baranê bêtir dabûyê. Mêrikekî ku qapûtekî baranê lê bû di qada vala de ber bi xwaringehê ve dimeşiya. Qey pisîk bi aliyê rastê ve çûbû. Belkî jî di binê serbaneyan re reviyabû çûbû. Gava jinik di nava derî de disekinî siwanek ji paşde vebû li ser wê, keçîka ku li odeyê xizmeta wan dikir bû. Keniya û bi îtalyanî got, "Şil nebin ezbenî." Bêguman wê xwediyê otêlê ew şandibe.

Bi siwana ku xizmetkarê jê re girtibû di xaçerêka bixîç re meşiya heta binê pencereya odeya xwe. Mase li ciyê xwe bû, bi baranê hatibû şuştin û boyaxa wê ya kesk jê çûbû û pisîk jî çûbû. Jinik ji nişka ve mabû li erdeke reş. Keçîka xizmetkara wan li wê nihêrî û pirsî:

“Ha perduto qualche cesa, Signora?(3)”

“Pisîkek li vir bû.”

“Te got pisîk?”

“Sî, il gatto(4)”

“Te got pisîk?” keçika xizmetkar kenîya, “Pisîkek li ber baranê?”

“Belê, di bin maseyê de bû. Min ew qasî ew xwestibû... Min pisîkek xwestibû.”

Gava jinika amerikî bi îngilîzî diaxîfî, tîrên li rûyê keçika xizmetkar vedikêşîyan.

Got; “Sîgnora, werin em herin hundir. Hûn ê şil bibin.”

“Belê, rast e.”

Di xaçerêka xîzî re çû û di derî re kete hundir. Keçika xizmetkar li derve sekinî da ku sîwanê bipêçe. Gava ya amerikî di ber ofîsê re borî mêrik dîsa bejna xwe tewand û silav dayê. Wekî ku tiştê di dilê wê de pir biçûk bûbû û şidiyabû. Li hemberî mêrik hem kete rewşêke gelekî biçûk-ketî hem jî kete rewşêke gelekî ku xwe yeka girîng dihesiband. Ji nişka ve xwe mîna yeka zaf hêja û girîng hîs kir. Di pêlikan re hilkişîya odeya xwe. George li ser nivînên xwe dirêjkirî, pirtûk dixwend.

Pirtûk danî û pirsî; “Te pisîk girt?”

“Çûbû.”

Ji bo çavên xwe rihet bike navber dabû xwendinê; “Weh! Bi ku de çû” paşê rabû rûnişt.

Jinik li ser nivînan rûnişt û got:

“Min ew gelekî dixwest. Nizanim min çima ew qasî xwest. Min ew pisîka hejar xwest. Qet ne tiştêkî xweş e ku pisîkeke hejar li ber baranê bimîne.”

George dîsa dest bi xwendinê kiribû.

Jinik çû li ber neynika maseya odeya razanê rûnişt, neynikek girt destê xwe û dest pê kir li vir de wê de li xwe nihêrî. Carekê jî hêlekê de cara din ji hêla din ve li profila xwe nihêrî, paşê jî çav li porê xwe yê li paş û li stûyê xwe gerand. Dîsa li profila xwe nihêrî û jî mêrê xwe pirsî:

“Ez porê xwe berdim ew ê çêtir nebe?”

George, li paştstûyê jina xwe, li porê wê yê ku mîna yê kurikekî biçûk kurt hatibû kurkirin nihêrî, got;

“Kêfa min wisa jê re tê.”

“Ez jê çûme êdî, ji şibandina xwe ya bi mêran aciz im.”

Mêrê wê xwe ji ciyê xwe qeliband bi hêleke din ve, ji qasekê de li jina xwe dinihêrî, got; “Tu zaf xweşik î.”

Jinikê neynika di destê xwe de danî ser maseya odeya razanê û ber bi pencereyê ve çû li derve nihêrî, dinya tarî bûbû.

“Dixwazim porê min dirêj û dûz be. Ez wisa gilokeke mezin çêbikim... yan jî bila pisîkeke min hebe. Min ê di hembêza xwe de ew mist bida, wê jî dê ji min re bikira miremir.”

Mêrê wê ji ciyê ku xwe lê dirêj kiribû got; “waa?”

“Dixwazim di taximên xwe yên zîv de xwarinê bixwim, maseyê jî bi mûmikan bixemilînim. Paşê jî dixwazim bibe bihar, da ku porê xwe yê dirêj li ber neynikê şeh bikim. Dixwazim pisîkeke min hebe... Cilên min ên nû jî bila hebin.”

George got; “Êêê, de bes bike pitepit û tiştêkî bixwîne lê.” Û xwendina xwe berdewam kir.

Jina wî di pencereyê re li derve dinihêrî, dinya êdî tam tarî bûbû. Baran hê jî bi ser palmîyeyan de dibariya.

“Naa, ez pisîkekê dixwazim. Pisîkê dixwazim... Niha dixwazim. Porê min ê dirêj an xwestekên min ên din neyên ci jî, dibe ku pisîkeke min hebe wî...”

Mêrê wê li wê guhdarî nedikir û pirtûka xwe dixwend. Çavên jinikê li derve, li qada ku êdî çirayên wê vêketî bû.

Li derî ket, George got; “Avantî!(5).”

Serê xwe rakir û nihêrî, ya li ber derî xizmetkara wan bû. Di destê wê de pisîkeke cûn ku hişk bi sînga xwe ve zeliqandibû hebû.

Xizmetkarê got; “Biborin, xwediyê otelê xwest ku ez vê bidim Signorayê.”

Wergera ji îngilîzî; Sîdar JÎR

Têbînî

(1) “Baran dibare”

(2) “Belê, rast e, hewa xerab e sînyora”

(3) “We tiştêkî xwe wînda kiriye, sînyora?”

(4) “Erê, pisîk”

(5) “Kerem bikin”

Çeka Mêrkuj Polê Berxan

Ronald DAHL

Ode hênîk, danehevî û perde li ber pencereyan bû. Du lampe li ser maseyê û kursiyekî vala li ber hebû. Li ser bufê, li pişt Mary Maloney du fincanên dirêj, av, soda û wiskî hebû. Sîtîla termosî bi kabîkên qeşa dagirtî bû.

Mary Maloney li benda mêrê xwe bû ku dê ji kar bihata.

Niha dîsa wê serê xwe rakir li saetê mêze kir, bi aramî dilê xwe xweş kir. Ji ber ku her kêliya diçû hatina merê wê nêzîktir dikir. Bişîrîneke sivik li ser rûyê wê û tiştên ku ew pê dilebikî bû. Gava wê girêk avêt tenteneya xwe, serê wê ji hinekî ber bi xwarê ve tewiya. Bêhemdî wê, laşê wê yê wek zarokeke şes mehî nazik û xweşik biriqand. Devnêrm û meyza wê ya mişt aram, çavên wê ji berê reştir û gîrştir dida xuyakirin. Gava saet bû pênc kêkî deh, wê guhên xwe mûç kirin. Piştî kêlikeke din, wek her car dîsa ji derve hisa tekerên erebê ku li ser zixurên hewşê dizivîrin kir, şingîni ji deriyê erebeyê hat, sahwêrek di ber şîbakê re derbas bû, miftetek di xilka derî de zivirî. Wê singik û tenteneya xwe danî, rabû ser xwe û wek her car çû pêşîya mêrê xwe û ew maç kir.

Wê got mêrê xwe; "Tu bi xêr hatî, delalîkê ber dilê min!"

Wî bersiv da got; "Tu sax bî xoşewîstem."

Wê çakê mêrê xwe ji dest girt û daleqand. Piştî ew hinekî bi jor ve meşîya da ku vexwarîneke dagire. Vexwarîneke tîr ji bo mêrê xwe, yeka sivik ji bo xwe dagirt û çû veşîrîya li ser kursiyê xwe rûnişt, dîsa rahişt singikê tenteneyê xwe. Mêrik bi fincana dirêj ku bi her du destan girtibû, li miqabilê wê rûnişt. Wî vexwarîna fincana destê xwe dibir û dianî, pê dilîst û dengên kabîkên qeşayên ku li derdorên fincanê diket, dihat.

Ji bo Mary Maloney ev wextekî herî dilşad ê rojê bû. Wê dizanî heya ew vexwarîna xwe ya pêşî xilas neke, wî nedixwest ku gelek

bipeyive. Û ew li cihê xwe bêliv, bêhis û deng rûniştî bû. Piştî demeke dirêj li malê, bi tena serê xwe, êdî kêfa Mary Maloney lê bû. Gava ew li cem mêrê xwe rûdinişt gelek kêfa wê dihat û dilê wê germ dibû. Wek rojeke germ li ber zeryayê ku ew tikîtenê xwe li ber rojê dirêj bikin. Gava mêrik li ser kursiyên xwe bi rûyekî nerm rûdinişt, gava wî bi sivikayî dida devê derî û ode bi gavên xwe yên dirêj qevz dikir, gelek kêfa Mary Maloney ji wî re dianî. Wê pir hez dikir ku bêhis û deng li nava çavên wî binihêre. Gava ew di çavên mêrik de radiwestiya şiklê dev û lêvên wê diguherî ber bi bişîrînekê ve. Piştî kêliyeke bêdeng, westandîna mêrik hat bîra jinikê. Heta hinek wiskî ji fincana zilêm çû li hevrûniştina bêhis û deng domand.

Mary Maloney pirsî; "Ruhê min ma tu westiyayî?"

Zilêm got; "Erê," û bi ser ve kir û got; "Ez westiyame."

Mêrik bi axaftina xwe re, tiştêkî ku tu carî nedikir, kir: Wî rahişt fincana xwe ya ji nivî tijêtir û bi derbekê re bi ser gewriya xwe dakir. Bi vê qurtê re nivê fincanê vikîvala bû. A rastî dêhna jina wî ne lê bû. Lê gava mêrik milên xwe hêdîka nîzm kirin û serê xwe bi paş ve quliband û wê, dengên kabîkên qeşa yên gindirî wî serê dinê fincana vala his kir, êdî wê dizanî wî çî dikir. Ew bîstekê sekinî, xwe da ser pêşîya kursiyê û rabû ser xwe dîsa li hundir hêdîka careke din çû, hat.

Mary Maloney ji nişka ve rabû û bi dengêkî bilind got; "Ka ez ê dagirim."

Wî got; "Rûne."

Gava ew veşîrîya, bala Mary Maloney çû ser wiskiya wî ya nû ku wek kehrebarê tarî ye.

Mary Maloney got; "Ruhê min, ma ez şimikên te binim?"

Wî got; "Na."

Wê li mêrê xwe yê ku qurtek li wiskiyê da nihêrî û wê tîrbûna nava fincanê ji zivronên wek rûnê li ser avê pêk dihatin, didit.

Mary Maloney got; "Ez dibêjim ev tiştêkî gelek şerm e." û wê domand; "polîsekî wek te bi qidem û li ber qomsêrtiyê ku ji şeveqê heta êvarê li ser darê lingan hişk dibe..." Wî bersiv neda. Werhasil wê dîsa serê xwe bi ser tenteneyê xwe ve tewand, ta û singik li hev xistin. Wî her serê kêliyekê fincana xwe ber bi lêvên xwe ve dibir û wê dengên kabîkên

qeşaya li derdora fincanê diket, dibihîst.

Wê got; "Ruhê min!" û domand "ma ez hinek penêr ji te re bînim? Min îro tu şîv çênekiriye ji ber ku îro pêncşem e."

Wî got; "Na."

Wê got; "Heke tu pir westiya bî û ku em herin li derve şîvê bixwin" û domand "hê ne dereng e. Hinek goşt û fêkî di sarincokê de heye, ez dikarim amade bikim û bêtî ku tu ji ser kursiyê xwe bilebitî ji te re bînim."

Çavên wê li ser wî, li benda bersivekê, bişîrînekê, an bi serê xwe erêkirinekê bû. Lê tu pêjn ji wî nehat.

Wê got; "Baş e," û domand; "Nexwe ez ê hinek penêr û hinek qraker bînim."

Wî got; "Ez tiştêkî naxwazim."

Ew li ser kursiyê xwe lebitî, çavên wê yên belbûyî hê jî li rûyê wî dinihêrî.

Mary Maloney got; "Lê divê tu tiştêkî bixwî! Va, ez ê ji te re çêbikim. Êdî tu bi kêfa xwe yî; tu bixwî, an nexwî."

Ew rabû ser xwe û tenteneyê xwe danî ser maseya ber lambê.

Wî got; "Rûne!" û bi ser ve kir; "Bîstekê, ka rûne..."

Ew heya niha wisa neqehirîbû û bihêrs nebûbû.

Wî got; "Ez ji te re dibêjim rûne."

Wê bi wan çavên xwe yên bellbûyî û şaşmayî, xwe hêdika li ser kursî pal da. Wî fincana duyem qedandibû û bi keservedanê li nava fincanê dinihêrî.

Wî got; "Bihîsê," û domand; "Ez ê tiştêkî ji te re bêjim."

Wê got; "Xêr e, tu yê çî ji min re bibêjî ruhê min? Mesele çî ye?"

Ew bi temamî bêliv bû û serê wî hê jî di ber de bû û hinek şewqa lambeya nêzik li ser aliyekî rûyê wî diket. Hinarik û lêvên wî di bin siyê de diman. Bala wê kişand ku masûlkeyeke biçûk bi ser çavê wî yê çepê ve dilivê.

Wî got; "Ez newêrim, tiştê ez bibêjim dê hinekî te bihebitîne ji bo te bibe wek şoqê" û wî berdewam kir; "Lê ez fikirîm ku ji te re ya rastî bibêjim û ya herî baş ev e. Ez bi hêvi me tu min gelek tawanbar nekî."

Û wî jê re vegot. Wê gelek dom nekira, pir pir pênc şeş deqe wê bigirta. Û her tişt jê re got. Her gotineke ji nav lêvên wî diweşiya ew

çavên wê yên erjengî ji wan dibarî hêdî hêdî ji wî dûr dixist.

Û wî bi ser ve kir got; "Erê hemû ev bû.." û domand; "Ez dizanim ku ne wextekî baş e ku min ji te re got, lê bi hesanî ez bibêjim hew çareya min mabû, jixwe qet mitale meke, ez ê pereyan bidim te û ez ê li te binihêrim. Ez dibêjim ne hewceyî mitaleyan e. Dizanim wê ji bo karên min ne baş be lê."

Wê dikir û ne dikir bawerî pê nedianî ku mêjiyê wê vî tiştî qebûl bike. Ji nişka ve wê dît ku ew hew diaxive, wê bi xwe her tişt di serê xwe re derbas kir ku çî bi serê wê hatiye û belkî xeyalek be. Heke ew bi karê xwe re mijûl bibe û xwe li wan gotinan neke xwedî belkî, piştî gava bi xwe ve hat û ji vî xewnê şiyar bû, wê tiştêkî wisa qet neqewimibe.

Wê di ber xwe de bi dengêkî nizm got; "Ez ê şîvê bînim,"

Vê neqlê mêrik eleqeya xwe jê neanî, ew nesekinand.

Gava Mary Maloney meşiya çû wî serê din ê odeyê, piyên xwe yên pê li erdê dikirin hîs nedikir. Wê ji xeynî dilxelanêke verişandinê pê ve tiştêkî hîs nedikir. Niha her tişt bi otomatîkî pêk dihat, daketina li ser derenceyan, vexistina lambeyê, dîpfirîz, pelandina destê wê li nava dîpfirîzê, tiştê ku pêşî ket ber wê rahiştê bi destê xwe girt. Wê ew pêşî derxist derve, piştî lê nihêrî. Ew li kaxizekî peçayî bû. Kaxiz ji ser rakir û dîsa lê mêze kir.

Polekî berxan.

Baş e nexwe, şîva wan goştê berxan e. Wê rahişt pol bir qata jorîn, bi her du destan bi dawiya hestiyê zirav ê pol girtibû. Gava ew ber bi hêwankê ve çû, wê dît ku mêrik li ber pencerojê piştî wî li wê ye, û Mary Maloney rawestiya.

Wî di ber xwe de digot; "Ji bo Xwedê.." wî pêjna hatina Mary Maloney dikir, lê ew li xwe nezivirî û domand; "Tu şîvê ji min re çêneke. Ez ê derkevim derve."

Hema wê kêlikê, Mary Maloney bi hêdika çû pişt û bêrawestan polê berxê yê qeşagirtî rakir hewayê û ji pişt ve heta ku Xwedê himet dayê di serê wî re kişand.

Mary Maloney wek bi doqikekî hesinî li wî bixe, lê da.

Mary Maloney gavek berepaşkî avêt,

rawestiya û ya eceb ku qederê pênc şeş çirkan zilam li ser piyan di cihê xwe de bêliv ma, hêdika şewiş û ji qam ve çû erdê û li ser mehfûrê pîj bû.

Ketina zilêm a bi zilomatî, deng, qulibitina sehpeyê ew ji hebitandina şoqê hilçand. Şilahî bû, laşê wê qerisî û hişk rawestî hêdika bi ser xwe, ruh bi laşê wê hat. Polê berxê hê jî di destên wê de bûn.

Wê di ber xwe de got; “Ha îcar, min ew kuşt.”

Niha, êdî rewşeke awarte ye, gelo çawan mêjiyê xwe ji van bûyerên qewimî paqij bike. Ew gelek bi lez ramiya. Ji ber ku ew jîna detektîfêkî ye wê gelek baş dizanî çî li pêşiya wê ye. Ev baş e. Ev tişt wê nebe asteng. A rastî ev jî wê re pir bibe alîkar. Lê ji aliyên din, gelo dê çî bi zarokê were? Gelo çî mafên zaroka mêrkujê ya çênebûyî heye? Ma gelo vê zarokê bi wê re bikujin? Gelo deh mehan li benda ku zarok çêbibe namînin? Wê çî bikin?

Mary Maloney nizanîbû. Û ew bi rastî jî ji bo tişteki wisa ne amade bû.

Wê goşt bir mutbexê, danî ser sifreyekê û ku biavêjê firnê. Firne vexist germbûn anî ser dereceya herî bilind û sifre ajot nava wê. Piştî destên xwe şûştin û beziya qata banî odeya razanê. Ew li ber mirêkê rûnişt, biskên xwe dan hev û porên xwe girê da, rûye xwe mist da. Wê xwe ceriband ku bibişire. Lê bişirîn jê re zor û ecêb hat. Wê dîsa xwe ceriband.

Wê bi dengê geş û bilind bang kir; “Roj baş Kekê Sam,”

Dengê wê jî bi ecebî derket.

“Ji kerema xwe re, ka hinek petat bide min Sam. Erê, û qotîyeke polikan.”

Ha ev çêtir bû. Deng û bişirîn çêtir li hev tîn. Wê çend caran dengê xwe dubare kir. Piştî ew bi lez reviya jêr, qaputê xwe li xwe kir, di deriyê dawî re derket derve, hewşê û nava kolanê.

Saet hê nebûbû şeş, lê dîsa jî dikana ku fêkî li ber, lambeyên xwe vexistibûn.

Wê li pişt dezgeha dikanê bi dengêki mişt bi dilşadî û geş got; “Qewet be Kekê Sam.”

Sam got; “Çi, ha êvar baş Xwişka Maloney. Tu çawan î?”

Mary Maloney got; “Ji kerema xwe re, ka hinek petat bide min Sam. Erê, û qotîyeke

polikan.”

Zilam li pişt xwe zivirî û ji ser qatik qotîyeke polikan daxist.

Wê ji Sam re got; “Patrick îro pir westiyayî û me biryar da, îşev em naxwazin li derve şivê bixwin.” Û domand; “Tu dizanî em her carê rojê pêncşeman diçin li derve şivê dixwin û Patrick vê êvarê bi ser mal de girtiye lê ma çî fêde fêkiyê me li mal nîn e.”

Sam got; “Ma ka goştê te heye Xwişka Maloney?”

Maloney got; “Na weleh, ne lazim e mala te ava, goştê min heye. Min polekî gelek xweş e berxan ji dîpfirîzê derxistiye.”

Sam hinekî şaşmayî got; “Waa..”

Maloney got, “Sam, bi Xwedê ez nizamim gelo goştê qeşagirti kelek, an ne kelek e, lê dîsa ez ê vê neqlê biceribînim. Ma tu dibêji dê zû bikele?”

Sam got; “Ê weleh, bi ya min ferq nake. Ma hûn patatên Idaho dixwazin?”

Wê bersiv da got; “Ha erê weleh ew baş in. Kîloyekê ji wan jî.”

Zilamê dikandar serê xwe bi alîkî ve xwar kir û bi dilnêrmî li wê nihêrî û got; “Tişteki din lazim e? Piştî, hûn ê çî bikin? Îcar piştî xwarinê tu yê çî bidî Patrick!”

Wê bersiv da got; “Baş e, ma tu çî difikirî Sam?”

Zilam di derûdora dezgehê xwe de çû û hat got; “Qetek keka bipenêr çawan e? Ez dizanim ku ew jê hez dike.”

Wê got; “Bêşik,” û domand, “Ew jê hez dike.”

Wexta fêkî hat pêçandin û wê perê xwe dan, bişirînek li ser rûye wê hebû û got; “Spas dikim Sam, şeva te bimîne xweş.”

Sam bersiv da got; “Ser çawan Xwişka Maloney, şev baş û spas xweş.”

Û niha, gava ew bi lez vedigerî ji xwe re digot. Tiştê aniha bike, ew ê vegere li mêrê xwe yê li mal ku li benda şivê ye; û ji ber ku feqîro nû ji kar hatiye û gelek westiyaye, divê heta ji wê bê şiveke gelek xweş çêbike. Gava wê da devê derî, dê tu tiştê ne normal, an trajîk, an berbat nebîne, piştî dê ji ber xwe ve bi hebitîna tirsê, bilerize û xwe dinomîno bike. Ha wilo, wê hay ji tişteki nîn e. Ew tenê bi fêkî diçe mal. Mary Maloney êvara pêncşemê di destan de kisikên fêkî diçe mal ji bo ku ji merê xwe re şivê çêbike.

Mary Maloney ev tişt ji xwe re digotin. Haya wê ji tişteki nîn bû. Her tişt bi rastî û sirûştî divê were kirin. Jixwe êdî ne hewceyî tişteki din e.

Werhasil, gava ew ji dêriyê dawî ket hundirê mutbexê, bişirînek li ser rûyê wê û himehima stranekê lê palan bû.

Wê bang kir; "Patrîck!" û domand; "Tu çawan î, ruhê min?"

Wê kîsikên di destê xwe de danîn ser maseyê û çû hundirê odeyê; û gava ew li erdê pîjbûyî, paqên wî kişiyayî û çengekî wî di bin laşê wî de tewiyayî dît, bi rastî ev ji bo wê wek şoqê bû. Hemû evîniyên berê û bihevrebûnên wan herikîn di nava wê de û ber bi wî ve beziya, li ber serê wî li ser kaban rûnişt û bi qîrîneke dilşewat giriya. A sirûştî herî hêsan e. Ne hewceyî tişteki din e.

Piştî çend deqeyan ew rabû ser xwe çû ber bi telefonê ve.

Wê bi nimroya qereqolê dizanî, gava zîlamê li wî serî dinê telefonê bersiv da, ew giriya û got; "Zû! Bi lez werin! Patrick mir!"

Zilêm got; "Ew kî ye diaxive?"

Wê got; "Maloney. Xanima Patrick Maloney."

Zilêm got; "We got çi? Patrick Maloney mir?"

Wê bi îskeîsk got; "Ez dibêhm hema." û domand; "Ew li ser erdê pij bûye û ez dibêhm hema miriye."

Zilêm got; "Ha va, em tên."

Erebeyek gelek xurt hat û gava wê deriyê xênî vekir du polis ketin hundir. Wê her du polis nas dikirin- wê ew ji derûdorê nas dikirin- û ew ket li ser kursî rûnişt, piştî çû li gel êdin ku jê re digotin O'Malley, li ser kaban li meytê erdê dinihêrî.

Mary Maloney bi qîrîn got; "Ma ew miriye?"

Polis got; "Erê weleh. Ev çi qewimiye?"

Wê bi hindikayî bûyer ji wan re got ku ew çûbû dikanê û gava ew vegeriya ew li erdê pîjbûyî dît. Gava ew digiriya û diaxivî, Noonan mêze kir û li ser birîna serê zîlamê mirî cuda hinek xwîna ziwa dît. Ew şanî O'Malleyê ku bilez ji nişka ve ber bi telefone re rabû, kir.

Piştî kêliyêkê zîlamên din jî ketin hundirê xênî. Pêşî bijîşkek, pişt re du dedektîfên ku Mary Maloney yekî ji wan nas dikir. Pişt re polisekî wênekêş hat çend wêne kişand û zîlamêkî dewsa tiliyan digirt karê xwe kir.

Dedektîfan gelek pirs jê pirsîn û gelek pistepist û galegal hatin kirin li ber serê zîlamê kuştî. Lê ew bi dilnêrmî ber bi wê ve dihatin. Wê dîsa bûyer ji serî ve ji wan re digot. Gava Patrîck hat malê, wê tenteneyê xwe çêdikir û ew gelek westiyayî bû. Ji ber ku westiyayî bû nedixwest em îşev ji bo şîvê derkevin. Wê ji wan re digot çawan goşt avetiye firnê -"ha wa ye li wir e, dipijê"- û çawan xwe bi lez herikandiye dikanê ku hinek fêkî bikire û gava vegeriya ew li erdê direjkiyî ditiye...

Detektîfekî pirsî; "Kijan dikan?"

Wê ji dedektîf re got û ew li xwe zivirî di guhê hevalê xwe de kir pistepist û hevalê dedektîf xwe avêt derve, kolanê. Piştî çaryekeke bi çend kaxizên notan vegeriya. Pistepista nav dedektîfan zêdetir bû. Di nav îskeîska xwe de wê peyivînên bi pistepistî bihîstin-"...bêşik normal dilive... gelek kêfxweş... dixwest şîveke xweş bidê wî.. polik.. keka penêrî... naxwe qet ne ew e.."

Piştî bistekê, wênekêş û bijîşk derketin çûn û du zîlam hatin laşê Patrick li darbestê kirin. Piştî zîlamê ku dewsen tiliyan digire bi dûr ket. Her du dedektîf man û du polis jî neçûn. Heya ji wan dihat bi rûyekî dilnêrm ber bi Maloney ve dihatin. Jack Noonan pirsî; "ku deverê dixwazî biçî; mala xwîşka wê be, an ger bixwazî îşev ew dikare wê bibe li gel jina xwe".

Wê got; "Na. Ez bawer nakim ku ez îşev bikaribim herim tu deverî."

Ew li gel bimana ku heyra ew hinekî li xwe were, baştir bibe. Ew bi rastî xwe ne baş hîs dike. Piştî Jack Noonan pirsî; "Ma tu hinekî li ser nivînan xwe dirêj nakî, tu yê baştir bibî."

Wê got; "Na. Ez dixwazim hinekî din li vir, li ser kursî bim. Piştî kêliyêkê din ku ez baştir bûm, ez ê rabim."

Werhasil, wan ew li wir hişt û vegeriyan ser karê xwe, li nava xênî digeriyan. Carinan pirsine din ji wê dikirin. Carinan jî Jack Noonan bi dilnêrmî pê re diaxivî. Mêrê wê, Noonan jê re gotibû, dê bi tişteki giran ku wek doqikekî hesini ji pişt ve li serî xistine hatiye kuştin. Ew li çekê digeriyan. Çêdibe kujer çek bi xwe re biribe, lê li aliyê din çê ye avetibe deverêke dûr, an li deverêkê veşartibe.

Wî got; "Ji pêşî ve gotine. Çekê bibînin, hûn ê qesas zêft bikin."

Pişt re, dedektîfek hat li cem wê rûnişt û pirsî; “Ma gelo tişteki ku tu dizanî wek çek were bikaranîn li mal heye, an na? Ma hûn dixwazin li derûdorê binihêrin gelo tişteki windayî heye? Wek vazo, an tişteki dirêji metalî û giran..”

Wê bersiv da; “Tu vazoyên me yê metalî û giran nîn in.”

“An tefşo?”

Wê hew dizanî gelo tefşoyê wan heye, an nîn e. Lê hebe ji divê li garajê be.

Lêgerînê domand. Wê dizanî ku polisên din li hewşê li derûdora xênî digerin. Wê dengê piyen wan, ên li ser zixuran dimeşin dikir û carinan şewqa fanosan ku li perdeyan diket, didit. Hêdî hêdî dibû dereng, nêzikê saet nehan. Çar zilam yek bi yek li odeyan digeriyan. Lê tişteki weke serê derziyê rast bi dest nexistin.

Mary Maloney got; “Jack, ji kerema xwe re tu dikarî vexwarinekê bidî min? ”

Jack got; “Belê çawa nikarim! Ma tu qala vê wiskiye dikî?”

Mary Maloney got; “Erê ji kerema xwe re. Lê tenê peşek bes e. Ez dibêm, ez ê hinekî baştir bibim.”

Wî rahişt qedeha wê.

Mary Maloney got; “Ma tu çima hinekî ji xwe re danagiri? Tu ji êvara Xwedê ve kerixî yî. Ez bi ser te bigerim tu ji xwe re jî dagirî. Te gelek alikariya min kir.”

Jack bersiv da got; “Baş e. A rastî, qedexe ye, lê ez ê qurtekê vexwim, ez ê baştir bixebitim.”

Yeko yeko, yê din jî hatin hundir û bi aramî qurtek li wiskiye dan. Li derûdorê, bi vexwarina di destên xwe de rawestiyabûn. Noonan ber bi mutbexê ve çû, bi lez vegehiya û got; “Binihêr, Xanima Maloney. Ma hûn dizanin firneya we hê jî pêketî ye û hê jî goşt tê de ye.”

Maloney qirîya got; “Peppû li min qirikê!”

Noonan got; “A baş ku ez firnê ji we re bitefinim.”

Maloney got; “Spas dikim, Jack. Ma tu yê bitefinî?”

Gava polis cara duyemîn vegehiyan, wê bi çavên bel û hêsir tijî lê mêze kir û got; “Jack Noonan,”

Jack Noonan got; “Fermo?”

Mary Maloney got; “Ez ê ricayeke biçûk ji te bikim, tu û hevalên din.”

Jack Noonan got; “Em xwe biceribînin, heçko tişteki ji destên me were!”

Mary Maloney got; “Baş e. Niha hûn hemû, yên li vir, hevalên herî baş ên Patrîckê hêja ne û ji êvara Xwedê ve dixebitin da qesasê wî zeft bikin. Ez dizanim Patrick dê tu caran min nebexşîne ku ez li mala wî we bi mēvandariyeke baş neezimînim. Hûn hemû birçî bûne û di ser çaxê şivan re gelek wext derbas bûye û Xwedêyo tu cihê wî bihuşt bikî. Ma çima hûn polê berxê di firnê de çêbûye naxwin? Niha nû çêbûye.”

Jack Noonan got; “Hûn mitaleyan nekin!”

Mary Maloney got; “Ji kerema xwe re bixwin. Bi rastî ku hûn bixwin, dê gelek kêfa min were. Piştîrê disa hûn dikarin li karê xwe vegehin”

Ev tişteki gelek baş bû ji bo wan her çar polisan, lê bi rastî jî gelek birçî bûbûn. Dawî berê xwe dan mutbexê alikariya hev kirin. Jinik li devereke rawestiya, da bikaribe dengên wan ji mutbexê bike. Dengên wan stûr û bigirêz bû, ji ber ku gava dişolifîn devên wan ji goşt dagirtî bûn. Ji polisan yekî digot; “Ma tu hinekî din dixwazî, Char-lie?”

Charlie got; “Na bes e ez dibêm em xelas nekin çêtir e.”

“Kuro lawo ma ez çi. Wê got xelas bikin... Wê ji me rica kir.”

Charlie got; “Ê baş e, naxwe ka hinekî din.”

Yekî ji wan got; “Ev çi tişteki zilomatî ye bi serê feqîrê Patrîck ve anîne?”

“Bijîşk dibêje qoqê serê wî bi balyoz piçik û parî bûye.”

“Loma ez dibêjim divê ditin hêsan be.”

“Bi temamî min ê çi bigota?”

“Kê wilo kiribe, dê nikaribe li cem xwe vî tiştî veşêre.”

Yekî ji wan bi keservedanê got; “Bi ya min ev hemû tiştên li ser diaxivin kelevajî ne.”

“Ki dizane belkî aha va ye, li ber devê me ye, ma tu dibê çi Jack?”

Û li odeya din Mary Maloney di ber xwe de dikeniya.

Wergara ji îngilîzî: Aydin Rengin
rengiaydin@hotmail.com

ÊŞ

Şevger ÇIYA

Serê sibê ji şeveke bêxew û tije fikar mirov çiqas westiyayî radibe. Her tişt diguhere di çavên mirov de; roj, kes, pirtûk hema bibêj alavên nava malê ji cuda dibin, diguherin. Her derê laşê wî çiqas diêşê. Oy Xwedê ev çi şev bûn, çawan nediqediyan, nedibihuriyan saet. Heta mele bang da, di nav çî xeyalan de çû û hat. Kêlikek mabû bigirî. Îşev fêr kir ku di nav malbatê de êdî nikare bidomine. Îşev heta sibê di nav nivînan de xwe gevizand. Îca hat bira wî di helbestekê de helbestvan digot: ‘Evîndar, araqvexwir û tolazên bajêr li bendê ne’ berevajiyê vê yekê ew li benda qedandina şevê bûn, ne li benda hatina wê. Gelo ev çi rewş bûn, ew ê çawan rizgar bibûna? Malbatê ji fêr kiribû ku tiştêk qewimiye, jê dipirsiyan lê wî digot tiştêk nebûye. Wî jî rasterast bi bersivê nizanibû, tenê êşêk bêhempa di hundirê wî de ew diêşand. Car caran nefesa wî diket hundir, dilê wî bêrîtm lê dixistin û nedixwest tiştêk bike; ne guhdarkirina stranên, ne xwendina romanên ne ji pirtûkên zanîngehê. Car caran dilê wî dihate guvaştin, çavên wî tije girî dibûn. Wa ye bû sê roj e ku bi dilekî rihet tiştêk nexwariye. Dilê wî diqelibe, vereşîna wî tê wexta şivê dibîne, ji bo ku neyê fêmkirin bi zorê du sê loqmeyan dixwe û heke tiştêk ji bo vexwarinê hebe giran giran vedixwe ku kes pê nehese hindik xwariye û dîsa nebe muhatabê pirsên bê serî û binî.

Wê rojê ji weke hemû rojên dawiyê, beriya her kesî rabûbû. Li saetê nihêrî hê du saet mabûn ji hevdişînê re, hinekî di nav malê de çû û hat, dilê wî ditengizî, diviyabû ku ji mal derketa, lewre yek ji xew rabûya ew ê sedema çûyina derve ya vê saeta zû çawa rave bikira.

Ji malê hêdika derket. Derî li pey xwe bédeng kişand, xist şûna wî. Îca bi rê ket, çiqas hez dikir ku bi rê de biçûya, her ku dimeşîya ji derd û xemên xwe rizgar dibû, diket nav xeyalan. Ji biçûkahiya wî ve; li pey hemû têkçûyînên xwe, wexta jiyan tije derd bibûya, dema dilzîz bibûya, xwe davêr nav kolan û sûkên bajêr û heta taqeta wî ya rêveçûnê hebûya dimeşîya. Di van kêlikan de ji her tiştî azad dibû, xwe ji bîr dikir, diket nav xeyalan, gelo ev xeyal ji tunebûna dê çi bikira? Çawan xwe aş bikira? Di vê demê de axaftineke hevalekî wî hat bira wî “Di vê dinyayê de her tişt têgihîştin e. Lewre her tişt sînî ye. Heke em nepejirînin dugel ne dugel e, mamoste ne mamoste ye, doxtor ne doxtor e, heta bêje em

bêjin na, ol ne ol e, pêxember ne pêxember e. Navenda her tiştî pejirandinên me ne. Berevajiyê vê yekê her pergala xwe bédawî, xwezayî nişan dide, mirovan ji bêrûmet, bêqîmet, bêhêz dide nişandan. Mirovan dide hizirandin ku her tişt jixwe bi xwezayî ji derveyî mirov heye. Wê gavê mirov xwe bêhêz his dike û teslimî pergalê dibe. Nîrxên ku niha jiyanê bi me watedar dikin hemû teqez sînî ne. Şaristaniya mirovahiyê bixwe derewek bédawî ye. Her tişt derew e, em weke zarokan ji xwe re dileyîzin.”

Wê demê nehat hişê wî ku bipirse, gelo hest, ew ji derew in an sînî ne? Heke derew in çawan di berhemên herî kevn de, di mitolojiyê de mijara sereke evîn e. Beriya vê bûyerê baweriya wî bi evînê tune bû. Digot di vê dema nûjen de êdî evîn ne guncaw e. Çimkî têkiliyên mirovan, keç û xortan pêş de çûne. Xortek gava karibe rojê bi saetan wext bi keçikekê re derbas bike, dê çawa bibe Mem? Gelo xort dê nebîne ku keçik ji wek wî mirovek e; hestên wî, pêdiviyên wî, tirsên wî, pirsgrêken wî hene. Ne pîroz e. Cihê ku pîrozî tune be dê çawa evîn hebe? Di demên berê de keç û xort ji hev dûr bûn, ev yek dibû sedema pîroziyê, lewre xeyal her dem pîroz û bêqisûr in. Di vê serdemê de êdî pîrozî ji holê rabûye, çimkî xeyal ji holê rabûne. Evîn ji ne guncaw e. Pêşbiniyên wî her gav şaş bûn, vê carê ji şaş derketin. Ew niha Memekî bê Zîn, di kolanên de li hêviya wextderbasbûyînê bû.

Wext hat, hevalê wî yê dil û can, hevalê ku her keserên hev parve kirine, li hemberî hev bûn. Gelo mirov çiqas bêhêz dibe wexta evîndar e, çiqas muhtacê yekî/ê ye ku aqil bide mirov. Çimkî evîndarî bêbiryarbûn e, alozî ye. Piştî xêrhatinê hevalê wî fêr kir ku tiştêk qewimiye, lê wî destûr neda ku hevalê wî bipirse, dest bi axaftinê kir.

Hevalo, ez nizanim çi hat serê min, ez hew dikarim li ber xwe bidim. Her tişt, hema bêje çi tê aqilê te hemû li ber çavên min reş û tarî ne, bêwate ne. Fikr û raman di nav heşê min de, êşeke bêhempa di nav dilê min de min dihelînin. Bawer bike ev bû sê roj in çûyina her kêlikekê dijmêrim, wext bûye dijminê min ê herî xedar. Ne bi şevan raketin, ne bi rojan bihurîna demê pêkan e. Ez naxwazim bi kesekî/ê re biavxim, ev raman ji wilo min diqedînin nayê qalkirin. Xwezî êşêk ji vê êşê xedartir hebûya ku min xwe ji vê êşê xilas bikira. Îşkenceyeke bêhempa. Ez têgihîştim, ew e ne wisa?

Êrê birako, hiç behs meke. Evîneke bîlasebeb; min tenê du sê caran ew dîtiye. Dîtina dawî sê meh berê bû. Ji wê rojê vir de tu têkiliya min nîn e. Bi rastî min agahî digirtin der heqê wê de, lê ez ew qas pê mijûl nedibûm. Ez wê baş nas nakim, wekî ku tu ji dizanî tenê çend caran hatibû hevdişîna me û min ew li wir nas kiribû.

Çima niha çi qewimî ku tu ji nişka ve ketî ve

rewşê?

Sê roj beriya niha, ez pêrgî Gulistanê bûm. Em li derekê rûniştin û hinekî peyivîn. Ew hevala Gulistanê ya nêzîktirîn e. Di nav xeberan de got ku ew ji hatiye bajêr û dilê wê û kurikekî li ser hev heye. Esmen çawan li ser serê min rûnişt? Ez çawa têk çûm tu nizanî! Min çawa sohbet qedand, xwe avêt malê ez nizamim. Ez vereşiyam. Êşek ket serê min, zikê min wisa guvîşî, dilê min qelibî û ez vereşiyam... Girîn di qirikê de asê ma. Ji min re nivîn raxistin, ez ketim navê. Şevêk wilo dogehî, tije êş, bêxew çiqas mirov hildiweşîne. Ya ku hatibû serê min, mirina min bû. Tiştê ku herî zêde ez diêşandim fikra bûyîna wê ya bi yekî din re bû. Ew destên wê, çavên wê, dengê wê, porê wê, her tişt dihat ber çavên min. Ew peyivîna wê ya hêdî, bixwebawer. Di wê kêlikê de min fêhm kir ku ya ku ez jê hez dikim ne ew e. Xeyalên ku min afirandibûn, min ji wan hez dikir. Min ew xeyal di bedena wê de bi can û xwîn kiribû.

Gelo evîndarî bê pîrozî dibe? Na! Ew dûrî min bû, li navenda welêt bû. Navê wê bi kurdî bû. Ew bi zimanê min, bi zimanê hestên min, bi kurdî dipeyîvî. Hestên min, xeyalên min, welatê min, hemû di kesayetiya wê de berhev bûbûn. An jî min ew berhev kiribûn. Hevalo, tu nizanî jimartina kêlikan çiqas dijwar e. Di rewşên wiha tengêzar de dem nabihure, dibe dijminê mirov ê herî xedar. Hêviya çûyîna saetan hesteke çawan e tu dizanî? Ez dizanim ev tiştêkî bê sedem e, keçik ez nexapandim, sozê min û wê jî tune bû, heta haya wê jî ji min nîn e niha. Lê wexta hest radibin, êdî aqil hew dikare hevsar di destê xwe de bigire. Tu ji dizanî feylesofê me, beriya sêsed salan gotibû: 'divê her tim hevsarê hestan di destê aqil de be.' Yê min berevajiyê wê yekê bû. Ez dizanim ku ev hemû tişt bêmantiq in, lê ez nikarim pêşiya wan bigirim. Di nava van sê rojên dawîn de, hema bibêje rojê deh caran ez belawela bûme. Di nava rojê de qasê niv saetê ez ji bir dikim, bi karekî re mijûl dibim, ji nişka ve dîsa tê bîra min. Weke ku tu bombeyekê bikî nav hinavê min û biteqînî. Bifikir rojê herî kêmhêr deh caran heman tişt pêk tê. Min çareseriyek nedît, ez êdî nema dikarim biramim jî, gelo çima evîn ev qas mirov têk dibe?

Sedem çi ye tu dizanî, sedem pîrozî ye. Mirov pîroziyê çawa ji holê radike? Bersiv: nasandin e. Heke tu wê nas bikî, bawer bike, tu yê bibînî ew ne pîroz e. Ew ne keçika xeyalên te ye. Ev evîna te, evîna wê nîn e. Wekî ku te jî got ev evîna xeyalên te ye. Tu yê çawan xwe rizgar bikî dizanî, divê tu ji bir bikî. Keynî wê tu çare nîn e. Heke derfet hebûna te ew nas bikira, jixwe dê evîna te biqediya, lewre dê te bidiya ku ew ne kesa ku tu difikirî ye. Tenê rêyek heye ew jî jibîrkerin e. Ev pêvajoyeke tije êş û xem e. Divê tu hînî vê êşê bibî.

Hînbûna êşê! Gelo mirov hînî êşê dibe yan mirov rizgar dibe, ji êşê difilite? Gelo nexweşê pençeşêre hînî êşa nexweşiyê dibin? An jî ber êşê bêriya mirinê dikin? Mirov carna dikare xeyalên xwe, evîna xwe ji bir dike? Di nav kolanan de digeriya; bêwate, bêarmanc, tenê. Dermanê wî bi hevalê wî re jî tune bû. Ji xwe re digot: sedemê êşa min evîna ku min ew afirand nîn e? Ez ê çawa xwe ji wê bifilitinim, ew di nav dilê min de, di nav heşê min de nîn e? Pêvajoyek... Baş e, pêvajo çend roj e: salek, deh sal, an deh roj? Van sê rojên dawîn çawan deqe bi deqe jiyan li min herimî. Mirov digot qey; yekê sêhr kir û hemû aramiya jiyanê xira bû.

Armanc, têgeh, têkilî, cihan her tişt yeko yeko serobino bû. Ez bi demê re şivtazî rû bi rû mam. Îşkenceya herî xirab, jana bêderman di laşê min de kozik veda. Ev sê roj berdêla jiyanekê bûn. Ne ku sê roj, êdî nikarim sê saetan jî bi vê êşê bijim. Êşêke ku rojê deh caran min dukuje û ji nû ve vedijîne. Xwedê jî di dojecha xwe de mirovan wiha ceza nake? Mirov di dogehê de jî deqe bi deqe kêlik bi kêlik nayên şewitandin? Li wê derê jî mirin tune, lê êş? Ez niha di wê dojecha Xwedê de dijim. Ez ê li ber xwe bidim! Çima? Ji bo çi ez ê li ber xwe bidim? Rêyek ji bo rizgarbûnê heye û ji aliyê din ve berxwedana bêsedem, tije êş. Ez dixwazim rizgar bibim.

Êdî biryar hatibû girtin. Li ser rûyê kenek, di çavên wî de aramî peyde bûbû. Dilê bibiryar hinceta şabûnê ye. Mirov di kîjan rewşê de be bila bibe, heke mirov bibiryar be tu fikar di heşê mirov de namîne. Ev biryar ji bo mirov nebaş be ji rewş naguhêre. Êdî nema demê li hemberî wî şer dikir. Piştî aloziyan wexta aramî bê mirov êdî nema dixwaze bifikire, bê raman mirov dikare bi saetan bigere.

Wext êdî bûbû paşiya şevê, berê xwe da malê. Deriyê malê bi mifteyê hêdî vekir, mirov digot qey dikeve diziyê, nedixwest deng derkeve. Çira hemû xarkirî bûn, her kes raketî bû. Ev ji bo wî pir baş bû, çû dest û serçavê xwe şûşt, di eynikê de cara dawîn li xwe nihêrî. Destên wî dilerizîn, çavên xwe girt, qasê çar pênc deqeyan ponijî. Ji nişka ve çû odeya biçûk, li tiştêkî digeriya, di cî de dît û çû odeya tarî. Her der tarî bû, her çar aliyên odeyê girtî bûn, tu şibak jî tune bûn. Ev ode weke kîlerê bi kar dianîn. Bêhneke giran ketibû odeyê. Li ser çongên xwe rûnişt, çavên xwe girt, hebû niv saetî wiha li wê derê sekinî. Di nav fikr û ramanan de çû û hat, paşê ji xwe re got; 'Heke ez niha vi karî nekim, heta paşiya temenê xwe ez ê nikaribim bikim.' Ji fikar û ramanan xwe zû xelas kir. Destê xwe avêt berîka xwe, dengêkî di nav malê de olan da. Diya wî kir qîrîn.

sevgerciya@gmail.com

BINGEHÊN NÛJENIYA WÊJEYA KURDÎ

Amadekar:
Serwet DENÎZ

Nûjeniya Me
Jan DOST

Wêjeya Kurdî ya Li Sirgûniyê Rengekî Nostaljik Girtiye
Dilawer ZERAQ

Çirok Pêşverû Ye
Ronî WAR

Destpêka Nûjeniya Kurdî Ehmedê Xanî ye
Hevpeyvîn: Serwet DENÎZ

.....
Ezîzê CEWO

Wêjeya Kurdî
Behlûl ZELAL

Wek ku me di hejmara berê de diyar kiribû mijara dosyeya vê hejmara me “Bingehên Nûjeniya Wêjeya Kurdî” ye. Me çima ev mijar girt dest? Xwenasîn bi xwezanîne pêkan e. Em çiqasî bi xwe bizanibin em ê ew qasî xwe nas bikin. Ku mirov xwe baş nas neke mirov nikare li hember dem, bûyer û diyardeyan bibe xwediyê helwest û sekneke rast.

Gava ku mirov bi giştî qala nûjeniyê bike, mirov ê bibîne ku di encama pêşketinê aborî, çandî, felsefî û siyasi de derketiye holê. Dîsa li her qada civakî, çandî û hunerî bandor kiriye, bi xwe re gelek guherîn derxistiye holê. Mirov dikare van guherînan wek pêvajoyekê jî binirxîne. Her çiqas vê pêvajoyê li rojava dest pê kiribe jî, gav bi gav li deverên dûr û nêz jî belav bûye. Roj hatiye gihîştîye welatê me yan

jî welatê serdestên me. Bi vî awayî em jî ketine bin bandora bayê nûjeniyê. Lê bi baweriya me ev pêvajo jî bo kurdan zêde ne zelal e. Em hîna baş nizanin ew ba bi çi rengî gihîşt ber deriyê me. Bi taybetî jî li ser wêjeya me bandoreke çawa hişt. Ji ber vê yekê me pêwîstî bi vekolana vê mijarê dît.

Bêguman beriya me jî gelek kes li ser vê mijarê sekinîne. Kêm zêde agahî dane. Lê gelek hêlên ku divê bîn vekolandin hene. Tiştê ku em niha dizanin; rewşenbîriya kurdî li derveyî welat dest pê kiriye. Gelek çeşnên nû li wêjeya kurdî zêde bûne. Derfetên wek kovar û rojname bi dest ketine. Yên ku ev kar kirine bi piranî kesên sirgûnbûyî bûn. Li Stenbol û derên din xwendibûn. Bi kinasî li paytextên împetoriyên serdest bûn. Ha li vir

divê em bersiva vê pirsê bidin; gelo di heman demê de rewşa gel û welat çawa bû? mirov dikare çend pirsên din jî lê zêde bike. Ev xebat çiqasî gihîştin gel, bûn malê gel? Di nav gel de daxwaza nûjeniyê hebû an na? Hesenpûr bandora li Rûsyayê tevgera 1905'an, li Îranê 1906-11'an li Tirkîyeyê ya 1908'an destnîşan dike. Bi rastî jî van şoreşên gelên cîran bandoreke çawa li ser rewşenbîriya me hiştiye? Ev yek divê bi awayekî taybet bê vekolandin. Dîsa Hesenpûr qala bandora dibistanên fermî yên ku wê demê hebûne dike, li kîjan bajarî çend dibistan hene daye diyarkirin. Bi baweriya min bandora van dibistanan bi awayê ku ew diyar dike çênebûye. Lê divê bê vekolandin.

Mijareke din a ku divê bê vekolandin jî ev e; di gelek çavkaniyan de tê gotin ku Mîr Mihemed û Mîr Bedirxan ji bo xwendinê xwendekar şandine Ewropayê. Lê heman çavkanî qal nakin ka ku ev hewldan çawa bi dawî bûne, kesên ku hatine şandin kî bûne, pê çi bûne? Bandoreke wan li ser rewşenbîriya kurdan çêbûye an na? Ev tev mijarên lêkolînê ne. Ev tiştên ku tên qalkirin rast bin, em ê bikaribin bibêjin; serkêşê vî karî ew in. Dîsa ku rast be, em ê bikaribin bibêjin; mîrnişîniyên kurdan pêdiviya guherîn û nûjeniyê hîs kirine û heldane ku rewşa civaka kurdan biguherînin.

Bi baweriya me zelalkirina van mijaran jî bo rewşenbîrî û wêjeya kurdî pêdiviyeke girîng e. Lê bi qasî ku me lêkola û ji derûdorê pirsî jî bo zelalkirina vê mijarê pêwîstî bi lêkolînên hîn berfirehtir û demeke hîn dirêjtir heye. Di rewşa heyî de em bi tenê dikarin li ser hinek beşan bisekinin. Ji xwe nivîskarên me yên ku bi nivîsên xwe beşdarî dosyayê bûne jî ev yek destnîşan kirine. Tevî ku em di serdema ragihandinê de dijîn jî û li gor berê derfetên bidestxistina agahîyan zêdetir in jî, gelek asteng li pêşîya me kurdan hene. Belge û çavkanî kêmtir in. Ev belge li gelek deverên cîhanê belav bûne. Dîsa zimanên ku pê hatine nivîsîn cihê ne, yên ku bi kurdî ne jî, bi alfabeyên cihê hatine nivîsandin. Xebatên ku hatine kirin zêde ne zanistî ne (Di vê mijarê de min berê jî nivîsî bû lê ez ê dîsa jî qal bikim; niha çend berhemên bi navê 'antoloji' û 'dîroka wêjeyê' li ber dest hene, lê çiqas jî kedeke giranbûha jî bo wan hatibe dayîn jî bi rastî jî iro çavkaniyên pêbawer nîn in). Vana tev astengiyan li pêşîya zelalkirina rewşa

nûjeniya wêjeya kurdî ne. Astengiyeke din jî rewşa kurdan a perçebûyî ye. Haya perçeyekî jî yê din tune.

Di amadekirina vê dosyeyê de me fêhm kir ku ji bo zelalkirina vê mijarê pêdivî bi gelek dîsîplînan heye. Wek civaknasî, zanista aboriyê, dîrok, psikolojiya civakî û hwd. Ku rewşa civakê jî van hêlan ve bê zelalkirin wê "Nûjeniya Wêjeya Kurdî" baştir zelal bibe û bê fêmkirin.

Ji bo ku armanca dosyeya me an jî hewldanên me yên di vê mijarê de bîn fêmkirin, em dixwazin tiştekî din jî bibêjin; em li "çawa"yê digerin ne li "çima"yê. Dibe ku pêdivî bi vekolandina wê jî hebe lê niha ew ne mijara me ye. Em ê nebêjin; çima filankesê me di bin bandora bêvankesê cîranan de maye? Bûye û çûye. Ji bo me pirseke watedar nîn e. Lê ji bo ku em iro bi derûdora xwe re têkiliyeke rast deynin, divê em bi "çawaniyê" bizanibin. Ya din jî ku mirov zêde bi dû "çima"yê bikeve, dibe ku mirov bikeve nav çewtiyên nû. Lewre pirsê "çima" xwedî rengê subjektîv e. Di vir de hest li pêş in. Ku hest li pêş bin ihtimala çewtiyan zêdetir e.

Rastiya çand û wêjeyê bi xwe jî rê li ber pirsê "çima" digire. Her civak di bin bandora cîranên xwe de dimîne û bandorê li wan dike. Tu hêz nikare pêşiyê li vê yekê bigire. Tu dîwar nikarin vê bandorê asteng bikin. Di vê danûstendinê de ya girîng parastina reng û xweseriya xwe ye. Tiştên ku ji çandên din tên girtin di nav çanda xwe de bimehînin û rengê xwe bidîyê tu pirsgrêk nîn e. Di vê hejmara me de li ser navên mehan nivîsek heye. Yek ji van mehan "sebat" e. Tê zanîn ku sebat (şûbat) navê xwedayekî asûriyan e. Bi vî navî bajêrek jî hatiye avakirin û navê hinek qralên wan jî şûbat e. Lê di çanda me de "sebat" jinebiyeke mîrmirî ye. Kê jî kê girtiye em iro nizanin. Lê em dibînin heman hêmanê di du çandên cihê de bi du rengên cihê jî xwe re cî dîtiye. Bandorkirin û bandorbûn wiha xweser bin, tu pirsgrêk tune. Lê ku civakek bikeve bin **nîrê ramanî** yê civakeke din, pirsgrêk e û xetere ye. Nêzikahiya me ya vê mijarê ev e.

Her çiqas dosyeya ku hatiye pê, ne li gora dilê me be û hinek hêlên wê kêmtir mabin jî em bawer in wê jî gelek pirsan re bûbe bersiv.

Serwet DENÎZ

Nûjeniya Me

Jan DOST

Nûjenî di bingeha xwe ya ferhengî de tê wateya tevgera li nava her tiştên nû. Di serî de jenandina penbo (pemî, pembo) û jenandina avê tê bîra mirov dema ku nûjenî tê gotin. Weke wê jenandinê kurdan ji di destpêka sedsala bîstan de tevgereke nûjeniyê li dar xistin. Lê ka em binêrin ew çawa bû û li ser kîjan bingehan hate avakirin!!

Ew bi xwe nûjeniyê weke têgeh û her weha mîna daxistina vê têgehê ya li nava civakê û praktîzekirina wê ya di her warê jiyânê de li Ewrûpayê li pê tevgera Renaissancê (Ronesans) dest pê kir. Li wir êdî nûjenî bûbû pêwistiyeke felsefîk û civakî û dinî û di her warên din de. Jiyana ku bi saya sermayedaran û daxwaza firehkirina bazarê û bi saya filosofan û zanyaran serobin bûbû, bandora xwe ya mezin li wêjeyê jî kir. Ez dibêjim wêjê ji ber ku wa diyar e ku mebest ji nûjeniyê di vê dosyayê de (ya ku Kovara W li ber xwendevanên xwe radixîne) tenê wêjê ye! Cureyên nû ji edebiyatê derketin holê. Qalibên berê şikestin. Norm û form êdî nema têra wêjevanan kirin û di serî de romanê serê xwe hilda mîna babeteke nûzayî di wêjeyê de ku bi bihurîna çend salan re rê li ber helbestê û taca pîroz ji serê wê danî. Roman mîna berhema civaka nûjenkirî yan di rêya nûjeniyê de bû, bersiva guherînê bingeîn ên di civakên Ewrûpayê de bû û bersiveke ku bi rastî karibû bibe neynika nûjeniyê bû.

Bi bawerîya min nûjeniya me hiç naşibe nûjeniya ewrûpiyan. Ya me di bin bandora

nûjeniya cîranan û rojavayê de dest pê kir, ya me ji bersivê wêdetir teqlid û lasayîkirin bû. Ango nûjeniya me ne nûjeniyêke xweser bû û ne jî pêdiviyêke wê ya girêdayî guherînê civakê yên mezin hebû.

Sebebên vê jî gelek in û di serî de qutbûnê mezin û qonaxên bédengiyê di pêvajoya wêjeyî ya kurdî de. Projeyên mezin ên ku di nava kurdan de li dar diketin zû têk diçûn û li ser wan nedihate avakirin. Wek mînak projeya Ehmedê Xanî. Ez bi xwe Ehmedê Xanî mîna keke qenc ji bo hewldanên nûjenkirinê dibînim. Wî xwest zimanê kurdî ji xeleta wêjeyê rizgar bike û kurdî bike zimanê jiyanê bi her aliyên xwe ve. Wî xwest kurdî bike zimanê ola islamê jî. Yanî wî şoreşek di balê de hebû ku dixwest bi alîkariya desthilatdariya kurdî (ya nezan û têngihiştî) bibe serî.

Piştî wî bi nêzikî dused salî mele Mehmûdê Bayezîdî jî hat û gaveke din ji bo nûjeniyê avêt. Yekem kes bû ku zimanê kurdî ji qada helbestê kişande qada pexşanê jî û pêwistiya wergerê û danheva folklorê jî nas kiribû (em alîkariya Aleksander Jaba ji bir nakin). Projeya wî jî li cihê xwe ma. Bi derketina yekemîn rojnameya kurdî Kurdistan (Qahire 1898) dîsa ji bo nûjeniyê gavek hate avêtin. Bi destpêka sedsala bîstan re û derketina hin kovar û rojnameyên kurdî re ku êdî zimanê kurdî bû yê pexşanê jî, nûjeniyê serî hilda. Lê ka heta kîjan radeyê ev nûjenî xweser bû! Ez di wê baweriyê de bûm ku yekemîn kesê ku ala nûjeniyê hildabû Qedrî Can bû. Min çîrokên wî û helbestên wî yên ku qalibên klasîk tê de hatibûn şikandin xwendibûn û bêhna nûjeniyê jê dîkir. Lê bi rastî piştî nivîsa Serwet Deniz di Kovara Weyê de (Hj 17- 2007) ku êdî bû rastiyeke ku hin çîrokên Qedrî Can siya hin çîrokên nivîskarekî tirk in, gumanên min li ser pêşengiya Qedrî Can dest pê kirin. Êdî gumanên min di helbestên wî de jî çêbûn (ev yek bi hacetî lêkolîneke berfireh e ku em nas bikin ka jêdera wan helbestan kî û ku ye). Lê

Norm
û form êdî
nema têra
wêjevanan kirin û di
serî de romanê serê
xwe hilda mîna
babeteke nûzayî di
wêjeyê de ku bi
bihurîna çend salan re
rê li ber helbestê girt
û taca pîroz ji serê
wê danî.



Jan DOST

bi her halî em dikarin bibêjin ku nûjeniya kurdî di serî de pêwistiyeke rojnamegeriya kurdî ya nû bû. Diviya bû ku kurteçîrok hebin, diviyabû ku gotar û raporên rojnamegerî hebin, diviyabû ku ceribandî hebin, ev jî hemû nû bûn li ser wêjeya kurdî!

Ez dikarim bibêjim ku nûjenî li ba me kurdan ne xwezayî welidî. Nûjenî li ba me pêçûna wêjeya tirkî û rojavayî bû, bêtî ku şopên nûjeniyê di civaka kurdî de xuya bibin. Erê civak û guhertinên civakê nûjeniyê diafirînin û ji wê jî nûjenî civakek guherandî diafirîne, ev rê û resma peydabûn û pêkhatina têgeha nûjeniyê û nûjeniyê bi xwe ye jî. Lê li ba me kurdan berovajî bû, nûjenî ji derve hat û kesên ku xwestin xwîneke nû biherikînin rehên wêjeya kurdî û pêwîst dîtî ku qalibên berê tîk bibin çav li nûjeniya cihanî ketibûn lê mixabin hîç tesîra wan (ji ber bêsewadiya kurdan û bazara xwendinê ya mirî) li civakê nebû. Ev yek li ser serhildanên destpêka sedsala bîstan jî tê gotin. Ew serhildan bi dest û mejiyên rewşenbîrên

kurdan û planên wan bû (di gel nakokiyên di herêmê de) bêtî ku amadekirinên cidî hebin.

Civaka kurdî civaka gundan bû, loma jî nikaribû zû bi zû were guhertin. Kesên ku hewl dan wêjeyê nû bikin li bajarên mîna Stenbolê, Helebê, Silêmanî û metropolên Ewrûpayê bûn. Di medreseyan kurdî de (ku piraniya wan li gund û bajarokan bûn) hewldanên bi vî rengî çênebûn.

Bi dîtina eger tevgera nûjeniyê li medreseyan kurdî bûna dê civak jî ji bin de bihata guhertin û wêjê jî pê re.

Bi her halî niha wêjeya kurdî êdî gavin mezin ber bi nûjeniyê ve avêtine. Îcar ew nûjenî ku ji derve hatibe yan jî ji hundirê civakê û li ser bingeheke xweser kurdî ava bûbe ne xem e, ya pêwîst ew e ka gelo ev nûjenî dê çawa civaka me jî bikaribe nûjen bike.

Wêjeya Kurdî ya Li Sirgûniyê Rengekî Nostaljik Girtiye

Dilawer ZERAQ

Mamoste tu dikarî ji kerema xwe re qala destpêka çîroka nûjen a kurdî bikî?

D. ZERAQ: Ji bo ku mirov karibe dem û çaxekî wekî destpêka çîroka nûjen a kurdî binimîne, berî her tiştî divê li ser têgiha nûjenî û nûjenbûna çîroka kurdî tu nîqaş û guman tune be. Îcar ku ez ji aliyê form, naverok, teşe, awayê vegotina mijaran û dirûvê berheman ve lê binihêrim, ez ê karibim bibêjim ku destpêka çîroka nûjen a kurdî piştî salên 1910'an e ku piştî weşandina çîroka Şewêş a Fuad Temo û dûre jî bi kovara Hawarê re hewldaneke nûjenkirinê dest pê kiriye.

Di wê demê de rewşa civaka me ya siyasî, aborî û çandî çawa bû?

D. ZERAQ: Helbet diyarkirina rewşa civakê ya siyasî û aborî karekî îstatîstîkî û dîroknîyê ye. Lê belê ji ber xuyayîbûna hin aliyên rewşa civakî ku bandora siyasî lê çêdibû, mirov dikare bêje rewşa civakê ya çandî her wekî xwe bû: yanê civak, ew civaka ku bi zimanekî ku ne zimanê wê ye tê perwerdekirin, xwe ji dinyaya dereke re girtiye û di nav qalikê xwe de diji- û bêtir ku têkeve nav hewldana firehkirina qalikê- û nanê xwe ji mala xwe diqedîne. Û çanda xwe ya ku bandora çanda cihanê lê nebûye, bi hemû qayde û hêmanên xwe ve di salên berê de maye, çawan be, wisan diji.

Ji bo nûjeniyê daxwaza civakê hebû an na?

D. ZERAQ: Helbet hewceyî lêkolîneke sosyolojîk e ev pirs. Bi rastî ez jî pir meraq dikim, gelo ji bo nûjeniyê -nûjeniya ku hemû elementên guherînê ji nav çand û jiyana xwe peyde dike û bi sûdwergirtina ji pêşketinê gel û milletên din, nûjeniyê arizî xwe ava dike- hebû? An jî gelo civakê hay ji guherîneke bi vî rengî hebû, an tune bû?

Bandora cîranan-serdestan (tirk, ecem, ereb) li ser çîroka me ya nûjen çawa çêbûye?

D. ZERAQ: Ji ber ku haya min ji bandora

farisî û erebî tune ye, ez ê nikaribim der heqê vê yekê de tiştekî bêjim. Lê bandora çîroka tirkî ya nûjen li ser çîroka kurdî ya nûjen heye, lê pileya wê û dirûvê bandorkirinê hê baş ne diyar e. Lewre bandora ku tê qalkirin, bi çend awayan çêdibe -bi wergerê, bi jêgirtinê, bi lasayîkirinê, bi kopîkirinê û yên din.- Helbet divê mirov li demajoya nûjenbûna çîroka tirkî ya nûjen jî binihêre... Ji ber ku di wêjeyê de tiştê herî rewşa û meşrû jêbandorgirtin û bandorlêkirin e: ji ber ku wêjeyên zimanan hem bandorên negatîf, hem jî bandorên pozîtîf li hev dikin, divê mirov bi çavekî zelal û objektîf li mijarê binihêre. Û ev bandorgirtin û bandorkirin bi çî awayî çêbibê jî, divê mirov wekî bandoreke xwezayî bipejirîne.

Rola ramana neteweperweriyê çi ye?

D. ZERAQ: Rola ramana neteweperweriyê di nûjenbûna çîroka kurdî ya nûjen de, di destpêkê de, wekî sedema esasî ye û roleke wê ya aktîf heye. Em vê yekê di çîrokên N. Zaza, Qedrî Can, K. Alî Bedirxan û Celadet Bedirxan de dibînin. Û dikarin çîroka N. Zaza a bi navê "Gulê" û çîroka C. A. Berdirxan a bi navê "Gazınca Xençera Min" bidin.

Her wekî di van çîrokan de jî xuya ye û baş tê fêmkirin ku, wêje ji bo hişyarkirin, bihişmendkirina civakê ya ji aliyê netewebûnê ve wekî rêyeke sereke hatiye bijartin. Her wiha ramana neteweperweriyê jî di mijaran de xwe baş daye der.

Wêjeya me ya nûjen çima bi piranî li derve (li sirgûnê) pêş ve çûye? Erênî û neyîniyên vê yekê çi ne? Rewşa çîrokê çawan e?

D. ZERAQ: Ji ber şert û mercên siyasî ku gelek mirov piştî salên 1980'yî derketine derveyî sînoran û ji ber ku li her derê welêt zimanê kurdî di hemû aliyên jiyanê de qedexa bûye, wêje û nivîskariya kurdî li derveyî welêt û li sirgûniyê şax daye.

Belê di destpêkê de, aliyên erênî yên vê şaxdanê gelek in. Ji ber ku, ziman û bi giştî huner di serbestî û bêhnfirehiyê de dikare berheman biafirîne û xwe heyî bike. Ji lew re jî, destpêka li sirgûniyê derfeteke baş a pêşketinê jî daye wêjeya kurdî.

Lê mixabin, ji dem û gehînekekê şûnde, ji ber ku hêviya ku di dilê nivîskariya li sirgûnê de hebûye, ji pêkhatina dema xwe dûr ketiye, wêjeya kurdî ya li sirgûniyê, rengêkî nostaljik girtiye.

Her wiha, tevî ku di hin berheman de motîf

û temayên postmoderniyê hene jî, ji ber ku ne bi zanebûn û ne bi rêgez û prensîbên postmodern hatine afirandin, vê nostaljiyê -piçekî jî wekî 'gundîtiyeke' ku nekariye xwe li nûjeniyê bîne- xwe daye der. Ez dikarim wekî minak vê bêjim: em bêjin nivîskarek li Stockholmê rûdinê. Gava derdikeve derve, li derve apartmanên bilind hene, metro heye, mirovên ku danûstendinên wan a bi hev re bi temamî li ser qaydeyên mirovbûn û nezaketê hatiye danîn hene, di têkiliya wan de rêzgirtina li hev, aqil û hestên mirovane û zanebûn esasa her tiştî ye; tu kes têkilî bi xwarin û vexwarin û lixwekirina tu kesekî din nake, hema bêje hemû kes xwe li qaydeyên jiyanê civakî ya nûjen û pêşketî tîne. Belê îcar nivîskarekî kurdî, ku ew jî ji bo ku karibe di nav civakeke wisan de bijî, kêr zêde bi wan qayde û têkiliyan dijî, radike çîrokekê, an jî romanekê dinivîse û tê de qala gundê xwe, têkiliyên gundîyan ên bi hev re dike. -Dengê wan kesan tê guhê min ku dibêjin, 'Ma nabe ku mirov li Newyorkê jî rûnê lê qala gundan bike.'- Belê dibe, -û ez tenê qala mekanê jî nakim- lê ku mirov qala nûjeniyê bike, divê mirov karibe qala erênîyên ku pêşketinê bi xwe re tînin bike. Helbet nivîskarên kurdî, di berhema xwe de, wê tevlihevî û lihevnekirina ku di navbera jiyanê li Stockholmê û ya li gundê xwe de heye ji xwe re bikira mijar û ew nakokî raxista, me yê bigota 'a va ye berhemeke postmodern.'

Ji ber vê yekê, mixabin ku em piştî qonaxekê nikarin bêjin ku wêjeya kurdî ya li sirgûniyê hê jî wekî hêzeke motorî ye û yek ji kana pêşketinê ye. Êdî pêşketin û nûjeniya ku hêvî jê tê kirin ne li sirgûniyê, şaxa xwe ya dîtir û zexmtir li welêt dide.

Bingehên çîroka me ya nûjen çiqas xweser in? Ku pîrsgirêk hebin çi ne û îro bi kîjan rengî derdikevin pêşberî me? Ji bo çareserkirina pîrsgirêkan divê çi bê kirin?

D. ZERAQ: Bingeha çîroka kurdî ya nûjen, mixabin ji ber zimanên cuda cuda yên perwerdehiyê, ne tenê zimanê kurdî yê zaroktiyê ye. Helbet çîrokên gelêrî di warê bingehbûnê de roleke sereke dilîzin, lê ji ber ku nûjenî, bi her awayî têkiliya wê bi xwendinê re heye û bi hemû hêman û elementên xwe ve girêdayî perwerdehiya nûjen e. Her wisan, bingeha çîroka kurdî ya nûjen, li ser du lîngan e: lîngê wê ji çîrokên

gelêrî -ku bi temamî bi ruh û ziman û mantiqê zimanê kurdî geşe daye- ava bûye, lîngê din jî ji perwerdehiya nûjen a sistematîk ku bi zimanekî dîtir pêk tê, ava bûye.

Têkiliyên çîroka me ya nûjen bi wêjeya klasîk û ya devkî re çawan in? Ya nûjen li ser van hîman bi pêş ketiye an ew red kirine û li hember wan serî hildaye?

D. ZERAQ: Ew berhemên ku -berî têgiha modernîzmê afiribûn- di dem û çaxê xwe de modern bûn. Ji ber berhembûna xwe, ji ber afirandbûna xwe, ji ber ku ew ji dest û mêjî û hiş û aqil û deng û alav û navgînên hunermendekî/ê afiribûn, hêja bûn. Hebûniya wan li ser mîmesîsa Arîstoteles hatibû avakirin û wan hêjahî û bêhempabûna xwe jê werdigirt. Her wisan, me çavên xwe vekir, me navê berhemdarên xwe (*ne navê berhemên wan*) di devê xwe de kir benîşt (*û bi hildana navê wan navê me jî mezin bû*).

Me nekarî klasîkên xwe watedar bikira; ji ber ku gava xelkê ji xwe re xweştirin para modernbûnê çêj dikir (wek netewebûn û avakirina zimanekî mustereke), me dikir nedikir me nikaribû em bibin modern.

Me dizanibû, me hin berhem hebûn ku xurt bûn û pir bi xweşîkî di nav têgiha klasîkê de hildihatin, lê me nekarî navek li sedema hebûna klasîkbûna xwe bikira; ji ber ku me dîrok wekî rojên ku derbas dibin fêr dikir, me dîrok *wekî çîrokê* fêr dikir.

Me dikir nedikir me nekarî têkiliyeke baş û xurt bi klasîkên xwe re daniya; ji ber ku me heya niha ew bi tekûzî bi nav û pênase nekiribû.

Îcar, bi vê rewşa ku ji têkiliyeke nehatî pênasekirin pêk tê, ne gengaz e ku çîroka kurdî ya nûjen li ser van hîman pêş bikeve. Û her wiha, ji ber ku nûjenî û nûjenbûn bêhtir wekî tevgerê jinûveavakirinê tê fêmkirin, em dixwazin qala redkirin, an jî serîhildana li hember klasîkên kurdî û çîrokên gelêrî bikin. Lê mixabin nûjenî ne tenê ew e: nûjenî piçekî ji domandina bi hişmendî ya hêman û elementên gerdîşî ye jî: û gava ku bi çavekî hûrnêr û dahûrandineke bi hişmendî li wêjeya klasîk û çîrokên gelêrî bê nihêrtin, wê hingê dê ji bo hin beş û metodên gerdîşî redkirin û serîhildanek pêk bê û bive nevé dê nûjeniyê ji hundir de geşe bide û berceste bibe.

Çîrok Pêşverû ye

Ronî WAR

Gava ku tu li çîrokê dinîhêrî, tu dibînî ku nayê dest, angî xwezayekê wê ya berxwedêr û azad heye. Loma ji tim berê wê wek yê heyatê li pêş e. Li nûbûn û guherînekê digere. Dixwaze xwe ji kirasê kevn rizgar bike û xwe ji nû ve vejîne. Vejîn wek ku tê zanîn ne hêsan e. Her car bi xwe re êşê jî tîne. Bi êşê re vejîn bi wate, bi ruh û gewde dibe. Lê vejîna çîrokê dirûveki dawî nade wê û mîna ji halê vejîna xwe qayil be xwezaya wê tim berê wê li nûjenî û bêqisûriyê diqelibîne. Çîrok bi xwe re ne li hev e. Ji xwe ne razî ye. Xwe di çav re dike û bi vî hawî tim xwe nuh dike. Tim di nav liv û tevgerê de ye. Ji ber vê, her car herkekê ji xwe re dibîne da ku biherike nav rehên heyatê. Tim li vegotînek nuhtir, li dirûveki xweşîktir, li lêkirîneke saxlemtir digere û berê xwe dide rêwîtiyekê ji ya berê xerîbtir. Di hêla lêkirîne de li têkûziyekê digere. Di hêla xebitandina alavan, mijar û zimên de ji li estetîkekê digere ku xweş û xurt be. Ev hêlek çîrokê ye ku di xwezaya wê de heye. Ev di eslê xwe de hêlek huner û wêjeyê ye jî. Hêla çîrokê ya din angî xusûsiyeta wê ya din jî her piştgiyê dide hêla mexdûr û rastiyê diparêze. Li pişt kesên ku heqê wan hatiye xwarin derdikeve û bi hunera xwe kesên mafxwar neheq dike. Ji bo vê dixebite. Loma ev jî dike ku berê wê li hêla nûjeniyê be û bi zordestiyê û êşê re rûbirû bimîne.

Çîroka dinyê ya nivîskî bi derketina xwe re li xwe geriyaye. Xwestiyê ji xwe re dirûveki nuh ava bike û cihekî ji xwe re di nav edebiyata dinyayê de veqetîne. Ji ber vê derketiyê rê û rêwîtiyekê û xwestiyê li gorî xwezaya xwe dinyayekê ava û peyde bike. Gera wê her ev e. Ji nav edabiyateke heyî dertê, li dirûvê xwe yê devkî vedigere û xwe nuh dike. Dû re dîsa berê xwe dide guherînek din ya nuh. Li hemberî pergale û pîvanên civakê yê ku mirov diguvêşe ser hev û tengazar dike derdikeve. Li hemberî qalib û qaîdeyên nivîskî yê rûniştî jî serî radike û li kirasekî nuh digere.

Çîroka me jî di hêla pêşverûtiyê de wek çîroka dinyê li ber xwe dide û her dem xwe nuh dike. Tiştê ku ketiyê ser piyê wê xwestiyê

bîne cih. Her tim li pişt kesê ku heqê wan hatiye xwarin rabûye û li hemberî zordestiyê sekiniye. Ev seknek birûmet e. Û ev rengê xweşîk dide wê. Ji roja ku fersend ketiyê destê wê xwestiyê berî her tiştî piştgiyî zimên bike. Çimkî ziman birîna wê ye jî. Wexta ku tu lê dinîhêrî tu dibînî ku çîroka dinyê bi zimanekî rûniştî tê nivîsandin çîroka me jî him jî bo xwe û him jî ji bo zimanê xwe li ber xwe dide. Li hal û wextê xwediyê xwe dinîhêre û li ser difikire, difikire û bi xweafirandinê re dixwaze birînen xedar bi awayekî bê dermankirin û ji nû ve vejîn bê destpêkirin. Rewşa heyî dikole, tevdiye, lê dinîhêre, carinan şirove dike, carinan rê dide û carinan jî dibe zimanê dayikeke ku ji cih û warê xwe hatiye koçberkirin, carinan dibe qêrîn û derbirîna bermiradeke ku hinekan bi darê zorê ew ji keçikanî de xistiye. Carinan dibe hêviya kesên ji ber koçberiyê li ser sergoyan xwarinê didin hev û dengê wan. Carinan dibe hêşirên ji xwînê û dengê hundirîn yê dilê dayikekê ku nikare here meytê kezêba xwe ji serê çol û çepelan bîne û bi veşartinê re du dangan li ser bilîrîne. Carinan dibe xewna yekî ku li kuçê maye di şevên zivistanê sar de. Carinan dibe sebra ber dilê kesekî ku ji hêla civakê ve nema tê fêmkirin. Carinan dibe ziman ji hêşirî, belengazî, koçberî û rapêrîna kesên Helepçê û rûreşîya dirokê rê dide...

Heger ku bi avabûna dinyê û hebûna însên re çîrokê dest pê kiribe çîroka me jî di nav wê çîrokê de ye. Angî çîroka me jî wek ya dinyê pir kevn e. Çawa edebiyata dinyê ya nivîskî û nûjen xwestiyê ji edebiyata xwe ya devkî angî; meselok, destan, efsane, serpehatiyên xwe û bi giştî ji folklorê xwe fêdeyekê bibînin û bi motifên geleri edebiyata xwe bixemilînin, çîroka me ya nûjen jî li gorî derfet û hebûna xwe xwestiyê ji edebiyata xwe ya devkî fêdeyekê bibîne û ditiye. Lê ji bergî carê serdestan zimanê me qedexê kirine û nehiştine çîrok di herka xwe de biherike û xwestine kaniya zimên bimiçiqînin, edebiyata devkî li gorî ku dil dixwaze nehatiye xebitandin. Bi vîya re sînoran jî nehiştîye ku nivîskar ji hevdu haydar bibin û zanîbin bê ka kîjan nivîskari çî, li ku û kengî nivîsandiye, kêmaniyên hevdu bibînin û wan kêmanîyan derbas bikin. Angî ji ber qedexeya ziman, sînor û elfebeyan haya wan ji hev çênebûye û dewrên xwe nejiyaye. Wek edebiyat û çîroka dinyê di merheleya demên hunerî û edebî re jî nebuhiyê. Gava ku tu li edebiyat û çîroka dinyê dinîhêrî tu dibînî ku nivîskarên wan hevdu şopandine, haya wan ji hev çêbûye, bê çî kirine, çî nivîsandine û ketine çî kêmanîyan, xwendevan ji çî têr bûye û divê piştî wê qonaxa ku ew gihaştinê êdî çî çawa

bê nivîsandin, bersivandine. Him ji yê welatê xwe him jî ji yê derveyî wan tecrûbe dane hev û jê kar ditine. Mirov dikare bi rihetî bibêje ji ber şertên xwediyê xwe çîroka me jî serboriyek normal nejiyaye.

Wek ku tê zanîn çîroka dinyê ya nivîskî li ser edebiyateke heyî, zimanekî nivîskî yê rûniştî derketiye û hitabî wê jêderka xwe kiriye, loma jî pêş ketiye û jiyaye. Çîroka me jî bêtir ji bo ku ziman nemire, ji bo ku xwe bigihînin gel û propagandaya xwe bikin û ji welatparêziyê derketiye. Nivîskarên me jî ji dêvla serê xwe li ser edebiyatê, huner û çîrokê biêşînin bêtir li ser tiştên siyasî êşandine û bi vêya re jî karê nivîsê kirine, ji ber vê jî gava ku tu li minakên ewil dinîhêrî tu dibînî ku ne wek yê dinyê xurt in.

Li vira çîrok jî me dixwaze berî ku em derbas bibin û çav biavêjin derketina çîroka kurdî ya nûjen, em pêşî pêşengên çîrokê bi bîr bin. Yê ku em ê wan bin bîra xwe ev in: Nikolay V. Gogol, Edger Allan Poe, Guy de Maupassant û Anton Çehov e. Çîrok ne neheq e ku heyfa wê li mirina wan ya bê west tê. Nikolay Gogol bi çîrokên xwe temelê çîroka modern ya dinyê daniye. Çimkî bi qasî nivîskarên welatê xwe, nivîskarê dinyê jî xistiye bin bandora nivîskariya xwe. Gogol çîrokê dadixe nav heyatê. Lehengê xwe ji heyatê û kesên rêzê dineqîne û dinivîsîne. Heta wê rojê kesên ji rêzê û jar nedibûn figurê çîrokê. Bi hîlbijartina kesên ji heyatê re rê û rêwîtiyekê jî bo çîrokê vedike û bêhna wê tine ber. Bi motifên gel û folklorê xwe çîrokê dixê nav heyata edebiyatê û cihekî jê re dide veqetandin. Edgar Allan Poe, wek bavê çîroka nûjen ya dinyê tê naskirin. Ew wek Gogol ne di nav heyatê de ye. Poe di nav xeyaletan, periyên û tiştên ecêb de ye. Di çîrokên wî de rastî û xeyal li hev bahniyane. Çîrokên wî li dora tîrsê, sûc, kabûs, mirinê û xofê diherin û tên. Lê tevli vê jî rehên çîrokên xwe ji heyatê nabire. Keda wî ya di hêla pênasa çîrokê de pir mezin e û bi qasî çîroknivîsiya wî girîng e. Piştî Gogol û Poe, Maupassant û Çehov tên, wan jî bi xebata xwe ruhekî nuh û xwîneke teze dane çîroka dinyê. Maupassant, di hêla 'çîroka bûyerî' de mohra xwe li çîrokê xistiye. Çîrokên xwe bi awayekî temamkirî pêşkêşî xwendevanên xwe dike. Halekî, hêlekê ya jî hinekî bi tenê nabêje, tevdekî radixe ber çavên xwendevanên xwe. Berê xwe dide tiştên ku heta wê rojê nehatine qalkirin, hatine veşartin, durûtiyan û adetên ku însên digu-

vêşe ser hev û wan derdixe pêşberî xwendevanên. Bi saya vî hawî xwe dike ku xwendevanê çîrokê zêdetir bibin. Anton Çehov; bi 'çîroka rewşê' xwe daye qebûlkirin û bêhna çîrokê bêtir aniye ber. Ew her tiştî dikesixîne û heta jê tê ji dirêjkirinê direve. Ango çîrokê minîmalîze dike. Bi zimanekî sade dinivîse û bi vî hawî bêtir nêzikî heyatê û rastiyê dibe. Di navenda çîroka wî de germbûna heyatê û rastî heye. Ji bûyerê û mijarê wêdetir însan li pêş e û çîroka psikolojiya wî vedibêje. Lehengên wî jî ji heyatê ne.

Gava ku tu lê dinîhêrî tu dibînî ku pêşengê çîrokê bi qasî ku tesîr li hev kirine li kesên dû xwe jî kirine û hê jî ew berdewam e. Gogol dest avêtiye dinyaya însanê ji rêzê, rê li ber çîroka dinyê vekiriye, Poe him teknîka wê xurt kiriye him di hêla pênasa çîrokê de xebateke mezin kiriye û him jî di warê çîroka tîrsê û fantastîkî de berhemînî giranbûha afirandiye, Maupassant temelê 'çîroka bûyerî' daniye, Çehov sadebûn aniye çîrokê, çîrok kin kiriye û 'çîroka rewşê' afirandiye. Tu li gişa dinîhêrî dema xwe û însanên xwe nivîsandine. Li heyat û pergala ku tê de dijîn nihêrine û ew neecibandine, rexne kirine û nûbûnek dane çîrokê. Yê li dû wan jî hatine tecrûbeyên xwe û yê kesên berî xwe tevli hev kirine û ji wî sermîyanî çîroknî ku dema ew tê de ne ji wan dixwaze afirandine.

Îcar em dikarin dîsa werin ser çîroka me ya nûjen. Çîroka me ya nivîskî li gorî ku em digihêjinê di çavkaniyan de wek çîroka ewil di sala 1856'an de ya Mele Mehmûdê Beyazidî tê qebûlkirin. Nivîskarê me çîroka xwe ji folklorê kurdî girtiye. Li vira nîzanim mirov dikare wî û Giovannî Boccaccio bişibîne hev an na. Wek tê zanîn Boccaccio jî ji folklorê xwe çîrokên nivîskî afirandine û ku tu li dîroka çîroka nivîskî dinîhêrî tu dibînî ku Boccaccio berî her kesî çîroka nivîskî afirandiye. Bawer im ji hêla destpêkê û nivîsandina ji folklorê ve mirov dikare wan bine cem hev.

Em werin ser çîrokê dîsa. Çîroka kurdî ya nûjentirîn jî wek çîroka Fuad Temo ya bi navê 'Çîrok' tê qebûlkirin. Çawa çîrokên me yê ewil qelsiya wan tavilê xwe didin dest di vê çîrokê de jî ev derdikeve pêşberî mirov. Ji ber ku çîroka Fuad Temo çîroka nivîskî ya ewil e ew wek destpêka çîroka kurdî ya nûjen barê temsîlkariyê hildigire. Çîroka me ya nûjen jî hema bibêje di serûwena çîroka zimanên cîranê xwe re derbas bûye. Ji ber ku çîroka nûjen ne li ser vê erdnîgariyê hatiye dinyê û çavên xwe li

heyatê venekiriye, kurd jî wek cîranên xwe bîra hişê xwe ya hunerî, çandî, wêjeyî tevdide û serî li folklorê xwe dixê jî bo ku navekî jê re bibînin û cihekî jê re veqetînin. Bi gava duyemîn ya li dû nav re jî xweşibandinek dualî derdikeve pêş. Him dixwaze rehê xwe jî folklorê xwe qut neke û formên ku heye bixebitîne û him jî dixwaze bi forma ku nuh hatiye ber destên wan çîrokekê biafirîne. Li vir tu tesîra folklorîk û ya çîroka nûjen bi awayekî aşkere dibînî. Di çîroka cîranê zîmanê kurdî de jî ev hatiye serê wan. Ango di çîroka cîranan de jî serê ewil tu dibînî ku çîroka dinyê taqlîd dikin, bi wergerê re hinekî din lingê wê erdê digire û dû re berhemên xwe yê xweser diafirînin. Ev dibe rêwîtiyek jî bo çîroka cîranan û ya me. Gava ku tu li çîrokên kurdî dinihêrî, tu dibînî ku ew jî wek çîroka cîranên xwe di binê tesîra serdemên aborî û siyasî de maye. Lê bi ferqekê, yê wan jî ber ku berdewamiya nivîsandinê rê li ber nehatiye girtin jî ya me bêtir pêşketîtir e. Zindî maye, xebitiye û xwe nuh kiriye. Bi vêya re jî pîrs-girêkên ku jî hêla nivîskariyê ve derketiye pêşiya wan derbas kirine. Çîroka me jî ber sedemên şertên xwediyê wê mîna çavê nihêrînê jî bîra bike tim jî nû ve xwe hînî nihêrînê kiriye. Dû re xwestiye wî wextê ku bi navberdayînê derbas bûye dagire û pêşketinê bi dest bixe. Lê wextê çûyî nema tê! Di çîrokên me de jî hema bibêje her mijar hatiye nivîsandin. Jixwe me li jor gotibû berhemên ewil tesîra edebiyata devkî li ser wan heye û qels in. Her çiqasî hin deman hin werger jî edebiyata dinyê çêbûne jî vêya zêde tesîr li ser zîman û çîroka me nekiriye. Heger ku carê navber neketiba çîroknivîsiyê û weşana kovaran, dibû ku ew werger bi kêrî tiştekî bihatina. Lê piştî demekê wînda bûne. Ya jî di nav hêlekê de maye û piştî wextekî jî ber sedemê diyar hatine jibîrakirin û negihîştine ber destê kesên ku wê sûdekê jê werbigirin. Bêtir zîmanê ku serdest in, edebiyata wan û wergerên ku bi zîmanê wan bûye, bandor li ser berhemên me kirine. Loma mirov dikare li vira bibêje rola tirkî, erebî û farisî li ser edebiyat û çîroka me heye. Çimkî nivîskarên çîroka kurdî mecbûr mane ku bi van zîmanan bixwînin û edebiyata dinyê nas bikin. Gava ku tu bi zîmanekî bixwînî û berhemên edebî bi dest bixî ne gengaz e ku tu xwe jê biparêzî û xwe jê safî bikî. Tu bixwazî nexwazî ew ê tesîrê li te bikin.

Wexta ku tu bixwazî bi şûn de vegeirî û li

rêwîtiya çîroka me ya nûjen binihêrî tu yê bibînî ku bêtir ev rewş derdikeve pêşberî mirov: Bi rojname û kovaran derketiye û xwestiye bijî. Ji ber ku kesên ku rojname û kovar derxistine pirê wan ne li ser cî û warên xwe bûne, bêhna nefibûnê jî berhem û weşanên wan tê. Pîraniya nivîskarên me yê ewil hema bibêje derketî ne. Ango ne li ser cî û warên xwe nivîskarî kirine. Yan bînxetî bûne yan serxetî, yan çûne başûr yan jî xwe li rojhelat girtine û hin jî ji wan berê xwe dane welatê xerîbiyê û berhemên xwe li wîra afirandine. Hin kesên nefikîrî jî bi yê ku li cî û warê xwe mane re tim di binê zextan de xwestine berhemên xwe biafirînin. Ji ber ku her tim li derekê û wextekî din rojname û kovar derketine çîroka me jî her car li ser erdeke nuh xwestiye jî xwe re cihekî veke û li ser rûqalê cîhana edebiyata dinyê bijî. Ji hêla din ve gava ku tu lê dinihêrî tu dibînî ku çîrok li tîlan dialîqe, li elfebeyên naşibin hev rast tê û zarava nahêlin ku jî tecrûbeyên hevdu fêdeyekê bibînin û hevdu temam bikin. Wê jî deyne hêlekê problemeke din a herî mezin jî zîmanekî yekgirtî di nav zaravayan de tune ye û çenebûye. Ev bûne sedema ku çîroka kurdî ya nûjen qels bimîne.

Divê em şertên heta çend sal berê jî bîr nekin û di bîra xwe de bînin ku dîtina pirtûkeke kurdî li refê pirtûkxaneyan jî bo me kêfxweşiyek bû...

Wek dawî gava ku tu li rewşa çîroka kurdî ya nûjen dinihêrî tu dibînî ku dişibe serboriya xwediyê xwe û dirûvê xwediyê xwe dide. Pîraniya berhemên me li xerîbiyê; li derveyî cî û warê xwe, li nefibûne derketine. Ev bi serê xwe bandorekê li kesên ku dixwazin berhemekê biafirînin dike û wan dixê bin bandoreke neyînî. Heger ku mirov bixwaze hêlek baş ya xerîbiyê û surgûnê bibîne ew jî ev e: jî tesîra tîrsa pergalên ku wan wek neyar dihesibînin dîr in û li wîra dikarin biafirînin. Bi vê sayê jî bandorek li zîman û wêjeyê kirine û xebat û keda wan kesên ku derketî û surgûn in mezin e. Îro em deyndarên wan in ku bingeha rêzîmanê me avêtine û minakên ewil jî bo weşangeriya me kirine.

Heger ku em bixwazin vê çîroka ku seren-cama wê diyar bi pêş ve bibin divê em berî her tiştî zanibin ku em û çîroknivîsên dinyê, welatê wan û yê me, çanda wan û ya me, zîmanê wan û yê me, xwezaya wan û ya me naşibin hev û em li gorî vêya tevbigerin.

Bi hêviya ku tevlî hemû tengasî û kêmaniyên hene em çîrokinî xweş bijîn û bikin qismetê zîman û edebiyata xwe...

Destpêka Nûjeniya Kurdî Ehmedê Xanî ye

Hevpeyvîn: Serwet DENÎZ

W- Mamoste niha me berê jî qal kiribû; em dixwazin bingehên nûjeniya wêjeya kurdî hinekî ji hev veçirînin. An jî bizanîbin ka di bingeha nûjeniya wêjeya me de çi heye. Kê zêde em dizanin li dinyayê ev pêvajoyên çawa bi pêş ketiye. Nûjenî di tevahiya qadên civakî de bi carekê re pêşketiye, lê em dixwazin hinekî ya xwe ji hev veçirînin. Ji bo wê jî pêşî tu peyva 'nûjen' çawa rave dikî û destpêka helbesta nûjen a kurdî kîngê ye, tu ji ku derê didî destpêkirin? Pirsra me ya yekem ev?

Arjen ARÎ: Di vir de mijar kûr e. Lê mebest ji nûjeniyê çi ye divê ku mirov bikaribe wê rave bike. Bi qasî ku ez bixwe têdîgihîjim weke ku berî niha te jî got nûjenî û pêşketin di hundirê civakê de li ser erdnîgariyekê di nava dewletekê de, ne di hêla edebî tenê de pêk tê. Rast e ew hêl weke hêleke ser bixwe weke tevgerekê xwe lê digire. Lê dûre ew dîsa jî di bin bandora pêşketin an jî paşdemayîna civaka xwe de ye. Yanî em nikarin çandê yan jî tu pêşketinê edebî ji rewşa aborî, siyasî, civakî ya heyî ya Kurdistanê yan jî ya erdnîgarîyeke wekî cihê bikin. Ji ber hingê eger mebesta me jî modernîteyê, modernîteya ku em dizanin be, civaka kurd modernîteya xwe mixabin ne jiya ye. Jiyabe jî di bin çavpêketinê re ev tişt pêk hatine. Ne senayîya me heye û ne pergaleke me ya dewletî. Gava ku rewş wiha be em ê çi bikin, em ê ji nûjentiya xwe yê ber dest û yê li derdorê di bin bandorê bîminin û li ser wê tiştekî ava bikin. Wek mijar mirov dikare berhema Ehmedê Xanê bigire dest. Berhema Ehmedê Xanî nûjen e ji bo zimanê kurdan, bi taybetî ji hêla şêwazê ve, ji hêla formê ve eger wek mesnewî bê binavkirin jî ji aliyê naveroka xwe ve ne weka mesnewiyên heyî yê nav ereban an jî di nav farisan de ye. Çunkî gelek beş gelek,

gelek derî vekirine li ber vê meseleyê. Ji ber vê hindê em dikarin wek destpêk bigirin dest.

W- Ehmedê Xanî tu wek destpêkê bi nav dikî

Arjen ARÎ: Ew jî nûjeniyek e. mebest tiştekî nû afirandin, balkêş û hemdem be, ez ji nûjentiya wê fêm dikim. Lê nûjentiya modern a ku bi çavê rojavayîya lê tê nihêrtin ew tiştekî cuda ye.

W- Gelek kes jî Ehmedê Xanî didin destpêkirin. Bi awayekî giştî gava em lê binihêrin, rewşenbîriya kurdî gava mirov qal dike wiya, gelek kes jî dawîya sedsala 19'an û serê sedsala 20'an didin destpêkirin. Wê çaxê rojname dertên, kovar dertên, komele ava



dibin û gelek tiştên din tîn kirin. ji ber vê yekê, ji vir didin destpêkirin.

Arjen ARÎ: Ez bi wan mirovan re me jî. Eger weke tevgerê nûjentiyê mirov li meseleyê bimeyze û binirxîne rast e. sedsala nozdehan û destpêka bîstan de kurd li Rojhilata Navîn bi taybetî li Stenbolê, dûra li Qahîreyê, li Şamê, li Silêmanyeyê li van deran li ber xwe dane, tiştê anîne pê, ev nûjentiyek e. em bibêjin tevgera Hawarê di nava civaka kurdî ya edebî, hunerî û zimanî de ne tevgerê nû ye? Wek tevgera Ehmedê Xanî. Li aliyê din rojnamegeriya kurdan gava ku dest pê kiriye ne nûjeniyek e ji bo kurdan? Ji bo dinyayê bi xwe jî. Wê serdemê (hezar û heştê û nod û heşt) jixwe rojnameyê kurdan tune. Gava ku ev destpêk nûjentiyek be, hem ji bo kurdan nûjeniyek e hem jî ji bo derûdora kurdan.

W- Di vir de ew ciyên ku te jimartin û bi taybetî li Stenbolê piştî tevgera 1908'an bi awayekî berfireh karên rewşenbîriyê û wêjeyanîyê û gelek karên din tîn kirin ev bi awayekî nûjen tîn kirin hem ji aliyê alav û amûran ve û hem jî ji aliyê teşeyên wêjeyî ve cureyên wêjeyî yên nû û gelek nûjeniyên weke romanê weke çîroka nûjen hêdî hêdî tîn. Rewşa civakê çawa bû? Li Stenbolê vana çêdibin, li Amedê, li Botanê, li Mêrdînê, li Serhedê rewşa civaka me çawa bû. guherîneke bi wî awayî di civakê de jî heye an na? daxwazê civakê ya bi wî rengî heye gelo?

Arjen ARÎ: Niha divê em mafê wan mirovan ya jî rûmeta wan mirovan winda nekin. Eger kurdan di rojnamegeriyê de an jî di çapkirina pirtûkan de hin rewşenbîran li Stenbolê hewl dabe ku nûjentiyekê, yan jî bingeheke nû deynin bo dahatûya xwe ev xwestek ev daxwaz him ji hêla hizrî ve, ramani ve him jî ji hêla kirinî ve qet ji civakê ne dûr bûye lê mixabin divê mirov şert û mercên wê demê yên siyasî, aborî û yên tîkiliyan deyne ber çavên xwe, ji ber baş tê bîra min lê kîjan wext e ez baş nizanim dema kurê Şêx Seîd diçe cem Seyîd Evdîlqadir pê re diaxe Seyîd

Evdîlqadir hinek belavokan pê re dişîne. Bala xwe bidine Ji bo ku rewşenbîrên kurd ên ku li Stenbolê dijîn hîna nikarin belavokeke xwe li gelê xwe belav bikin, li hêviyê mane ku şexsiyetek wek kurê Şêx Seîd bê cem wan hetanî ku bi awayekî vê belavokê dişînin welat. Ev jî nîşana astengî û bêderfetiya rewşenbîrên li wê derê ye. Yan jî mimkun e ku mirov bi navekî din jî bi nav bike; bêrêxistinbûn.

W- Di nav kurdan de pêşketinek, nûjeniyek dertê holê. Di vê pêşketinê de bandora derûdorê çi ye? Qesta min ji vê pirsê ev e; li Rûsyayê tevgera 1905'an, li Îranê 1906-11'an li Tirkiyeyê ya 1908'an hene, li gelek deverên din şoreşên netewî pêk tîn, dîsa em dizanin ku rojnameya Kurdistan rojnameya kurdî ya pêşîn jî wek weşaneke Îtîhat Terakiyê ye, bi weşana wan re dertê. Bandora van cîranan li ser wêjeya kurdî, li ser rewşenbîriya kurdî di wê demê de çawan e gelo?

Arjen ARÎ: We got bi Îtîhat Terakiyê re tevgeriyane, rast e, ez maf didime wana, ji ber piştî rûxîna osmaniyan bibê nebê bi kurtepiştî jî be, ne weke pêşnûmayekê an jî ahdekê-peyman be jî di nava tirk û kurdan de li ser mafên gelêrî ya jî yên xelkê ya jî yên qewmî lihevduhatinek heye. Di wê serdemê de ev her du hêz bi xoşewistî nêzî van maf û daxwazan dibin. Lê wekî tu bi xwe jî dizanî piştî ku Îtîhat Terakî, ya jî dewlet bi xwe, an jî kemalist hêzdar dibin, van mafên rewa û daxwazan weke daxwazên nedicihde dibînin. Û kurd dibin reşên tirkên. Ne îmkân e ku em bibêjin tevgerê edebî, rewşenbîrî ku di nav sînorên cîranê me de pêk were û ew ba negihîştibe me.

W- Bi taybetî di hêla helbestê de bandora van cîranan li ser me çawan e? wê wextê pîremêrd heye li Stenbolê, di dawîya sedsala nozdemîn de Hecî Qadirê Koyî li wê derê ye û yên wekî din jî hene liv û tevgerên cîranan li vana çawa bandor kirine?

Arjen ARÎ: Niha weka hûn dizanin şîra diwanê ya klasîk, heta demekê bi taybetî gava di nav sînorê Împaratoriya Osmanî de lê



dinihêrin piştî ku yên wek Namik Kemal mijarên civakî û siyasî xist hundirê helbestê ne mimkun e ku Hecî Qadirê Koyî bandorê jê negire. Dawiya dawîn heta dema Hecî Qadirê Koyî an jî Namik Kemal ew helbesta ku qala birhên kevanî û çavên xezalî newqa zirav a yarê dikir ne îmkân e ku wê forma xwe, şiklê xwe an jî naveroka xwe neguherîne. Bivê



nevê ev bandor ha tirkên li kurdan kiriye, ha ereban li kurdan kiriye an jî rojavayîyan li tirkên kiriye, ev bandor wek xelekên zincîrê ne mirov nikare bibêje îlahîm ev bandor jî vê hatiye an jî wê hatiye. Lê çi ye, yên ku pêşiyê dest pê kiriye, meşiyaye rê ya wî ye. Yê ku li dû çûne jî peyrewên wî ne. mirov dikare bi vî awayî bi nav bike.

W- Ev serdema ku em qala wê dikin aliyekî wê yê din jî heye di aliyê ramanî de hizirîne de ramana neteweperweriyê di wê demê de li pêş e. gelo wê yekê çi qas bandor li nûjeniya helbesta kurdî kiriye? Mînak mirov di Hecî Qadir de bi awayekî berbiçav dibîne.

Arjen ARÎ: Wek mirov nimûne Hecî Qadirê Koyî bigire dest di helbesteke xwe de ayan beyan rexneya li hin kurdên ku bi tirkî yan jî farisî dinivîsin dike. Wiha dibêje; “Çi kêmasiya kurdî ji farisî heye” -Niha baş nayê bîra min- Ev bixwe ne ji netewîtiyê tê û parastina vî zimanî li hemberî zimanên din ên ku îro em weke zimanê serdestan bi nav dikin? Heger jî wê rojê de rewşenbîrên kurdan wek H. Qadirê Koyî bi gur û bi înad jî vê hişmendiya neteweyî dabûna rê û zimanê serdestên xwe di helbesta xwe de di berhemên xwe yên edebî de bi kar nanîbana weka tradîsyonekê ku bi rê ve biçe wê pêk nehatibûya. Çûnkî dawiya dawîn em kurd, bi taybetî cîranên me jî yên ku em di bin detê wan de dijîn jî, ew bi xwe jî gelek caran bi çavlêketinê re tevdigerin.

W- Em dixwazin vêya bibêjin helbesta me ya nûjen çiqas xweser e? Wek tespîtekê, ne wek rexne, ku ne xweser be em dikarin vêya wek pîrsgirêkekê bibîn an na? Ku pîrsgirêk be pîrsgirêkeke çawa ye, xwe çawa dide der û gelo îro mimkun e ku bên çareserkirin?

Arjen ARÎ: Me berî niha got. Weke mirovên zindî ku em di nava vê civakê de dijîn ji bo ku em karibin xweseriyekê di çîrokê de, çi di romanê de, çi jî bi teybetî di helbestê de bi destbixin, beriya her tiştidivê em li eslê xwe vegerin li xwe vegerin. Çi ye, lixwevegerîn? Ew e ku helbestkarek bikaribe jî nimûneyên berdest helbesta xwe biafirîne, beriya her tiştî divê ji peyvên pêşîyan bigire heta payîzokan, Stranên li ber tîr gotin, wêjeya di nav kurdî de, helbesta gelêrî ya, xelkê ya ku em bêjin ku bûne stran jî bi xwe û nebûne stran, dû re jî ya klasîk, vana hemûya gava ku kêr zêde binase ew êdî ya wê peyrewê em bêjin vê edebiyatê, kesekî yan jî ji nava wan wê hîmê, wê gencîneyê wê xezîneya heyî ya berdest xezîneyeke xwe bi xwe ava bike. Mesela wek mînak em bala xwe bidinê weka ku min di nivîseka xwe de jî anîbû ziman heta ku Cegerxwîn, Ehmedê Xanî naxwîne, navê xwe weka Cegerxwîn hilnabijêre. Heta ku Cegerxwîn, Ehmedê Xanî naxwîne, Ehmedê Xanî weke qutbekî weke şêxekî ku karibe bide dû, wî temam bike, xwe nabîne. Ev karteka Ehmedê Xanî ya li Cegerxwîn e. Dûre gava em helbesta Cegerxwîn dişopînin em bala xwe didinê ku Cegerxwîn erê di destpêkê de heta

dûmahîkê di bin bandora Ehmedê Xanî de maye lê di bin bandora hişmendiya wî de maye, ne ku helbesta wî dubare kiriye. Ji ber ku Cegerxwîn bi naskirina Ehmedê Xanî re xwe hîn bêtir nas dike. Mesele di cihekî helbesta xwe de dibêje ku “Rebenê xwedê! Ehmedê Xanî bi naqosa mezin kurd şiyar nekirine, tu bûyî wek zengilê devê derî zingîniya te ye, tu yê bikaribî çî bikî”. Ev weke jovantiyekê bixuyê jî bi gur û bi înad Cegerxwîn heta 70 saliya xwe li ser vê axê jiyaye û bi taybetî tevî ku di helbesta kurdî de rexne lê tên kirin. helbesta heyî rûxandiye ji kirasê wê bi derbekê ve şûştiye. Baş e wexta em vîna dibêjin em nabêjin di dema Seydayê Cegerxwîn de di helbestê de yên ku mirov dikare qala wan bike tune ne. Mesela ez dikarim vê bibêjim Mele Ehmedê Namî pir jêhatî ye di helbestê de. Bi qasî ku em ji helbesta Cegerxwîn têdigihîjin di helbesteke xwe de ya ku lê vedigerîne (li M.E.Namî) wîna dike wek Ehmedê Xanî, yanî dişibîne wî. Ev qedirdayîna Cegerxwîn a ku dide helbestvanekî kurd e. Ji bilî xwe dûrî xwe. Gava ku em bîna mijara nûjentiye erê em tove nûjentiye, bizrê nûjentiye di helbesta Cegerxwîn de dibînin. Yek ji vana kîjan e? Helbesta “Kî Me Ez” e. Helbesta “Kî Me Ez” ji hêla form û deng û ji rîstesaziyê ve ji helbestên Cegerxwîn ên heyî hema bibêje ji gişan cudatir bû. Ev destpêkek e. Mîmkun bû ku xortên li dû Cegerxwîn heman şewaz bi pêş xistibûna. Kiribûna wek ekolekê. Lê çî ye, Cegerxwîn heman şewaz di wê helbesta xwe ya dirokî de, diroka kurdan tev ji qalûbelayê ve pê digirê tîne hetanî roja xwe de bi kar anîye. Jê pêve kê mî zêde em bala xwe didîne ku dev jî jê berdaye. Ev nûjentiye e. nûjentiya ku Cegerxwîn kiriye weke ku me mînakê Namîk Kemal da, di hindurê helbestê de nûjenti pêk anîye. Derve parastîye, çarîn parastîye, malîk parastîne, beyt parastîne. Li gel vê parastîne, ji hindur ve rûxandiye. Wek ku dibêje “Hindur li xwedî xera kir”, hindur li xwedî xera kiriye lê nûjenti jî xistîye. Di vir de tu ji min bipirsî nûjentiya ku di helbesta kurdî de pêk hatiye ya Cegerxwîn e. lê nûjentiya ku mirov bi çavekî rojavayî lê binihêre ez bîm, bi Reşîdê Kurd dest pê dike. Çînkê helbestên Reşîdê Kurd di wê demê de rasterast helbestên Mayekovsky, yên Dadaîstên rûs tîne bîra min. Baş e ez ê niha ji kîjanî re bibêjim nûjen; em ê ji ya Cegerxwîn re bibêjin nûjen an ji ya Reşîdê Kurd re.

Reşîdê Kurd dibe ku Nazîm xwendibe, dibe Konstantîn... (Şairê Bulxar) xwendibe, dibe ku Mayekovsky xwendibe û di bin bandora wan de mabe. Helbestîne spehî nivîsandine. Lê belê gava ku tu li helbesta Reşîdê Kurd a di destpêkê de dinîherî kê mî zêde şewaz şewaza Cegerxwîn e. lê di ber re ji ew uslûp şikandiye û serkeftin heye. Mesele gava min xwend dilê min bijiyayê.

W- *Di vir de piştî ku gotin hat ser Cegerxwîn divê mirov vê pîrsê jî bike. Tevî ku di dema wî de çend kesên din ên navdar hene jî, baş in jî, lê tu kesî weka wî di nav gel de deng nedaye. Yanî gel wekî wî tu kes nepejirandiye, çî xwenda çî nexwenda... Ev çî ye, çîma Cegerxwîn wisa bûye?*

Arjen ARÎ: ev çî ye? Ev, ev e zanî, niha em ê mînakê jî xwe bidin, ne ji xerîban, ji bo ku em karibin bi serxwe ve bîna niha cenabê te ji zane em bîna her seyda ya mela ya jî alimê din piştî temenekî dixwaze tiştê bike. Mesela wê rojê ez li kutupxanekê rûniştibûm min bala xwe dayê ku seydayê Mihemed Emînê... -bila ji min bibore paşnavê wî niha nayê bîra min- viya çî nivîsandiye çî bîjim... lê rastîye heye mewluda ku îro di nava xelkê de tê xwendin, mewluda herî mezin li ber çavê min Ehmedê Xanî ye. Ji bo çî min ev mînak da, ji bo Cegerxwîn da. Di her serdemê de mirovek heye yê ku tofanê radike, yê ku babelîskeke edebî, tevgerêke edebî, dibe serkêşê wê mirovek e, lê yên li dorê jî hene yên li dorê, kes dernayên dûre dûre ew eşkere dibin, mîna ku em bîna taveke biharê ku diferike. Piştî ku tav ferikî em bala xwe didîne em bîna ku di bin sîwana helbesta Cegerxwîn de bi vî awayî gelek mirov hene. Mesela em bîna yê herî dawî berî niha bi çendekê mir; Seydayê Keleş.

W- *Îcar ez werim ser mijareka din. Niha Melayê Cizîrî jî, Ehmedê Xanî jî, Hacı Qadirê Koyî jî yê vana, jixwebawerîye heye mesela Melayê Cizîrî bi vî awayê jixwebawerîya xwe anîye zîman “Ger lûlûyê mensûr ji nezmê tu dixwazî / wer şûrê Melê bîna te bi Şîrazî çî hacet”*

Arjen ARÎ: Hewce nake ku tu berê Şîrazî bixwînî, hema peyva dinê kurt ew e kurmançî ew e.

W- *Gazî û tespîtên Ehmedê Xanî hene, yên H. Q. Koyî jî hene dibêje; “çî kêmasiya kurdî ji farisî heye tu wî dixwînî, wî naxwînî.”*

Jixwebaweriyek heye.

Arjen ARÎ: Camêr gotiye, îdiayek mezin heye, yani îdiaya Ehmedê Xanî ji ya mela jî mezintir e. Dibêje ku; “Ji bonî ku xelk nebêjin kurd bêsl û bêbinyad in, bê kîtab in”. Bala xwe bidê mîna ku bibêje pêxemberê vê edebiyatê ez im. Yanî ev eger mirov rave bike, mirov jî hev veçirîne ya jî mirov wergerîne, mirov bi awayekî din bibêje Ehmedê Xanî ji bonî şîra xwe dibêje “Ez pêxemberê şîra kurdî me”

W- *Ev jixwebawerî çî jî yê destpêkê de, çî jî di yên îro de, yanî di helbesta me ya nûjen de çiqas heye, di helbestvanên me yê nûjen de çiqas heye. Tenê di nav xwe de na li hember dinyayê jî, li hember derûdorê jî ev jixwebawerî di çî rewşê de ye.*

Arjen ARÎ: Ez vê pirsê piçkî girîng dibînim. Heman hêman û bawerî bi Cegerxwîn re jî heye. Lê bi hêman û baweriyê em nikarin bibêjin Arjen Arî jî bi heman awayî tevdigere. Ez navê xwe dibêjim navê kesekî din nabêjim. Ez dikarim bibêjim, lê ez nabêjim. Ev jî ku tê? Ji vê yekê tê. Ehmedê xanî xwe wek giregirekî vê wêjeyê dibîne û pek jî anîye. Gava ku tê hişê me ev raman, ev jibixwebawerî dişikê. Cegerxwîn hew şair bû. Îş û karê wî şîr bû. Gava ku li qehwê rûniştiba jî li ser hişê wî hizra wî helbest hebû. Lê ji bo nîfşên nû ez jî bo xwe jî bi taybetî dibêjim, ji ber ku ez çend kesan nas dikim di vî warî de, yek jê Berken Bereh e, yek jê Rojen Barnas e, yek jê ez im, yek jê Sabah Kara ye, yek jê Mem Ronga ye, min di derekê de gotibû ku taviya 12'ê îlonê bi ser Tîrêjê de nehatibûya, mimkun bû ku ew tevger bibûya Hawareke nû. Mixabin salekê tenê domiya. Û jî min pê ve jî -ez heqê Berken Bereh jî nexwim- kes li van erdan nema. Ez viya bibêjim me di ber jiyana xwe re helbest nivîsî. Em di ber jiyana xwe re bûn helbestvan. Me jiyana xwe li ser helbestê nekir. Şairek ku di destpêkê de nikaribe jiyana xwe ji bo edebiyatê yan ji bo helbestê bişewitîne, agir pêxîne ew dê bibe helbestvanekî dereng.

W- *Mînak Ehmed Arîf, helbesta me ya nûjen li hember Ehmed Arîfê ku bi tirkî nivîsiye li hember wî jixwebaweriyek heye? Bi qasî wî dikare bandorê li ciwanên me, li gelê me, yan jî li civaka me, bike?*

Arjen ARÎ: Niha binihêr ev bû tiştêkî din. Di sala 96'ê de li Med-Kom'ê li Diyarbekirê jî

sed mirovî zêdetir kesî re min ev got, min bala xwe dayê bi baldarî li min guhdarbûn. Û çîrpînî nekete wan wek dilbijokî jî li min guhdarî kirin. “Eger hûn alî me bikin, hûn parikî alî me bikin. -Alîkirin çî ye, alîkirin ew e ku xwendevan parikî bixwînin- hûn alî me bikin ew axa ku Ehmed Arîf û ên wek Ehmed Arîf bi tirkî bi ser we de kirine, soz didin ku em di helbestên xwe de dawêşînin. Mixabin, mixabin. Ew xweşbîniya ku civakê da Cegerxwîn, neda helbesta Arjen Arî, an jî Berken Bereh an jî ya Rojen Barnas... Ji ber çî? Ji ber ku wek mînak ez ê bidim di sala 1903'yan de ev camêr çêdibe -Cegerxwîn, di 23'yan de êdî wî em wek şairekî dibînin di 45'an de diwana wî ya yekem tê çapkirin. Lê tiştêk heye erê di sala 1945'an de diwana wî ya yekem çap dîkin li Şamê, lê çar diwanên Cegerxwîn li nav xelkê belav dibin. Yanî bi gotineke din muridên Cegerxwîn hene. Mixabin muridên Arjen Arî tune ne. Bala xwe bidinê di dema Cegerxwîn de helbestên Cegerxwîn weka payîzokan dibêjin. Weka payîzoka jî deva digihan deva. Ji herêma li herêma digeriyan. Îro mixabin ew qonaxa hanê mimkun e ku me nekarî em bibîne derwêşîni baş ê helbesta kurdî. Ev jî weka pîrsekê derdikeve pêş. Yanî mimkun e ku şair bi xwe weka derwêşê şîra xwe, şîra xwe bigerîne li nav civakê. Mînak ez karim bidim, mesele min dixwest ku xort û ciwan helbestan bixwînin, bendek ji helbesta min, helbestek min, du helbestên min di bîrika em bêjin şexsiyeteke kurd a hindur, a hindur de weke nivîstekê em bêjin veşêrin. Di demeke xwe yî diltengiyê de ya jî dema ku hizr û hestên wî radibûn ser pê wî wextê rahiştê wê helbestê bixwenda kêfa wî bihata li mirovahiya xwe li xwe vegeriya. Lê mixabin ev mînak tune ye. Bi taybetî jî bo bakur dikarim vîna bibêjim. Lê gava mirov vîna hilkişîne başûr, li başûr jî çend heban min pîrsî, ya rast, camêrek mikur hat got “Di dema ku ez li çiyayê Kurdistan pêşmerge bûm şîrên Peşew di bîrika min de bûn lê piştî ku Peşew diwana xwe ya “Birakuji”yê nivîsand min helbestên wî qetand. Bila yên min jî qetandibana, piştî ku min “Erotika” xwe nivîsand bila yên min jî qetandibana, ne mesele bû, lê bila hebûya. Bi vîna ez dixwazim çî bibêjim bala xwe bidîyê, li min biborin, helbesta ku nikare dakeve qadê, nava sed hezaran. Helbesta kurdî piştî 12'ê îlonê min dixwest rahêjim mîqrofonê di şevbihêrkan de jî rûnê, bi qasî

şevbihêrkan di nava civakê de jî rûnêm. Û ya herî girîng jî bo min dîsa ez dibêjim hilnekişîya serê çiyê jî, bi qasî ku daneket kolanan. Heger jî kolanan kişiyaba serê çiyê tu bawer bikî ew ê dîsa vegeyriyaba kolanan. Lê mixabin ez ne bawer im ku jî lawazî, ya jî ji feqîrî, ya jî ji kêmaniya helbestê be, kêmayiyeke gelemperî di vê mijarê de heye.

W- *Em dîsa vegeyriyê ser bingehan, têkiliya wêjeya me, helbesta me ya nûjen bi ya klasîk re û bi ya devkî re -wêjeya me ya devkî, wêjeyê berfireh e- têkiliya bi wan re çawane. Li hember wan çiqas serî hildaye yan jî serhildanek wisa heye an tune ye?*

Arjen ARÎ: Her helbestkar di destpêka ku destê xwe dirêjî pê nûsê dike, helbestê dinivîse serî hildide li hemberî tiştên heyî, yên beriya xwe, hema tiştê heye ev serhildêrî di heman demê de hembêzkirina temamê heyinan be yanî berhemên heyî be yên devkî yan jî yên nivîskî ev serhildêrî serhildêriyeke bi rêkûpêk e. Lê eger serhildêriyeke pihînlêdan be yan jî diserguh re avêtin be. Ew nabe serhildêrî ew encax dikare bibe, em bibêjin jî keriyê edebiyatê xwe veqetandin û gurxwarin. Şiîra kurdî, hûn jî dizanin şîr dengê herî netewî ye, di nav şaxên wêjeyê de. Bi qasî ku dostekî min ê hêja gotiye “Helbest zaroka wêjeyê ye”. Na; Caudwell vîna dibêje ne ez dibêjim; “Maka tevahiya şaxên hunerî bi taybetî yên wêjeyî şîr e”. Ji ber hindê em bibêjin kurdan xwe li helbestê rakişandine, di destpêkê de. Temamê nivîskaran, lê mixabin nikaribûne helbestkariya xwe bidomînin. Ji ber ku peyv hatiye ser peyvê û mijar jî helbest e, ez dixwazim çend mînakê bidim. Weka romanûs -Rehma xwedê lê be- Mehmed Uzun jî xwestibû helbestê binivîse. Lê hew jî ‘Destana Egîdekî’ pêve, -weke destaneke kurt- tu şîrên wî tune ne. Kak Firat Cewerî jî helbest nivîsand. Lê pirtûkeke wî ya helbestan heye. Wî jî dev jê berda. Laleş Qaso jî em bêjin helbest nivîsand. Dîwaneke wî jî heye. Gelek kes pê nizanin. Min dîwana wî jî xwend, romana wî jî xwend, lê min ev jê re got, min got; “Laleş Qaso mala te ne ava ku te ev helbest nivîsand.” Got; “ji bo çi?” min got, ne helbest e. jixwe wa ye te dev jê berdaye. Li vir em avahiya helbesta xwe li ser rûnê ya jî asasên ku yên beriya me ji me re hiştine em bikaribin ava bikin. Ew rûnê destnîşankirî ne. em nikarin helbesta klasîk a kurdî di ser guhê xwe re bavêjin. Em nikarin rûyê xwe ji

çarînên Baba Tahirê Uryan biguherînin. Em nikarin di ser Melayê Cizîrî re biqevizin, em nikarin payîzokên botanê nebînin. Ev tê maneya redkirin û hembêzkirina wan. Gava ku helbestkarekî kurd jî van tiştan dîr be, ji kaniyên xwe dîr be mixabin ne dikare têr vexwe û ne jî bi çemekî boş biherike ber bi deryaya edebiyata kurd, an jî ber bi helbesta kurdî ve. Ez dixwazim mînakê bidim. Îro bi taybetî gava em bala xwe didin ristesazî û dengê helbestê ya Rojavayî ya jî Binxwetîya em bala xwe didinê ku helbesteke di bin bandor û karteka helbesta erebî de mayî ye. Vîna divê ew bikaribin ji hindava xwe ve çareser bikin. Yan na hetanî bi hetayê wê di bin wê bandorê de bin. Gava ku em herine Başûr, li Başûr jî heman qeder an jî em bibêjin nexweşî heye. Başûrî bi xwendina xwe ekl û çêjeke din didin helbestê. Tu ji min bipirsî helbest ew helbest e ku di destpêka nivîsandinê de, di kêlika nivîsandinê de helbestkar kîjan dengî binivîse, dengê ku li helbesta xwe bar bike, ew deng e. Eger dengê dinê lê bê barkirin wê gavê pirsgerêk di navbera helbestê û dengê helbestê de derdikeve.

W- *Di cureyên din de na lê di helbestê de ya klasîk li ber xwe dide. Rewşêke wiha heye. Em carna rastî kesên li medreseyê xwendine tî, ku di helbestê de wezn û pîvan tune be dibêjin ‘ka ev çiyê ev jî helbest e?’ dîsa helbestên kesên ku bi awayê berê dinivîsin gelek caran ne di kovaran de tî weşandin ne jî çapxane çap dikin. Wek berberiyekê xuya dike. Tu vê rewşê çawa dinirxîni?*

Arjen ARÎ: Ji ber ku ez bixwe jî medreseyê nehatime û min medrese nexwendîye, lê gava ku hûn li helbestên min bimêzin hûnê bibînin ku min jî têra xwe ji helbesta klasîk sûd wergirtiye. Sûd wergirtin li hêlekê bendên helbesta Arjen Arî ya klasîk û ya nûjen di gelek helbestan de bi hev ve pîne bûne. Û ya rast ew ne pînekirine, cebirandineke. Min got ku wek mînak min derxistiye pêş. Heman şêwaz di çend helbestên Kek Rojen Barnas de jî tî dîtin. Wexta ku mirov ji cihekî bê mirov nikare bi yek derbekê xwe jê bişo. Çûnkî dawîya dawîn tu di çolekê de bimeşî, wexta ku tu bîyî mala xwe jî tu wê tozê jî tîni mala xwe tu çiqasî xwe jê dawêşîni jî tu nikarî xwe jê baş paqij bikî. Niha pirsgerêka helbesta nûjen û ya klasîk di çavên ya jî di hişê mirovên nêrînteng de mimkun e ku pêk were. Wek



nûjentiyeke ku nehatiye hêçandin, nehatiye bikaranîn, em divê peyrewên wê bin. Wexta me ev bi dest xist wê gavê ew gur, qayîş yan jî berberiya navbera du hêlan ez bawer dikim wê rabe.

W- Ez dixwazim qala regekî din ê wêjeya me ya nûjen bikim. Tê gotin ku wêjeya kurdî ya nûjen bi taybetî jî helbest laîk e. Tu vê nêrînê dipejirînî an na, ku tu dipejirînî sedemên vê yekê çine.

Arjen ARÎ: Bi rastî

mînak beriya niha me got, red, yanî înkâr. Red yan jî înkarkirin di heman demê de hembêzkirin be, qebûlkirina wî tiştî be lê di heman demê de dîsa nerazibûna li hemberî wêna be ew dikare bibe serkeftinek. Lê gava ku yên nûjen ez ê navan bibêjim wek Rênas Jiyan, Kawa Nemir, Lal Laleş helbesta klasîk a kurdî weka helbesteke ku nîn, tune bibînin ew bi xwe jî tune dibin. Heman helwestê mirov dikare ji bo helbesta klasîk a îroyîn jî bibêje. Lê tiştek heye helbesta klasîk, ku îro hinek kes dinivîsin, her mirovê ku dinivîse divê nûjentiyekê bîne vê helbestê. Bi qasî ku Cegerxwîn aniye. Heger helbestkarê helbesta klasîk di xwe de nikaribe nûjentiyekê ya jî xwetiyeke, kesayetiyeke hilde şikil û naverokê, bila li qisûrê mêze nekin helbestê nanivîsin. Ew helbesta heyî didominin di şopînin. Ew ne helbestkar in, xwe dubarekirineke, dubarekirina helbesta beriya xwe ye. Lê gava ku nûjentiyekê bîne wir wê bibe destpêk û dûmahîk jî çunkî dawîya dawîn wê hinek bidin dû şopa wî jî, wê gavê ew mirov dikare bibêje piştî Cegerxwîn min helbesta klasîk nivîsî. Min çarîn nivîsand. Ez jî xwe mînak bidim; piştî 50 saliya xwe min çarîn nivîsin. Lê piştî Baba Tahir bi hezar salî çarînan dinivîsim. Çarînen min ên ku ez dinivîsim heger ne bi qasî Baba Tahir ya jî nêzî wî an jî yên wî bêtir balkêş bin ez neheqiyê li çarînen xwe û yên heyî jî dikim. Divê îlehim ez berê wê bidim nûjentiyekê,

ji min re jî wisa dixuyê. Beriya niha we qala helbesta klasîk kir, îro gelek kesên ku di Nûbiharê de dinivîsin ne sekuler in. helbesta wan jî ne sekuler e, çîroka wan jî ne sekuler e. Gava ku em ji edebiyatê bidin rê qesta me, em bin, em dikevin nava şaşiyekê. Li bakur gava ku em qala şîira kurdî bikin hew şîira ku di nava Kovara Weyê de ya jî di Zendê de ya jî ya Beyê de diweşe em wan şîira tenê weke şîir bibînin, yên din nebînin em xwe jî nas nakin. Yanî neynika ku em lê dinihêrin em bi destê xwe dişikênin. Sekuler e, rast e. lê wekî din jî heye.

W- Rewşeke din ku ew jî ji derveyî îradeya me pêk hatiye welatê me perçe perçe bûye, her komeke me li dereke cihanê bi cî bûye. Êdî îro kurd çend perçe ne mirov nizane. Li her derekê li her perçeyekî nûjeniyek heye. Bandora vê perçebûnê li ser nûjeniya me çawa çêbûye.

Arjen ARÎ: Ez nabêjim perçebûn, ez ê bibêjim perçewerçebûn. Ji bo dahatûya edebiyata kurdî ne ji xêrê re ye. Erê dawîya dawîn em di serdema ragihandinê de dijîn. Zaman bayê bezê ye. Bêyî me bi serê xwe diçe. Wek mînak wa ye di ser 'Erotika' re sal, sal û nîvek derbas bû hê nû nivîskarên li Ewrûpa pê dihesin ku Arjen Arî 'Erotika' nivîsiye. Sê sal di ser 'Gotinên Gunehkar' a Hesênê Metê re derbasbûne Bakûrî hê nû pê dihesin ku Hesênê Metê ew berhem nivîsandiye. Golek bi çemên xwe bi kaniyên xwe dibe gol. Eger jî

Bakur, ji Başûr ev çem bi hemdê xwe ber bi wê golê ve biherîkin tu pirsgirêk tune. Lê piştî ku berhemek li Başûr çap bibe û deh sal şûnde em jê haydar bibin ew kêmasiya me ya wêjeyî ye. Yanî ew seqetbûna wesleyekî me ye. Dibe ku hinek bibêjin tenê ez im edebiyatvan yên din qet ne tiştê in. Bi wî çavî qet lê nenihêrin. Ji bo min her risteke ku bi kurdî bê nivîsandin –bes ku tama wêjeyê jê bê, bi edeb be, bi çêj be, nû be- ji bo min hêjaye pîroz e. Dibe ku gelek kes bi vê hişmendiye tevneger in. Rast e ji ya ber dest bi qasî ku dilê wan dibijiyê jî ev çend dixwazin çêja xwe jî têxine ser, xwe jî bikin dewlemendiya wê, ekleke din. Bi van hest û dilan nivîskar dibe nivîskar, helbestkar dibe helbestkar. Rewşa me ya îroyîn ya perçe perçebûnê bi Xwedê tu xêr bi xwe re neaniye. Ji ber ku em zû bi zû ji berhemên hev haydar nabin. A din tevgerên edebî pêk nehatine. Rast e îro li Bakur helbestkarnê ku mirov ji xwe re bike rûmet, bike serbilindayî hene. Lal Laleş e, Rênas Jiyan e, Îrfan Amîda ye jixwe ez yê navsere najimêrim. Ama rastiyeke heye mirovekî 50 salî ku bi zimanê kurdî çîrokê jî dinivîse helbestê jî dinivîse divê Cervantes bine bîra xwe. Ji ber ku Cervantes di 60 saliya xwe de romanek nivîsiye û ew ê 400 sal e tê xwendin. Gava ku yê me di 50 saliya xwe de ji me re berhemên ku îro jî nayên xwendin û wê sibê jî neyên xwendin dinivîsin bi xwedê tehba herî mezin e. Xwezî kurd bi qasî tirkên di warê geşkirina edebiyata xwe de ne xwedî derfet, xwedî zanebûn bûna. Piştî avakirina komarê ji her hêlî ve berê xwe dan wergerê. Ji bo çi? Îro her berhemeke, her şûreke ku bê nivîsandin ji bo şairekî din neynikek e ku xwe tê de bibîne. Neynikeke ku bi bejn û bala xwe re bejn û bala helbesta xwe jî tê de bibîne.

W- *Ku sibê ro derfetên me çêbibin em berhemên ku li Başûr, Rojava, Rojhilat û Kafkasyayê hatine weşandin binin Amedê –wek vê xebata ku te kiriye, Bakurê Helbestê-gelo wê di wêjeya me de rengê hîn xweser derkeve ortê?*

Arjen ARÎ: Têra xwe. Îro gava ez diçim di hokê min dixwest ku di refikên pirtûkxaneya bedirxaniyan de bi hezaran berhemên ji Rojhilat, Bakur en ji Rojava çapkiri bi tîpên erebî yan bi tîpên latînî ciyê xwe bigirin. Mixabin ez wî tiştî nabînim. Bî taybetî Hikumeta Herêma Kurdistanê an ji saziyên ku li Bakur hene divê karibin pirtûkxaneya xwe ya giştî damezirînin. Ji ber ku ez wekî kesekî ku zêde diçim û tîm ji nikarim hinek berheman bi dest bixim. Eger ev tişt pêk were ne mimkun e ku nebin sedemê geşbûnekê. A din tu jî dizanî em alfabeyên cur be cur bi kar tînin, bi zaravayên cur be cur diaxivin, di rewşeke wiha de gava ku pirtûkxaneyêke ji pirtûkên wan zaravayên me yên cur be cur tune be ku em serî lê bidin, wê gavê em berê xwe didin çi dizanî –ev tespîteke siyasî ye- wê gavê em wek rewşenbîr, wek nivîskar li hêviyê ne ku di pêşerojê de kurdên zaza bi zazatiya xwe bimînin, kurmanç bi kurmançiya xwe bimîni, sorî bi soraniya xwe bimînin ku ew jî perçebûneke cud ye. Ya hişmendiya kurdan e.

W- *Spas, mal ava. Wek gotina dawîyê an jî peyameke te hebe, fêrmo*

Arjen ARÎ: Peyama min ev e; ez jî spasdarê we me ji bo vê firsetê. Sohbetêke xweş çêbû, ez hêvîdar im me tiştinên kêrhatî gotibin. Ez ne bi gotina hinek dostina re me ku dibêjin helbestê miyadê xwe qedandiye. Helbest naqede. Kîngê mirov kerr bûn û mirov lal bûn, mimkun e ku helbest biqede. Lê hetanî ku Ehmedê Xanî hebe û homeros hebe wê bidome. Bi qasî ku duh helbest dengê bindistan bû, di siberojê de mimkun e ku bibe dengê mirovên maqûl, bibe pirtûka ber serê wan. Lê tu ji min bipirsî hê jî karê ku wê helbest li vî welatî bike maye. Ez hêvî dikim tiştê ku me nekiribe nîşên dû me dê bikin.

W- *Spas ji bo we.*

WÊJEYA K'URDÎ LI SER R'ÊYA XWEGUHAR'TIN Û NÛJENBÛNÊ(*)

Ezîzê CEWO

Îro gelek lêk'olîn û gotarên di derbarê wêjeya k'urdî da li holê ne. Her mijarek a her nivîsekê di cîyê xwe da xwedî nirxekî ye, her xudaneke her gotarekê ji hêla xwe va pîrsekê yan k'omek a pîrsan hiltîne dest û anegorî zanebûn û derfetên xwe wan r'avedike. Heya, eger hinek pîrs ji ber dijberiyên xwe, neên p'ejirandin ji, dîsa ew bi t'omerîya nak'okiyên xwe va dibin bingeş, ku mirov gotûbêjekê bike û r'astîyê derxîne holê...

Lê mabesta me li vir tiştekî din e! Ya ku em di vê gotarê da dixwazin li ser biaxivin, ew pîrsa wêjeyê bi giştî ye, û di nav wê da ji pîrsa t'aybetmendiyên avabûn û pêşk'etina wêjeya k'urdî, r'êyên wê yên ber bi xwedîtin, xweguhartin û nûjenbûnê va. Em ê hewl bidin di nav çarçoveya pêşketinê civaka k'urdî da li ser avabûn û pêşk'etina wêjeya k'urdî dîtîne xwe bi giştî binin zimên. Em ê her weha li ser avabûn û pêşveçûna wêjeya k'urd li derveyî welêt r'awestî. Em ê ne ku li ser efrandinê wan yek-du an k'omeke r'ewşenbîrên k'urd r'awestî, ên ku bi neç'arî ji welêt derk'etîne û li derveyî welêt nivîsîne. Na! Em ê li vir li ser wêjeya civakeke k'urd, a ku li derveyî welêt ji wan k'urdan berevbûye, yên ku ji ber siyaseta t'evkujîyê k'oçberbûne. Evê civaka k'urdî li ser bingeş çand û wêjeya zarkî ya net'ewî û anegorî mercên civaka xwe ya li xerîbiyê wêjeyeke nû ya xweser ava kiriye. Ew wêjeya k'urdên Sovêtê ye... Di dawîyê da Em ê hinek nêrînên xwe li ser r'ewşa wêjeya k'urdî ya vê serdemê û weşana wêjeyî bi giştî binin zimên.

Dema li ser wêjeya k'urdî tê axavtin, divê bê zanîn, ku ew wêjeya gelekî bindest û qedexê bûye. Ku, çawa hêzên dagirker û serdest xwestîne gelê k'urd t'ûne bikin, wisa ji her tişt kirine, ku wêjeya wî wek wêjeyeke



Ezîzê CEWO

net'ewekê negihîje. R'asttir dibû, mirov bigota, ewan her tişt kirine û îro jî dikin, ku wêjeya k'urdî çênebe û pêş nek'eve. Wan hewl daye, ku hê di colangê da wê bifetisînin. Ji ber ku, wek ku ziman bingeş nasnameya net'ewê ye, wêjê jî şêwazekî pêkanîna nasnameyê ye di jîyanê da. Wêjê eyna pêşkevtin û dînamîka civakê ye- bi hêlên wê yên erênî û neyînî va. Ew p'ergalek e, bi k'îjanê net'ew dîtî, r'aman û nirxên xwe yên jîyanê, hest û r'amanên xwe bi hunera wêjeyê tîne zimên û bi wî awahî xwe baştir nas dike, dide nasandin û di civaka mirovayîyê ya giştî da net'ewbûna xwe dip'arêze û dide p'ejirandin.

Her çiqas jî em dikarin bibêjin, di dema xwe da serbilindîyên net'ewî yên wek Mela Batê, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Goran, Cegerxwîn û yên wek wan ji nav gelê me derketine, dîsa jî ji bo xatirê r'astîyê, divê bê gotin, ku wêjeya me wek şêwazekî mitalekirina civakî nivîşkan û lewaz maye. Û ev jî, wek ku me li jorê jî got, ji ber wê ye, ku hêzên dagirker û serdest hemû r'êyên pêşk'etina civakî li ber gelê me girtîne. Ji ber ku gelê me bi xwe bindest bûye, r'aman û wêjeya wî nikaribûye azad be. Û eger ji nav gelê me heç'eyên¹ wêjê û r'amanê yên mezin derk'etîne, ewan wek vulkanekê dane der. Ewan ji bin derxûn², ber û zinaran, ên ku dijmin danîbûn ser devê beroşa r'aman û mitala me, bilqîn kirine û derk'etîne r'onayê. Û eger ew mezinayî, yên ku me li jor gotin, derk'etin jî, t'u derfet û r'ê jî bo wan venebûne, ku ew bibin hebûna gel. Ew demeke dirêj ji gelê kurd û cihanê veşartî mane, wek zêr' û kevîrên qîmetî yên bi sedsalan di bin xwelîyê da dimînin.

Em îro dikarin bibêjin, ku heya nîveka sedsala XX yên ku navê wan mezinên me dizanibûn (an bihîstibûn), mirovê bikaribûya li ser tîlîyên destekî bihejmarta. Û ji ber ku di nav civaka kurdî da ew kes, t'û kesî nikaribû bi zimanê dê û li ser bingeha çand û wêjeya net'ewî perwerdeya xwe destbanîne, gelek lawên gelê me, yên ku p'erwerda xwe bi zimanên bîyanî dîtine, bûne hebûn û serbilindîya wan netewan (Baba Tahêr, Nîzamî, Ahmed Şewqî, Yaşar K'emal, Selîm Berek'et û gelekên din). Di dema xwe da r'ojhilatzanê sovêti yê mezin Îosîf Orbêlî hê di nîveka sedsala XX da nivîsye, ku *gelê kurd k'eda xwe kirye nav xezîna şaristanîya cihanî, ku vî gelî di bin navê îranîyan (farîzan), t'îrkan, ereban, ermenîyan da gelek lawên xwe, yên wek helbestvan, sazband (mûzîsîan), serleşker ên bi nav û deng, winda kirine, ên ku îro dîroka wan gelan dixemilînin*.

Belê, gelê kurd k'eda xwe kirye nav xezîna şaristanîya cihanî. Belê, gelek lawên wî dîroka gelên cînar dixemilînin, lê dagirker û serdestan bi her awayî r'ê li pêşîya wan girtine, ku ew nikaribin bi zimanê xwe, li ser bingeha çand û hunera net'ewî pêş bik'evin, ji ber ku... Lê bi t'evî vê jî gelê kurd di nav xwe da hêz û derfet ditiye, ku r'aman û giyana net'ewî di nav wî da venemire. Belkî ev bi t'evgerî nînbûye jî, lê di bingeha xwe ya xwezayî da çand û hunera gelê kurd ewqasî bi hêz e, ku qedexa û t'evkujîyê nikaribûne r'ê li pêşîya r'ûdana çandî û hunerî bigirin.

Dagirkeran wêjeya nivîskî qedexa kirine, gelê kurd ya zarkî kiriye altêrnatîv û bi zargotina gelêrî r'a t'evayî gelek helbest û destaneyên helbestvanên kurd ên sedsalên navîn bi zarkî di nav gel da ger'yane (p'erçeyên destaneya helbestvanê bînav yê sedsala VII, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û yên din).

Di r'ewşeke weha da wêjeya kurdî, bi wat'eya peyva 'Wêje' ya t'am va, nikaribû bigihîştê wê astê, ya ku ji bo net'ewekê tê xwestin. Lê ew toxim û zîl, ên ku di nava sedê salan da hatibûn r'eşandin û gîhandin, bûn bingehe, ku di sedsala XX da wêjeya kurdî vejîyanekê jiyan bike. Guhertinên di cihanê da û p'êla t'evgerên azadîxwaz ên kurdî bi xwe r'a pêwîstîya jinûva xwendin û anegorî serdema nû wat'edarkirina efrandinên klasîkên wêjeya kurdî derxistin holê. Û dîsa jî, ji ber ku di welatê me da her tiştê me yê

net'ewî bi astengî û qedexeyan r'a r'ûbirû bûn, dawîya sedsala XIX, destpêka sedsala XX zanista di derbarê kurd û K'urdistanê da, wêje û çapemenîya kurdî li derveyî welêt r'êyên pêşk'etînê ger'yan (Bexda, Yêrêvan, Qahîrê, Moskova, R'oma, S.- Pêtêrbûrg, Şam û yên din)...

Helbet, her beşekî mijara vesazbûn û pêşvaçûna wêjeya kurdî hêjeyî lêgerîna k'ûr û p'ir'alî ye. Û ji bo wê jî Em ê vê mijarê ji lêk'olînerên wêjeyê yên dahatûyê r'a bihêlin û derbasî ser pêşkevîtin û pêşvaçûna wêjeya kurdî li Başûrê Kavkasîyayê (Ermenîstana Sovêti) bibin.

Eger li herêmên cihanê yên din çapemanî û wêjeya kurdî bi taybetî bi inîtsiatîva r'ewşenbîrên kurd ên di p'enaberîyê da (ên wek Mîr Celadet Bedirxan) pêş k'etîne, lêbelê di Sovêti da r'ewş cuda bû. Beşekî kurdên Kavkasîyayê hê berî sedsala X li vê herêmê cî bibû û êdî dawîya sedsala X dewleta kurd a Şedadîyan, bi navenda Genceyê va, hatibû avakirin (li ser p'arçeyekî wê xakê, ya ku îro Adirbêcan tê navkirin). Lê beşekî din ji dest siyaseta t'evkujîyê ya osmanîyan r'evibû û ji dawîya sedsala XVIII heya destpêka sedsala XX hatibûn herêma başûrê Kavkasîyayê bi cî û war bibû. Û êdî destpêka sedsala XX li vê herêmê girseyeke kurdan jiyan dikir. Eger li Adirbêcanê tenê kurdên misilman diman (û ev jî bû sedem, ku di bin slogana: "Em t'ev misilman in, em t'ev yek in!" zêdeyî nîv milyon kurdên K'omara Adirbêcanê hatin bişavtîn û bûn azerî), lê di Ermenîstanê da wê demê hem kurdên misilman, hem jî yên êzdi³ jiyan dikirin. Destpêka salên 20'î yên sedsala XX li vê herêmê k'omarên sovêti ava dibin (Adirbêcan, Gurcistan û Ermenîstana sovêti). Û anegorî bir'yarên r'êvebirîya Partîya kommûnîst di van k'omaran da ji bo p'arastin û pêşxistina ziman û çandên kêmtewan gavên praktik tîn avêtin. Di K'omara Ermenîstanê ya sovêti da sala 1921'î li ser bingeha tîpên ermenî alfabêya kurdî ji bo kurdên Ermenîstanê û ermenîyên ji herêmên Kurdistanê hati, yên ku bi ermenkî nizanibûn, tê amadekirin. Amedek'arê wê Hakob Xazaryan bû. Navê p'irtûka dersan, ku bi tîpên ermenî hatibû amadekirin "Şems" bû. Peyr'a, sala 1928'an dîsa li vir li ser bingeha tîpên latînî alfabêyeke din ji bo kurdî tê amadekirin (Erebê Şemo û Îsahak Morogûlov). Lê sala 48'an li ser bingeha tîpên

kîrîlî alfabêyeke din tê şûna vê (Hecîyê Cndî).

Û eger bi p'irtûka dersan a sala 1921'î alfabê û çend têkstên xwendinê hatibûn weşandin, bi alfabêya k'urdî ya latînî (ya 1928'an) Zargotina kurdî, p'irtûkên dersan ji bo dibistanan û xwendegêha mamostatîyê ya k'urdî ya Pişkavkasîyayê, r'ojsonameya "R'îya t'êze" û hinek belge û efrandinê nivîskarên kurd û yên bîyanî hatin weşandin. Wê demê r'êvebirîya sovêtî kadroyan ji bo kêmnîet'ewan amade dike, ji bo ku ew di warê p'erwerdeya ziman û wêjeyê, her weha di warê çandê, çapemanî û zanistê da k'ar bikin. Û yên destpêkê, yên ku xwendina navîn û bilind destanîn û paşê wek kadroyên net'ewî di warê perwerde, çand, wêje, zanistê û çapemanîyê da k'ar kirin, ew zar'okên k'urd bûn, ên ku ji ber siyaseta t'evkujîyê ya osmanîyan bê dê û bav mabûn û bi zar'okên ermenîyan r'a di sêwîxaneyan da mezin û perwerde bibûn. Û yên ku bûn pêşîkêşên wêje, zanist û çanda k'urdî ya sovêtî ji ew bûn: Emînê Evdal, Hecîyê Cndî, Casimê Celil, Cerdoyê Gêncî û yên din.

Lêbelê wêjeya k'urdî ya sovêtî hê pêr'a negihandibû xwe bigire û pêş bik'êve, dest bi r'êpr'êtsionên dema Stalîn bû û sala 1937'an gelek binemalên k'urd ji cî û warên xwe hatin k'oçberkirin, saziyên kurdî yên çandî, wêjeyî û p'erwerdeyî hatin girtin. Û evê valayîyê deh salan zêdetir k'îşand. Her sala 1948'an bi bir'yara Partîya Komûnîst û r'êvebirîya Ermenîstana sovêtî Hecîyê Cndî alfabêyek nû li ser bingeha tîpên kîrîlî amade dike. Ev alfabê bi fermî tê p'ejirandin, û bingeheke nû ji bo çand, huner, wêje û p'erwerdeya k'urdên sovêtê tê amadekirin. Û destpêka salên 50 yên sedsala bîstî rojnameya "R'êya t'êze" ji nû va tê weşandin. Dest bi weşanên r'adîoya Yêrêvanê yên bi zimanê k'urdî dibe. Di nav saziya Akadêmîya zanistî da lêk'olînên di warê zargotin, êtnografî (net'ewzanî), ziman, wêje û dîroka k'urdî tînen meşandin. Û ev hemû anegorî siyaseta û berjewendîyên Partîya Komûnîst û Dewleta Sovêtê tê meşandin. Piştî demekê yên ku helbest û ç'îr'okan bi zimanê k'urdî dinivîsin ji nav k'urdên sovêtê dertên. Û

demeke dirêj ji nabihure, di nav Yekîtiya Nivîsk'arên Ermenîstanê da k'oma nivîsk'arên k'urd tê sazîkirin... Cara yekê têgeha "nivîsk'arên k'urd ên sovêtî" dibe r'êalîte. Serokê k'oma nivîsk'arên k'urd Hecîyê Cndî tê hilbijartin, yê ku salên 60'î wê p'eywirê dispêre Kar'lênê Çaçanî...

Eger mirov efrandinên nivîsk'arên k'urd ên wê demê dinihêr'e, dibîne, ku bilî weşana ç'îr'okên gelêrî û destane û ç'îr'okên li ser bingeha wan nivîsî, mijara efrandinên nivîsk'arên k'urd ên sovêtî pesnê Partîya Komûnîst, Lênîn, welatê sovêtî, çîya, deşt û zozan, bajar û wargehên wî, hêza Art'êşa Sor, lehengîya leşkerê sovêtî, dostaniya gelên sovêtê û cîhanê, k'ar û destaninên k'arker û gundîyên sovêtê û tiştên din bûn.

Di nav wêjeya k'urdên sovêtê da cîyekî bi r'ûmet wergera efrandinên nivîskarên r'ûs û yên gelên din girtine: Pûşkin, Lêrmontov, Çêxov, Gogol, Taras Şêvçenko, Gorkî, Ostrovskî, Mayakovskî, Şoloxov, Sayat'-Nova, T'ûmanyar, Îsahakyan, Çarênt's, Fîrdûsî, Xeyam, Nizamî, Şot'a R'ûstavêlî û gelekên din. Û xwendevanên k'urd bi zimanê dê efrandinên nivîsk'arên gelên din jî dixwînin.

Ji salên 60'î êdî hinek nivîsk'ar t'ematîka zargotina k'urdî jî ji efrandinên xwe r'a

dikin bingehe: "Ker' û K'ulik", "Memê û Zînê", "Dimdim", "Xecê û Siyabend", "Memê û Eysê" û yê din. Cara yekem bi weşana p'irtûka Ordîxanê Celil a "Poêziya Cegerxwîne bajarvanîyê" helbestên hostayê wêjeya net'ewperwerîya k'urd, digihîjin k'urdên Sovêtê.

Salên şêstî êdî piştî r'exnekirina siyaseta serdema Stalîn r'a di Yekîtiya Sovêtê da hinekî bîna azadî û dêmokrasîyê tê. Û êdî ne ku t'enê afrandinên klasîkên k'urd (Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û yên din), her weha yên Cegerxwîn, Osman Sebrî û yên din di pirtûkên dersan ên dibistanê da tînen weşandin. Di efrandinên helbestvanên p'êla dudîyan da (Şikoyê Hesên, Fêrikê Ûsiv, Mîk'ayêlê R'êşîd, Egîtê Şemsî, R'izalîyê R'êşîd

Nivîsk'ar û
r'onaydarê ermenî
yê sedsala XIX
Xaçatûr Abovyan
di dema xwe da
nivîsiye: "*Her
mêrekî k'urd, her
jineke k'urd ji
r'oja bûyîna xwe
va bi r'uhê xwe
helbestvan in.*"

û yên din) êdî t'êma k'urd û Kurdistanê, evîna welêt, pesnê keça kurd û lehengîya şer'vanên azadîyê dibe nîrxê wêjeyî yê herî giranbuha.

Piştî vegera ji sirgûna siyasî salên 60'î Erebe Şemo ji digihîje r'efê nivîsk'arên k'urdên sovêtê û bi naver'ok û zimanê efrandinên xwe yê sade r'engê xwe dide wêjeya k'urdên vê herêmê. Hinekî dereng dest bi ç'ir'oknivîsiya Şehîdê Îbo, Wezîrê Eşo, Emerîkê Serdar û yên din dibe. Eger mirov weşanên wêjeyî yên destpêkê û yên salê 70 û 80'î dide r'ex hev, dibîne, k'a wêjeya k'urd a vê herêmê çawa bi k'ar û k'eda r'ûspîyên wêjeya k'urdî yên destpêkê va gihîştîye r'adaya xwe ya salên 80'î.

Di nav wêjeya k'urdan a serdema Sovêtê da wêjeya wergerî cîyekî girîng digire. Dibe ku yek ji hêzên sereke, yên ku wêjeya her net'ewekê dikin wêje jî, ew e, ku efrandinên wêjeya gelên cihanê yên cuda tînan wergerandin û weşandin. Û sert'acên wergera k'urdî ya herêma Sovêtê jî efrandinên nivîskarên ermenî Sayat'- Nova, Hovhannês T'ûmanyar, Avêtîk' Îsahakyan, Hraçya Koçar, Çarênt's û yên din bûn.

Helbet, her janreke cuda ya wêjeya k'urdî ya sovêtî (helbest, ç'ir'ok, r'oman, werger) dikare bibe mijara lêgerînên serbixwe, lê me dixwest, ji vir û pê va çend gotin li ser pirs-girêkên wêjeya k'urdî banîna zimên- bi giştî, li ser r'êya wêjebûnê.

Belê di nav me da nivîs p'ir' in, heya gelek p'irtûkên stûr ji hatine û tînan weşandin... Belê, p'irtûk pir' in, lê wêjeya me, hê gelek maye, ku xwe bigihîne asta pêwîst.

Çima?

Çima, em bibêjin, di nav me da r'omaneke li ser r'adeya "Memedê zirav" ya Yaşar K'emal t'ûne ye. Êdî em di derbarê efrandinên nivîsk'arên wek Hyûgo, Balzak, Tolstoy, Drayzêr, Şoloxov, Hêmenûgûyê û yên din da nabêjin. Çima? - Dema ez nivîsên nivîskarên biyanî yên bi net'ewa xwe va k'urd dixwînim, bi dilêşî vê pîrsê didim xwe û bersîvekê digêr'im, ya ku bikaribe r'astîya wêjeya me derxîne holê...

Îro "nexweşîya tişteke nivîsandin û weşandinê" di nav beşekî gelê me da (r'ewşenbîr-ne r'ewşenbîr, xwendî-nîvxwendî, an nexwendî!) belav bûye. Ji bo xatîrê wê, ku tişteki bi navê xwe biweşînin, wê her tiştî bikin. Hinek li vir

dikarin xeyd û gazinên xwe bidin xuyan: hem yên ku bi r'astî nivîsk'ar in, hem jî yên ku hezarê kilomêtran ji wêjeyê û wêjenivîsiyê dûr in. Helwest li hemberî vê çawa dibin, bila bibin, lê r'astîya me îro ev e. Û sedemên vê r'ewşê yên obyektîv û sûbyektîv hene. R'ojekê divê em di nav xwe da wêrekîyê bibînin û r'astîya xwe bibînin û ji hev r'a bibêjin- ew çiqas tel dibe, bila bibe.

Yek, ya ku wêrekîyê dide ên dûrî wêjeyê, ku ew ç'epilan hildin û bik'evin govenda wêjeya k'urdî û vîalî-wîalî p'ê li nigên derdorên xwe bikin, ew e, ku:

Perwerdeya bi zimanê k'urdî bi sistêmi tune bûye û îro her k'urdek zimanê biyanî û serdestan ji zimanê xwe yê dê baştir dizane (bêguman, ev yek bêht'ir tragêdî û ne ku gûnehê wan e);

Nexwendîtiya zimanê k'urdî, ya ku bi diroki di nava me da bûye "desthilatdar", hê jî serdest eû yên zane û nezan di warê nizanbûna zimanê kurdî da weke hev dibin;

Gelê me heya vê dawîyê bi sê alfabeyan dinivîsi û dixwend (ew jî wey li wê nivîsîn û xwendinê!);

Pirsgirêkên alfabeya heyî, ner'ûniştîbûna qanûnên r'astnivîsandin û r'astaxavtinê di r'êzimana k'urdî da, ya ku dibe sedem, ku mirov nikaribe bi k'urdî r'ast binivîse û bixwîne⁴;

Di nav me da înstîtûta (sazî) r'êdaktekirina p'irtûkan, ên ku tînan weşandin, nîne û nebûye çanda weşanên me: kî çawa dinivîse, nivîsa wî wisa jî tê weşandin;

r'exnegerîya wêjeyî di nava me da negihîştîye û nebûye çandekê ;

Dibe ku mirov bikaribe di sê r'êze sedeman bîne, lê ev jî bes in, kû têbigihîjin, k'a divê çî di nav nivîsîn, xwendin û wêjegerîya me da bê guhartin, ji bo ku wêjeya me bibe wêje.

Wek ku tê zanîn, wêje jî bo wê tê nivîsîn, ji bo ku hinekên din bixwînin. Wek ku hozan û dengbêj hewceyê bîneran û guhdaran in, ji wan hêza xwe digirin, wisa jî nivîsk'ar hewceyê xwendevanan e... Ji bo ku xwendevanên me hebin divê yên ku bi k'urdî bixwînin hebin. Û ev yek divê girseyî be- li seranserê welêt. Wek ku me li jorê jî anî zimên, dewletên serdestî Kurdistanê ne ku merc û derfetan ji bo pêşk'evtinên weha diefirînin, berovajî vê,

her tiştê ku ji destê wan tê, dikin, ku gelê me di tariyê da bimîne. Di vê r'ewşê da k'î divê îro bi vê peywîrê r'abin? Sazî û r'êxistinên me, k'om û k'omeleyên me yên civakî û çandî hene, çapemenî, rojnamegerî û weşanên me hene. Yêkîtîyên nivîsk'ar, hunermend, mamosta û r'ojnamegeran hene. Dawîya dawîyê û ya sereke, malbetên k'urd hene. Zimanê dê mercê sereke yê hebûna her net'ewekê ye. Eger zanebûna zimanê dê bibe norma jîyana civaka k'urdî, eger zanebûna zimanê k'urdî, bi wî nivîsandin û axavtin, bi wî stran û girîn, bi wî jiyankirin û xewndîtin bibe mercê hebûna me ya net'ewî, wê demê hem xwendevanên wêjeya k'urdî, hem r'exneger, hem jî pişgirî û pêşvebirên wê bi xwe wê ji nav gel derên.

Lê naha çawan e? Ji ber sedemên jorgotî wêjeya me di nava çarçoveyê teng da digere. Û ev yek ji hêla xwe va bûye sedem, ku îro gelek p'irtûkên ji hêla çawanîya çapê va xweşik, lê ji hêla naver'okê va lewz û nimz her'in destê xwendevanan. Û ev jî dibin sedem, ku xwendevanên zane û aktîv (ji hêla zanebûna zimanê k'urdî va) bi girseyî di nav civaka me da p'ir' kêmbûnê hebin- heya asta t'ûnebûnê. Ji ber van hemûyan jî wêjeya me neç'ar, bêhêz û nivîşkan maye. Ên ku dinivîsin an nikarin, an jî di nav xwe da wêrekîyê nabînin, ku hev r'exne bikin: Lê, eger!... -her yek weha mitale dike û hevsa xwe dike. Û ji ber wê jî têgeha "r'exne" di nav wêjegerîya me da heya îro cîyê xwe negirtiye. Rexne motora pêşketina her hêlên civakê ye, her weha- ya wêjeyê jî.

Eger r'exne û r'edaktekirin di nav jîyana wêjegerî da bibin çand, wê demê em ê bikaribin bibêjin, wêjeya me bi qanûnê wêjegerîyê û wêjeyanîyê dimeşe û wê di dema xwe da ber bi wêjbûn û nûjenbûnê va her'e.

Me li jorê jî anî zimên, *wek ku ziman bingeha nasnameya net'ewê ye, wêje jî şêwazekî pêkanîna nasnameyê ye- di jîyanê da...* Bi awayekî din mirov dikare bibêje, *wek ziman bingeha nasnameya net'ewî ye, ew her weha bingeha wêje, çand û hunera net'ewî ye jî.* Ango, bi gotineke din, ziman ew matêriyal e, bi k'îjanê wêje tê hûnandin û saz dibe. Wek, mînak, eger mirov ji kevirên gucoce yên nedat'er'işandî û bêcûr'e xaniyekî ava bike, ew kevir ji hêla çawanîya xwe va çiqas baş bin jî, yek e, ew xanî wê wek wî xanîyî bedew û k'aw nîn be, yê ku bi kevirên dat'er'aştî û

r'astkirî hatibe avakirin. Ji vir jî jêdera-zimanekî xweşk û şêrîn mercê wêjeyek a xweşik û şêrîn e.

Di jîyanê da her tişt bi hev r'a di nav p'ewendîyeke dialêktîk da ne: bi zimên wêje ava dibe, lê bi wêjeyê gel fêrî paqij, rast û xweşik axavtina zimanê dê dibe... Lê ya me çawan e? Wek ku me li jorê jî got, gelê me bi zimanê xwe perwerde nedîtiye, mercên dîrokî nehiştine, ku zimanê me bigihîje pîvanên zimanê wêjeyî, ji bo wê jî di nav axavtina gelê me da gelek çewtî dertên holê. Mînak, şûna ku bibêjin: "Tu k'uda diçî?" dibêjin: "Tu k'uda diçe?" Wisa jî li şûna: "Dayka mine delal!" dibêjin: "Dayka minî delal!", şûna "P'irtûka here balk'êş" dibêjin "P'irtûka herî balk'êş"... Mînakên weha mirov dikare dîsa û dîsa bîne. Lê ji bo mînakdayînê ev jî bes in⁵. Û eger di nav gel da bi çewtîyên weha bê axavtin û nivîsk'ar jî di ser heman da çewtîyên xwe jî zêde bike û li gel veger'îne, wê demê çi cudayî di nav gelê sade û nivîsk'ar da heye? Wê demê- nivîsk'arî ji bo çi ye? Gel zimanê xwe bi r'êya wêjeya xwe paqij, bi r'êzimanî r'ast û xweşiktir dike...

Janra (şêweyê wêjeyî) r'omanê ya nivîsê merc û pîvanên xwe hene. Belê, yek ji wan pîvanan jî pir'r'ûp'elbûn e, lê ev t'enê t'êrê nake, ku mirov nivîsekê r'oman nav bike... Van salên dawîyê li welêt û dervayî welêt gelek pirtûkên k'urdî tîn weşandin -ç'ir'ok, helbest, r'oman.... Û ev yek ji hêla çêbûna derfetan va mirov dilxweş dike, lêbelê... Belê, ji wan nivîsan hinek ji hêla naver'oka xwe va p'ir' balk'êş in, lê wek matêriyalê jî bo weşanê p'ir' xav in, wek hevîrê şkeva. Û sedema vê ya sereke jî ew e, ku di weşanên k'urdî da ew nivîsana bê r'edaktekirin tîn weşandin... Lêbelê, wek ku cêr'ibandina gelên şaristanî dide xuyan, ên ku berhemên wêjeyê digihînin asta weşandinê (ya jî bo xwendevanên xwendî) zanebûnên zimanê wêjeyî, r'edaktor, ser'er'astger (korrêktor, tesîsker) in. Heya, yên ku efrandinên nivîsk'arên navdar dikin efrandin jî, ew k'edkarên wêje û weşanê ne, yên ku îro, sed heyf, di nav me da wek "çîna" weşangerîyê nînin...

Her çi jî hebe, em bi hêvî ne, ku dem û zeman wê bîn guhartin, wê welatê me jî wek ên xelkê r'ojekê azad be, bibe welatê xwendîtiyê, wê di nav gelê me da ne ku t'enê nivîsk'arên xwendî, her weha xwendevanên xwendî p'ir' hebin, wê xwendina wêje û

çapemeniyê bibe çandeke civaka me ya bi nirx, weşangehên me jî wê tenê r'ola çapxaneyan nelizin, û em ê her p'irtûkek a nûweşyayî hildin destê xwe û li dawîya wê bixwînin: r'êdaktorê weşanê yê sereke: *ev mirov*, r'êdaktorê bedewetîyê: *ev mirov*, r'êdaktorê çapê: *ev mirov*, korrektor (serer'astger): *ev mirov*.

Wê demê bi r'astî çawanîya p'irtûkên me wê li ser asta pêwîst be...

Li şûna peynivîsarê

Nivîsk'ar û r'onaydarê ermenî yê sedsala XIX Xaçatûr Abovyan di dema xwe da nivîsiye: **"Her mîrekî k'urd, her jineke k'urd ji r'oja bûyîna xwe va bi r'uhê xwe helbestvan in."** Belê, her k'urdek dikare van gotinan piştrast bike. Hemû jî baş dizanin, dema k'urd dik'evin govendê û distrên, ew dikarin bi dehan katan gotinên nû bisêwirînin û li hev vegerînin, wisa jî kalik û pîrîkên me şevên zivistanê yên dirêj li ber keviya tendûrê ç'ir'okên nû li hev dihûnan û ji me r'a digotin. Îro jî jin û mîrên k'urd li ser mirî dibêjin û dinivêjin û ji bo her mirovekî mirî hema li ber darebesta wî, bê amadek'irî anegorî wî disêwirînin û dibêjin. Belê, ev t'aybetmedîyeke gelê k'urd e. Belê, bi r'astî, her k'urdek bi r'uhê xwe helbestvan e. Lêbelê -t'enê bi r'uhî. Lê helbestvanî û nivîsk'arî tiştekî din e, ji bo helbestvanîyê r'ewş û mercên din pêwîst in- bi taybetmendîyên mirov ên efrandariyê, bi zanînen deremên qanûnên wêjeyê û nivîsk'ariyê û ya sereke zanebûn û bikaranîna zimanê wêjeyî va...

NASÎ

1. Heç'e- serê ç'îya yê bilind, yê ku di nav ewran da tê xêlikirin û wînda dibe, û her kes nikare xwe bigihîne wan bilindayan. A, ji wan mirovan r'a, yên ku di nav zanist, wêje, çand û hunerê da digihîjin destanînen bilind û mezin, bi wat'eyî dibêjin Heç'e, ango, bilindayî, ya ku ji her kesî r'a li hev nayê xwe bigihîne.

2. Derxûn- devgîrk (qalpax) ê dîzan ê ji xwelîya kaxçîn çêkirî.

3. Îro di çapemanî û weşanên me da bi şaşî navê ola kevnar ya gelê k'urd wek "ola êzîd" dinivîsin û wan k'urdan r'a, yên ku vê olê dip'arzin, "êzîdî" dibêjin. Divê bê zanîn, ku navê vê olê Êzdî ye, ne ku- Êzîd. Navê ola Êzdî yek ji navên Xwedê ye. Di qewlekî ola Êzdî da tê gotin: "Hezar û yek navên Xwedê hene, Êzdî jî navekî Xwedê ye!". Her navekî Xwedê

tê r'avekirin: P'eyva Êzdî ji p'eyver'êza "Yê ez dayî" tê. Paşê, hê dereng, ev p'eyverêz di axavtina zêndî da hey hatiye gotin û di wê da guhartin çê bûne, p'eyv jê weriyane, gihîştine hev û ew bûye peyvekê. Peyverêza "yê ez dayî" bûye Yêzdî, ev jî ji hêla xwe va bûye Êzdî (Êzdî <êzdayî<Yêzdayî<yê ez dayî). Hê jî di nav hinek beşên êzdîyan da ji êzdîyan r'a dibêjin ezdayî...

Lê peyva "Êzîd" ji navê Yêzîd bîn-Maewî tê, yê ku ji eşîra ereban a Qurêşîyan e, pismamê Mihemed P'êxember ê dûr e, yek ji Xelîfê (Sultan) cîhana îslamê bûye. Yezîd (an, wek yên êzdî wî nav dîkin, Sult'an Êzîd) kur'ê Maewî bîn Ebî – Sifyan e. Berî Êzîd (Yezîd) xelîftî di dest malbata P'êxember da bûye. Ji vê malbatê Elî xelîfê 4'em ê dawîyê bûye. Tê gotin, ku kuştina wî bi destê maewîyan çê bûye. Hesenê kurê Elî, tê jehirdadaykirin, ê dinê-Huseyn û hemû malbata wan, bi giştî 22 kes, li K'erbelayê ji hêla Êzîd va tên kuştin. Û bi vî awahî, dawî bi desthilatdariya malbata P'êxember tê û pismamên wan ên dûr- meawîyan, desthilatdariyê hiltinînin destê xwe. Û Êzîd dibe Xelîf (Sultan).

Û k'a gelo çawa p'arastina têgeha "Sult'an Êzîd" derbazî nava ola Êzdî kirine, divê hê bi zanistî bê r'avekirin. Dibe ku ev piştî hatina Şêx Adî bûye, ji bo ku êzdîyên ji t'evkujê filitî biparêzin, an...? Dibe, ku îro zanist ne amede ye, bersiva van û pirsên din bide, lê îro mirov dikare bêguman bibêje, ku t'u grêfteriyek di navbera navê ola kurdan a kevnar Êzdî û navê Sultan Êzîd da nîne.

4. Li ser pirsên alfabê, r'êzîman, r'astnivîsandin û r'astaxavtinê di dema xwe da me gotar weşandine û konfêransên zanistî da pêşk'êş kirine. Beşek ji wan gotaran li ser malp'era PENa k'urd hene- www.pen-kurd.org ("Bingeheke zanistî ji bo p'erwerdeya zimên", "Hinek nêr'în û r'aman li ser p'ergala zimanê k'urdî û zimanzanîyê" Dîsa li ser pîrsa alfabê" û yên din- www.kor-damad.yahoo.com).

5. Li ser vê mijarê her weha nivîsa xudanê vê gotarê ya "Bingeheke zanistî ji bo p'erwerdeya zimên" binihêr'e (www.pen-kurd.org).

Têbînî

⁽¹⁾Li ser daxwaza rêzdar Ezîzê Cewo me dest nedaye nivîsê û sererast nekiriye. (Redeksiyona Kovara W)

Wêjeya Kurdî

Behlûl ZELAL

Her çiqas ku dema dibe qala wêjeya kurdî; hin kes dibêjin “wêjeya kurdî, kevn e, klasîk e, berhemên xwe yên mezin hene” jî, mixabin wêjeya me ne di qonaxa demê de ye. Weke gelek aliyên kurdan, ev alî jî hîna pêçek e. Hîna hemû damarên jiyanê di rihê wêjeya me de negeriyane. Dawa me hîna pir tije ye û dilê me nola tenûra ku bi darên berûyî pêketiye, sincirî ye.

Her çiqas ku her yek ji wêjevanên me yên klasîk xwediyê berhemên heja bin jî mixabin bi qasî tiliyên du destan in. Mixabin, ku dîsa qal bû “E. Herîrî, F.Teyran, E. Xanî, M. Cizîrî, Cegerxwîn, N. Zaza, O. Sebrî, C. E. Bedirxan” û her weha bi qasî du caran li vana jî nivîskarên nûjen. Ji vê û pê ve tiştekî ku em bikaribin qala wê bikin heye gelo? Yan jî kom û ekolên wêje û wêjevanên kurdan ku mirov dikare pê mijûl bibe hene gelo?

Em dizanin, di van şert û mercên ku kurd heta roja îro jiyanê de, ev ên heyî ne hindik in, ev tiştekî din e. Lê gava ku em werin ser mijara ku gelo dê çawa û bi çî rengî wêjeya kurdî geş û xweş bibe, dê çawa wêje têkeve jiyanê gelê kurd û bi vî awayî wêje, bi ziman, çand û jiyanê gelê kurd re bibe weke goşt û hestî, hingê divê hin tiştinê din jî di ber mijara wêjeyê de bêne axaftin.

Hetanî zimanê kurdî nebe zimanê perwerdehiyê û jixwe bi vê riyê jî zimanê jiyanê, geşbûn û pêşketina di wêjeya kurdan de dê ne pêkan be. Bingeha wêjeyê ziman e, piştî xwînê in, piştî



Behlûl ZELAL

rexnegir in, bi tevayî gel e. Ku berhemên hatin nivîsandin neyîne xwendin û rexnekirin, jixwe geşedan jî, pêşketin jî ne pêkan e. Bikêrî û afirîneriyên awarte ne tê de, wêje bi xwendin, rexne û nivîsandinê geş dibe. Xwe rast dike, pirsgrêkên xwe çareser dike.

Bêguman, bi riya wêjeyê di navbera rabirdû, îroyîn û dahatûyê de jî pêwendiyê rast tê danîn, pireke pihêt tê avakirin. Bi riya wêjeyê, dirok, her tim zindî ye û watedar e. Li ber çavan raxistî ye, zû bi zû dubare nabe ku bobelatên xopan jî dubare nebin. Ligel vê wêje, çand û toreyê jî di dirokê de bi cih dike. Ango ji bîr jî nake, diji” lê nû jî dike. Jiyanê xweş û rast şîrove dike, bi hemû navgîn û rêbazên xwe radixe ber çavên girtî û vekirî. Yên girtî vedike, yên vekirî jî vekirî dihele.

Ji bo vê yekê çî wêje çî ziman be, çî jiyan çî çand be, çî civakî çî aborî be; mifteya hemû pirsgrêkan, bidestxistin û bi serketinên qada siyasî ne. Hemû mijar diçin di xala hebûn û tûnebûnê de zîq radiwestin. Bo vê yekê ji bilî têkoşîna bidestxistin û bikaranîna mafên neteweyî yên hemdem, yên mirovahiyê; huner jî, wêje jî û her weha tu tişt jî qadeke xwe ya jiyanê bi dest naxe.

Sêbareyeke Evînê

Azad RONAĞBAR

Tê bîra te, min ji te kevçî xwestibû ji bona tevdana çayê, ji ber ku kevçikdanîna şûşa min ji bîra kiribûn... Te kevçiyê şûşa xwe derxistibû, çaya min tevdabû û bi kena xwe ya nazenîn, ku min diheland li min nihêribûyî...

Tu dîsa çûbûyî li ciyê xwe rûniştibûyî, kevçiyê te di şûşa min de mabû... Ji wê rojê pê de ew kevçî li ber dilê min şirîn bûbû; min nedixwest ji min pêştir kes çaya xwe bi wî tevbide, gava bi xeletî diketa şûşa yekî/ê din jî, min hesûdiya wî/ê dikir; her wekî ku li ber çavên min ji destê te digirtin.

Şeveke xweş bû, şeveke gelawêjê, şeveke germ bû, şeveke pir xweş bû; em çend heval - li mala me- li gel hev civiyabûn; tu, ez û hevalên din, her yek di destên me de piyanên vexwarinan hebûn. Di zehfên piyanan de vexwarinên bi alkool û yên çendan de jî vexwarinên bê alkool hebûn û ya te jî bê alkool bû. Gava min gotibû; "Firtekî ji piyana min venaxwî?" Li rûyê te dîsa ew bişirin, bêtî gotinê tu rabûyî û te bi wan tiliyên zirav û nazik rahişt piyana destê min û te levên xwe hingavtibû piyana min...

Gava te piyan li min veğerandibû, hîna îfadeya rûyê te tîrş bû, lê di wan çavên te de wekî her wextî ew kena ku meriv dîl digirt û dibire welatê xewnan; welatê xewn û xeyalên ku dibûn sedema xwewendakirina însên. Lewre di rêya veğerê de ez dibûm Mem, dibûm Mecnûn...

Min piyan ji destê te girtibû û li şûna devê te geriyabûm, gava ez bi ser şopa lêvên te ve-bûbûm, bêsêbir lê bi awayekî giran û hêdî min piyan biribû ber devê xwe; ew lêvên te bûn di navbera lêvên min de yên ku min bitebat ditamijand, ya ku min bi diranan bêtebat dişidand...

Min qet negotibû te "Ji te hez dikim". Bes Aragon di ciyê min de gotibû te...

Ew fersenda me ya yekem bû ji bo soh-

beteke wisa dûr û dirêj. Hemû bêjeyên te bi-jarte bûn, libek tunebû ku ji rêzê be; û ew hevokên ku ji wan dihatine pê, mîna stranekê bûn, mîna straneke ku min ji mêt ve nas dikir û di wan rojan de ji bûbû hesreta min...

Bi hevokên xwe em diketin nav hev û din, me hev û din bêhtir nas dikir! Wê strana bêhempa em gihandibûn berê sibê...

Tê bîra te?..

Min qet negotibû te "Ji te hez dikim..."

Bes Aragon di ciyê min de anîbû zimên.

Te dizanibû ku ev çend sal in ez bi wê re me; heta rojekê di rê de hûn pêrgî hev hatibûn û demeke xweş bi hev re meşiyabûn; gava wê qala vê lihevraştatinê kiribû jî, wiha gotibû "Wê pîrsa tekiliya me kir ji min û got, hûn ji hev pir hez dikin, ne wisa?"

Li gel ku te baş dizanibû, te dîsa jî xwe nedida paş.

Jixwe ew bû, li pişt xuyakirina wê ya hişk de keçikek wisa saf hebû ku ji tu tiştî şik nebiribû.

Tê bîra te...

Te bi wan bêje û hevokên bijarte her ku diçû ez bi xwe ve girêdidam; her ku ez bi te ve dihatim girêdan ji tekiliya xwe ya ku li salan belav bûbû bi dûr diketim.

Lê te qet negotibû min "Ji te hez dikim." Eger ew bersiva te ya dîsa ji devê Aragon neyê hesibandin.

Tê bîra te; her ku diçû ez ji wê dûr diketim, bi hewldanên te...

Lewre ew nûgihiştî bû, serboriyên wê tune bûn; hema çi tiştên wê hebûna hemû di yek carê de didan; her car bi hemû spîtayiya xwe dihat û radestî şevên min ên tarî dibû. Lê tu, tu nedişibiyayî wê; serboriyên te hebûn, razên te, alên te yên xewle û xefkiri hebûn, te karê xwe baş dizanibû; li gor seyda xwe tevdigeriyayî.

Tê bîra te her ku ez ji wê bi dûr diketim, bi wê hesta ku her ku dilê min dida ber xwe min dibehcand û min difetisand bêhtir dihesiyam... Û her di wan caran de jî min xwe bi west û bi hewcedariyên (pêdiviyên) mêtî birindar berdida paşla te. Min got hewcedarî, erê; hewcedariyên sade lê girîng; hewcedariya çend peyvên û gotinên bijarte, hewcedariya

kefa destekî ku dê hinekî li nav poran, hinekî li ser çû bigere, hewcedariya bêhneke germ a gwîna ku di çend deqeyan de min bi ser xwe ve dianî, lê difesilim (pê dihesiyam) ku ez dijîm; tenê bi şidandina milan, bi hem-bêzkirineke jidil...

Tê bîra te, ew êvara ku cara yekem bû ez li kargeha te li te bûbûme mêvan?

Te çi sûsek dabû xwe; serçavê te, dêmên te û lêvên te bi rengên vekirî hatibûn diyarkirin. Ew reng, ew rengê ku li ser wan lêvan bû ew diyartir û kêşwer kiribûn...

Tu dizanî, di wê êvarê de bû ew germahiya ne diyar a ku di hundirê min de ber bi dilê min ve gêr bûbû.

Tê bîra te ew demên ku me li ser wan xebatên xwe serî diêşand?

Te bêje û hevokên min, min xêz û rengên te dinirxand û dipesinandin. Tew gava ku tu li ser min qor dibûyî bêhna bihuştê ji te difûriya, her ku tîlên porê te li rûyê min

diketin ez bi med û cezîrên li qeraxên şetûyîne berbiba dibûm.

Heye ku neyê bîra te jî, bi dengêkî ku tevli dengê pêlan dikir te gotibû; "Tehma şîrîn a nîvcohiştinê li ser jahra dawîanînê de ye..." Pişt re, te ez di wî xopanê li qeraxeke Gola Wanê de hiştim û tu çûyî. Çûyîn ...Çûyîna te...çûyîneke ku berdêla wê giran bûbû; bextewarî ji wê jî, ji te jî, ji min jî rû badabû.

Ne ez, ne tu, ne jî ew li mirazê xwe rast hat...

Em jî tevli endamên sêbareya bextreşiyê ku wek pîramîdekî bi kemînan hatibû lêkirin, tîketina wî hebû lê derkatina wî tune bû, bûbûn.

Û dê her û her reşkirin û rêzikên min, newa û stranên wê, pêşnûma û nîgarên te wê di bin(ê) siya vê sêbareyê de bi(mîni)n...

azadronakbar@yahoo.com


PÎREJIN

Memê Şivan

Ez di ber kuçeyeke teng û tarî re derbas bûm. Dengê ji kuçeyê hat. Ez sekinim. Min bala xwe dayê. Zilamekî ûrmezin ku di destê wî de gopalekî stûr heye, daye pey pirejinekê. Qîrîna jinikê diçe erşê ezmên. Çend kesên ku li derdora kuçeyê ne, hatin temaşa wan. Zilamê ûrmezin piçekî fihêt kir. Gopalê destê xwe ber xwe de anî û çû mala xwe. Jinika reben jî xwe gihande cîranan da ku derdê xwe bo wan bêjît.

Çavê min bi jineke din a ku li ber dîwarê kuçeyê rûniştî bû ket. Serê xwe nîmiskiye, fistanekî kevn li ber e, li piştê wê jî şalek girêdayî ye. Poşîyeke rengomengo girêdaye. Pêlavên naylonî li ber pêyên wê ne. Çavên wê li ser wê sêniya li ber deflîngê wê de ne. Min baqnotek avêt sêniya ber wê. Gava ku min pere avêt, dengê jê hat. Ez recifim. Çavên min tarî bûn, destê min hat ber rûyê min. Dîsa deng hat: "Çavên xwe veke!" Ez gava çavên xwe vedikim, ez li ber dîwarekî me û pirejinek ji dûr ve berê xwe didit min. Dûkel li ser mala wê radibit û qîrîna zarokan, zilaman, keçikan tê. Destê min dîsa hat ber rûyê min.

Careke dî dengê hat guhê min: "Çavên xwe veke!" Min çavên xwe vekirin. Zarokekî pêxwas li teniştê min e. Destê xwe yê rastê rakir û cihê listika xwe nîşanî min da. Min bere xwe da cihê listika wan. Li cihê listika wan pêlavên leşkeran hebûn. Ew pêlav bi ser serê min de ketin û min kire qîrîn!



Omer DILSOZ

Piştî Umrekî

di payizokê de dibêje:
wê li min hatî pîrepayiz e
wele babo, min nekirî çî kar û barê vê zivistanê

offf umrê min offf!
gêr dibim li kendalên heyatê,
paşê jî xwe davêjime behra heyhatê
çilê zivistanê ye li warê dilî,
çû bira çû;
enî beyar bû,
rih bûne hiriya mihan,
li rû û sûretan hilda kurîşkên pîratîyê
kurîşk kurîşk rû dişkê di neynika umrî de
bawerzên befirê diqelêşin canê westiyayî
can westiya
çav nebîna
bînahiya wan çirayê piştî hingorî
bervemirînê
helkehelka mirinê
li ber guhên diwarên hişê min dikeve
bîrhatin hemû melûl
hemû li daçeka dema borî siwar
li hespekî kihêl ê ber bi abadînê ve dibeze siwar
siwar in hemû xweziyên birêdemayî
li paş,
umrekî ji umrê perperikê
pihêt bi pihêt şewitîyayî

Nêrgizên Bi Raz

dema agirê dilê min
bi nêrîna te vêdiket
tarî dibû xweliyek har û dîn
bi canê min diket
û ez û dilê xwe
mîna gul û dirîyan
bi hev re digirîyan
heta ku ji pelan axîn
ji dirîyan xwîn derdiket

dema agirê dilê min
bi nêrîna te vêdiket
bo ku em hev bibîhîzin
bi lome û gazîn
min digot: Zîn Zîn!
heta ku dengê ji devê te derdiket
û Bekoewanekî çavnebar
dihat rihet rihet
di nav agirê me yê hevpar de
bêşerm û bêxem radiket

dema agirê dilê min
bi nêrîna te vêdiket
erd û ezman, dibûn du zîman
û bi peyvên wek zînar û hîman
bi hev diketin
heta ku stêrkên bê welat
ji ezmanan
bi hawar û emanên
dadiketin
heta ku li berbangên keder û xeman
findên bê dûman
vêdikin

5 adar 2007

Îlhamî OZER

Pêxwas

Fevzî BÎLGE

Pûk di pûk ê de pepûk
Betanê qîzek reşik digrim ser bircên ripîrût
Di himbêza şevê de qoroyek bê şef
Bû du şev
Strana “çemê çetelê” distrên
Marmarokên ji birçîna terîka xwe xwarine re
Çend dengbêj bi min re azirîne
Pêxwas im sibeha cejnê
Şekirekî min jî tune
Pisîka min bi zimanekî din dinûre
Zarokantiya me ev kolan mezin kirine
Çîçikên bircan mizdane
Xortaniya me
Bi bedenên mêrantiya xwe selmandine
A niha, xeyalan difroşim xwe
Li kolanîka kolanên te siwar dibim
Stêrkan didim hev her şev
Bi şekirên qulpikan me kosteka te qetandiye
Ez ê xwe serjê bikim, qewl ez im
Kezeba xwe belav bikim
Gunehên min di stuyê min de

Gulîstana Sîpan

Sîpan XIZAN

Seyrangeh û seyran bam ez
Deşt û berî zozan bam ez
Li gelî û çîyan bam ez
Evîndar ya keça welat

Li deştan her axpîn bam ez
Şilêl nefel bistan bam ez
Bi gilgil û zîwan bam ez
Evîndar ya keça welat

Çiyayê bilind şîlan bam ez
Li nava daristan bam ez
Gezo ên ser pelan bam ez
Li ser lêvên keça welat

Geliyan av rewan bam ez
Sibê êvar dewran bam ez
Bo çavkîlan kildan bam ez
Li berîka keça welat

Bo wan rewşan heyran bam ez
Digel yar seyran bam ez
Bo zeriyan gerdan bam ez
Li gerdana keça welat

Li beryan zivistan bam ez
Sibe êvar xwenav bam ez
Li ser gewran siwan bam ez
Siwan li ser keça welat

Baharan kulîlik bam ez
Nisanok û nêrgiz bam ez
Pirpizêk û sosin bam ez
Li nav destên keça welat

Her dem mêrg û çîmen bam ez
Yasemîn û sinbul bam ez
Reyhan û berbero bam ez
Evîndar ya keça welat

Zozana mêrgemin bam ez
Li nav kulîlik zer bam ez
Beybûn û lale bibam ez
Li nav destên keça welat

Dengên berxan guhdar bam ez
Xemla çavreşan dît bam ez
Li nik wan kêfxweşî bam ez
Li ber destên keça welat

Bêrivanan dîtibam ez
Ji bo wan re şivan bam ez
Bi kulav û heban bam ez
Şivaniya keça welat

Ji bo wan rêheval bam ez
Zer û sipî sorgul bam ez
Digel wî gulbahar bam ez
Rêheval ya keça welat

Binefş û gulşîlik bam ez
Edarok û nêrgiz bam ez
Li dest evîndaran bam ez
Evîndar ya keça welat

Stêr gul û şîngul bam ez
Li sîneya welat bam ez
Herî bi wan şanaz bam ez
Li sîneya keça welat

Kinêra navzirav bam ez
Her li bestên bilind bam ez
Gulistana Sîpan bam ez
Digel ewê keça welat

25.08.2007

Dilxwaz HERDEM

Du Helbest

Demsal

Dilek sermest
ket li pey kaniya biharî
Lê,
av çikiya
û bi tenê
şopên herikînê man li erdê.

Dereng

Tu,
ey, têhnûbûyîyê evînê!
li benda çi yî?
ma tu nizanî,
evîn dilopek mey e
û li binê qedehê aliqî maye.

Cixare, tefiya
Qadeh, qediya...
Deka rabe dilê reben
Dem, dema razanê ye...

Nezanî

Feratê Dengizî

Tu zanî...
Evîndariyeke bêhêvî û bêtaqet

Û
Tu
Jiyaneke bindest î
Evîn jî şikestî
Dil jî...

Em nizanin evîn çi ye
Em nizanin bibin evîndar
Em evînê jî nas nakin xweşik
Ji ber vê em Memê Zîn in
An jî Zîna Mem
Biyani ne em
Biyaniyê her tiştî
Ji bindestî
Ji nezanî

Evîn tev wiha ne
Mirov dihêrin, dihêlin û diherin
Evînen ji nezanî...

03.12.2007 / Amed

Evdirehîmê Fîsî (Abdurrahim Turkekul)

Amadekar: Hilmî AKYOL



EVDIREHÎMÊ FÎSÎ (1936 -)

Di sala 1936'an de li bajarê Amedê, li navçeya Licê li gundê Fîsê ji diya xwe bûye. Dibistan nexwendîye. Bi eslê xwe kurmanc e. Kalên wî ji gundê Cimika hatine Fîsê. Di 16 saliya xwe de li gund dizewice, hevala wî ji gundê Rikala ye. Li gund karê cotkarî, rezvanî û paleyîyê dike. Pez û dewar xwedî kiriye. Deh sal berê mala xwe aniye Amedê. Li Amedê tu karekî nake. Heya ku mala xwe aniye Amedê bi malîti ji gund derneketiye. Kilam û stranên ku dibêje ji Mistefayê Firdeysî hîn bûye. Êdî nikare bistirê. Hem extiyar e, hem jî dengê wî xera bûye. 5 zarokên wî hene; 3 kur û du keç in.

FÎS

Gundekî bi navçeya Licê ya Diyarbekirê ve girêdayî ye. Sed, sed û deh malbat tê de dijiyan. Lê niha di gund de malbat hindik mane. Gundekî çiya û deştê tev e. 48 hezar elb erdê gund heye. Ava gund pir e. Rez û dar û devî û baxçê her malbatê heye. Dewlemendê gund xwedî 1000 elb erd e. Xizanê gund xwedî 100 elb erd e. Kesên bê erd di gund de tune ne. Gundi cotkariyê dikan. Rez xwedî dikan. Pez û dewaran xwedî dikan. Bi Diyarbekir û Hêne û Licê re dan û standinê dikan. Roja îne diçin Hêne. Rojên din li Diyarbekir û Licê ne. Gundi bi kurmançî dipeyivin. Fîs 70 km dûrî Diyarbekirê ye. Li Rojhilatê rêya Diyarbekir û Licê dikeve. Kilometre û nîvek dûrî asfalta Diyarbekir û Licê ye. 20 km dûrî Licê ye. Di gund de dibistan, mizgeft û elektrîk hebûn. Keyayê gund ji gund e. Di gund de gelek qamyon û traqtor û otomobîl hebûn. Neh, deh qebîle di gund de bûn. Li bakurê rojhilatê gund, gundê Firdeys û Celik hene. Li rojhilatê gund, gundê Balicnê û Hewrê hene. Li başûrê gund, gundê Dêrûnê heye. Li rojavayê gund, gundê Zera û Hûrê hene.

MUHUBÊ BÎNGOL E

De lêlê muhubê weyla Bîngol e Bîngol e
Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e
Lêlê muhuba min Bîngola rengîn e
Ahî hî hî.....

Lêlê muhubê weyla Bîngol e

Binya Bîngolê dibên Şerefdîn e
Sêsid û şêst û şeş malê koçera ji xwe ra lê danîne
Keçikê gazî dikir digo lo lo heyla mi bi qurban
Em ê ji xwe ra Bêrtî ne
Ax lêlê Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e
Lêlê muhuba min Bîngola rengîn e
Ahî hî hî.....

Lêlê muhubê weyla vê sibekê min ê mesîne xwe girtî
Çûme desmêja serênî sibê
Min ê bal û bala xwe didayê keçikê wayê
Dest û tilikê xwe didanî ser darê lewlebanî meşkê
Vê sibekê sira sibê lê dixîne heylê lê lawo bi xwe dere tê
Mi digo lêlê muhubê
Ez ê vê sibekê bal û bala xwe didimê
Dest û tilikê te yê ji ma balmûmî ne
Hinî mastê mala bavê xwe
Tevû sê nanê labaş ji mi ra bişeyîne
Lêlê muhuba min vê sibekê wez yolçî me (rêwî me)
Ax lêlê Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e
Lêlê muhuba min Bîngola rengîn e
Ahî hî hî.....

Lêlê muhubêêêêê
Keçikê gazî dikir digo lo lo lawiko heyla mi bi qurban
Vê sibekê xebardanê te çîqa xweş in bi min pir û pir şêrîn in
Ez ê te bi xortê deşta jêrîn ji xwe ra heyla dişibînim
Kurik digo lêlê muhubêêêêê
Tu vê sibekê derew û vira meke
Te xortê deşta jêrîn ji xwe ra heyla li ku dîne
Digo lolo lawiko heyla mi bi qurban
Sala bavê mi li Bêrtanî kon û kerikê xwe yê li berîka jêrîn danîbû
Xortê welatê hanê zerê zerbixî bûn,
Li ber hêşa konê mala bavê min sêwî evdala Xwedê seknandî bûn
Hebê mêşan û kermêşa ji xwe ra li ser dev û lêvê wanê danandî bûn
Ax lêlê Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e
Lêlê muhuba min Bîngola rengîn e

Ahî hî hî.....

Lêlê muhubêêêê

Kurik banî dike lêlê muhubê

Ez ê vê sibekê bal û bala xwe didimê

Weyla gerdena te zirav e

Ji gerdena qaz û qulingê ji deşta vê Yemenê

Ege çawa di çol û beyara da diçêrin

Vê sibekê deqê sipî nadin tîfîngê

Ax lêlê Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e

Lêlê muhuba min Bîngola rengîn e

Ahî hî hî.....

Lêlê muhubêêêê

Keçikê gazî dikir digo lo lo lawiko heyra mi bi qurban

Weyla vê sibekê ez ê bal û bala xwe didimê

Xeberdanî te yê çîqa xweş in bi min pir û pir şêrîn in

Ez ê te bi xortê deşta jêrîn ji xwe ra heyra dişibînim

Ax lêlê Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e

Lêlê muhuba min Bîngola rengîn e

Ahî hî hî.....

Lêlê muhubêêêê

Kurik digo lêlê muhubê

Ez ê vê sibekê bal û bala xwe didimê

Tu wa fenanî ji kewanî kewa gozel merû te têka qefesê

Di ma pazdeyê gulanê da seyd û nêçîra mîratî kewnêr

Ji xwe ra bigerîne

Ax lêlê Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e Bîngol e

Lêlê muhuba min Bîngola rengîn e

Ahî hî hî.....

Zimanê te jêkim kêlûskê,

Bavêjim kahniya brûskê,

Hinek Xweşgotin

Zekî AKDAG

Xort û ciwanino werin vê lîskê.

*

Law la la te,

Gih aw av li te,

Çavên keçikan gişkan li te.

*

Qurban dibim carekê,

Dibim binê darekê,

Serjêdikim karekê,

Belav dikim malekê;

Qurban dibim du cara,

Dibim binê du dara,

Serjêdikim du kara,

Belav dikim du mala.

...

*

Ez gul im gula zer im,

Destmala şêx, pêxember im,

Deha bînî jî ez ê ser im.

*

Derdê keçê çî xweş e, xort tê de dimeşe.

*

Çû Şûna miriya her kes ji bona xwe giriya.

*

Beroşê got; binê min zêr e, heskê got; ez niha li ba tîm.

Sibehekê mêvanek tê malekê. Dema mazûvan xêrhatî jê kir wê demê mêvên jî dît ku jina malê dew dikê û rûnê nivîşkî ji dew derdixe. Dema ku mêvan jî vê rewşê dibîne fêhlek dikeve mêjiyê wî û dixwaze ku sibê û sibê hin hinguv û rûnê nivîşkî bixwe. Mêvan dibêje malxwê:

Hinek rûnê nivîşkî û hinguvînî bînin ez bixwim. Ka ez nizanim rêya min bi ku de ye!

Malxwê:

Ku te niha nan û dew xwar dê tu bizanibî rêya te bi ku de ye.

Herêm: SEMSÛR